



REWŞEN

Kovara Navenda Çanda Mezopotamya

- Ey Jina Kurd * Adar JIYAN
Rojijmêr (Salname) * Kaya MUŞTAKHAN
Ebi Gore Bê Edetanê Ma Zewac * J. ESPAR
Hevpeyîn Bi Ordîxanê CELÎL re * Ehmet XELÎLÎ
Xwîn û Hêstirê Çavan * Lokman POLAT
Rêzkirina Zimanên Îranî - Arî Yêñ Rojava * Prof. Pierre LECOQ
Coxrafyaya Bê Nav * Î. XORT
Ziman û Rastnivis * F. Huseyn SAGNÎÇ
Hozanêñ Kurd * Abdurrahman DURRE
Mem û Zîn / Memê Alan * Beşîr ANT
Mîrin û Jiyan * Hüseyin KAYTAN
Seyîd Yaqubî Mahîdeşti (Soranî) * Ehmed ŞERÎFÎ
Muzîka Kurdi * Cemîla Celîl

Kanûna Paşîn
Sibat 1993

Hejmar
9

Eye Jina Kurd!

Adar JIYAN

*Bi xîret i pir bi ar i
Fedakar i ey jina Kurd!
Him dayik i tu him yar i
Cefakar i ey jina Kurd!*

*Him karker i him kevan i
Tu rênçber û palewan i
Li serê çiya Berîvan i
Tu şervan i ey jina Kurd!*

*Ji zaroka re dê û bav i
Tu ji me re çav û gav i
Bi şewq û rohnî û tav i
Tu jiyan i ey jina Kurd!*

*Bejn zirav i por dirêj i
Him sazbend i him dengbêj i
Li vî halê me dibêji
Tu mizgin i ey jinâ Kurd!*

*Keça rind, bi bisk û kez i
Tim li pêşya gel dilezi
Ji bo azadî dibezî
Tu hêvî yî ey jina Kurd!*

*Reng zelal, wek heba tîrî
Dev li ken, gula vekirî
Bi wî zarê xwey şekirî
Tu şérîn i ey jina Kurd!*

*Teşîrêş i dolabvan i
Tu nanpêj û tenûrvan i
Tu dilsoz û dilovan i
Tu şahî yî ey jina Kurd!*

*Ji dijmin bi kîn û hêrs i
Edî li halê xwe dipirsî
Ji mirinê tu natirsî
Tim li kar i ey jina Kurd!*

*Tu serkêş i w pêşrewan i
Tu şer dikî bi pêlewanî
Şehîd dibî bi qehremanî
Tu namirî ey jina Kurd!*

*Tu şervan i w şoreşger i
Tu çekdar i serleşker i
Ji bo welêt te da seri
Tu şehîd i ey jina Kurd!*

*Heya bê bes zehmetkêş i
Ji dozê re bi dilêş i
Serî hilda tim li pêş i
Tu rêber i ey jina Kurd!*

*Daw-dêlê te yê hilkirî
Şer li ku be tu li wir i
Li ber gula sîngvekir i
Canfeda yî ey jina Kurd!*

*Tu pir jîr û şareza yî
Ne kole yî serbixwe yî
Tu rûmeta gelê me yî
Bi huner i ey jina Kurd!*

*Nîkarim bidim pesnê te
Hemu huner tê ji destê te
Xwar dibim li ber şexsê te
Tu hêja yî ey jina Kurd!*

REWSEN

Kovara Kurdi ya çandî,
hunerî, wêjeyî û zanyari

Mehê hejmarek tê weşandin.

Li ser Navê MKM Ltd. Şti. Xwedî:
Hüseyin Kaytan

Berpirsiyara Nivîsaran:
Edibe Şahin

Birêvebirê Giştî yê Weşanê:
M. Şefik Beyar

Redaksiyon û Rêzkirina
Nivîsaran
REWSEN

Navnişan:
Rumeli Cad. 26-28 Huzur Apt.
Kat: 5 No: 12
Nişantaşı / İSTANBUL
Tel: (1) 241 44 42

Sertên Abonetiyê:
Nav Welêt:
6 meh: 72.000 TL
1 sal: 144.000 TL

Derveyê Welêt:
6 meh: 30 DM
1 sal: 60 DM

Bank:
Edibe Şahin
Hesap No: 0527432-9
Döviz Hesap No: 3001696-4
Yapı Kredi Bankası
Taksim Şubesi
Taksim / İSTANBUL

Çapxane:
Aydınlar Matbaacılık

Qapax: Dilvin

NAVEROK**Rûpel**

Sergotar :

REWSEN 4

Strana Bêrivanê :

"Jiyana Nû" 6

Rojijmêr (Salname) :

Kaya MUSTAKHAN 7

MKM li Amedê :

Î. Xort 15

Ebi Gore Bê Edetanê Ma Zewac :

J. ESPAR 17

Gerîla / Negîr Bilbil :

Jîr DILOVAN 20

Hevpeyîn Bi Ordîxanê CELÎL re :

Ehmet XELİLİ 21

Xwîn û Hêstirê Çavan :

Lokman POLAT 25

Rêzkirina Zimanê Îranî - Arî Yê Rojava :

Pierre LECOQ 29

Coxrafyaya Bê Nav:

Î. XORT 36

Halkın Aydını Halkın Savaçısıdır :

YRWK 37

Ziman û Rastnivîs :

F. Huseyn SAGNIC 39

Hozanêr Kurd :

Abdurrahman DURRE 41

Mem û Zîn Ya Da Memê Alan :

Beşîr ANT 43

Niştimana Xwe Binase : Erzingan :

REWSEN 47

Cerdevan :

Adar JIYAN 48

Mirin û Jiyan :

Hüseyin KAYTAN 49

Seyîd Yaqubî Mahîdetî (1808-1881) :

Ehmed ŞERİFÎ 54

Danasına Pirtûkan "Hotay Serra Usivê Qurzkizi" :

Cemil GÜNDÖĞAN 55

Pêkenîn :

Girê Dersilê 58

Muzîka Kurdî :

Cemîla Celîl 59

Nameyêñ Xwendevanan :

..... 60

Ferhengok :

REWSEN 62

SERGOTAR

Xwendevanên delal,
Ev e salek e ku em bi hev re ne. Anku kovara we Rewşen, berî salek li Stenbol-Tirkiyeyêdest bi weşana xwe kir. Rewşen di despêkê de, kovareke mehanî bû, lê ji ber hin sedeman, di pêvajoyê (sureç) de wek kovareke dumehî jiyna xwe domand. Heta niha 9 (neh) hejmarêñ Rewşenê derçûn.

Di destpêka weşandina Rewşenê de, em rastî hin astengan (engel) hatin û dîsa, hin gelemşeyen me çêbûn. Em ji hin astangan derbas bûn û me hin pirsgirêk û gelemşeyen xwe çareser kirin. Lê pirsgirêka me ya herî mezin, hîna li ber me û ne çareserkirî ye. Ev pirsgirêka me ya herî mezin, belavkirina Rewşenê ye. Dezgehêñ hevpar ên bazirganî yên belavkirinê (dağıtım şirketleri),

Rewşenê nagrin û belav nakin. Em Rewşenê li gorî mecal û derfetên xwe (îmkan) belav dikin. Ev jî, têrî nake. Me, ne li welêt û ne jî, li derveyî welêt, ji bo belavkirina Rewşenê nekarî ku rêkxistineke xurt pêk bînin. Heta em vê pirsgirêkê çareser nekin, em nikarin mehê carek Rewşenê biwesînin.

Rêzanî (polîтика) û xêza (xeta) me diyar û ronî ye. Eri di bin xizmeta gelê xwê de ne. Berjewendên (menfaet) gelê me li pêş her tiştî ye. Em li bermayî û nirxên (hêja) gelê xwe, xwedî derdikevin. Em nirxên gelê xwe yên kevnare -klasîk- û yên nûjen diparêzin. Em li çanda neteweya xwe ya kevin a bi rûmet û pêşverû xwedî derdikewin. Herwiha em li çanda gelê xwe ya nû ku li serê ciyayêñ Kurdistanê û di serîhildanan de, li

gundan û li bajaran, bi deste gerîlayêñ leheng û ji hêla gelê me yê welatparêz ve tê afirandin (tê himatê - tê çêkirin), xwedî derdikevin û diparêzin.

Di nav têkoşîna rizgariya neteweyî de, îro çandekê azad û nûjen tê afirandin. Ev çand -kultur- jî şexsiyeteke nû dafirîne. Ev şexsiyet, şexsiyeteke paqij, azad û serbixwe ye. Belê, îro mirovahî, li ser rûyê dinyayê, di domaneke (sûreç) bextres de derbas dibe. Lê ev domana bextres, îro li Kurdistanê, di bin pêşengiya Partiya Karker a Kurdistanê de, bi hêza Eniya Rizgariya Neteweyî û bi Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê hatiye berrevajî kirin. Îro gelê me, di bin pêşengiya van hêzan de, li hemberî dijiminê hov û xwînxwar, xwe diparêze û li mirovahî û nirxên mirovahiyê xwendî derdikeve. Îro li Kurdistanê, li ser vê çanda nû, jiyanekê nû tê afirandin.

Îro li Kurdistanê, pîvan û sînorêñ welatparêziyê, gelek diyar û ronî bûne. Mirov û hêzên ku li nirxên gelê me yêñ ku me li jor anî zimên, xwendî dernekevin û neparêzin, nikarin berjewendêñ neteweyî û yêñ welêt biparêzin. Ev mirovin û hêzin, ên ku nirxên jorîn bizanîn, an bê hemdê xwe neparêzin, an li dijî wan derkevin, nikarin bibin welatparêz. Bê parastina van nirxan, welatparêzî nabe. Navê welatparêziyeteke welê jî, sextekarî, bêhayî (gaflet) û îxanet e.

Di van salêñ dâwî de, bi zimanê Kurdî çend kovar û rojname dest bi weşanê kirin. Belê, parastin û pêşvebirina zimanê Kurdî, tişteke gelek girîng e û qenc e. Lê ne hertişt e. Ziman bi serê xwe tenê, nikare azad be; azadiya ziman, bi azadiya gel ve girêdayî ye. Divê ku em zimanê xwe, ji bo azadiya çanda xwe, ji bo azadiya gelê xwe, ji bo rizgariya welatê xwe, ji bo rizgariya neteweya xwe bidin xebitandinê. Kurdê ku li çanda xwe ya nû, li jiyanâ nû ku bi xwîna hezar şehîdan hatiye afirandin, xwendî dernekeve, nikare li zimanê xwe jî, xwendî derkeve.

Li gor ramanêñ jorîn, gava em xwe (Rewşenê) dihêjînin, bi dileke rehet û bi bexteweriyeke mezin em nikarin bibêjin ku em li çand û jiyanâ nû baş xwendî derketin. Dema em salekê Rewşenê dinirxînin, em dibînin ku em li ser zimanê Kurdî û li ser çanda kevnare gelek zêde rawseti-

yane, lê li ser jiyan û çanda nû, li ser pîşeya (senaeta) nû, ne hewqas. Anku me bi aveyeke pîşeyî (senaetî) gelek hindik cih daye lehengiya gerîla û serîhildanan. Ev rewş, ji bo Rewşen, kêmâniyeke mezin e.

Em bi derketina kovar û rojnameyên Kurdî, dilşad in û bextewer dibin. Lê gava em li naveroka van kovar û rojnameyan (Nûdem, Nûbahar, Bergeh, Berbang, Riya Azadî û hwd.) dinêrin, ji jiyan û çanda nû, tu tiştek nîne. Em di rûpelên wan de, rastî parastina nirxên neteweyî yêñ nû, rastî lehengiyêñ gerîlayêñ Kurdistanê, rastî afirandina şexsiyeteke azad û serbixwe nayêñ. Ev helwest (tewir), -divê bi zanîn, an bê zanîn be- li dijî berjewendiyêñ gel, li dijî rizgariya neteweyî cihgirtin e. Anku ev helwest, ji welatparêziyê gelek dûr e.

Em hêvîdar in ku birêvebir û berpirsyarêñ van kovaran, rexneyêñ me yêñ dostane, bi dilekî germ û bi mejîyekî azad, dê binirxînin û rewşa xwe ji nû ve di ber çavêñ xwe de derbas bikin.

Xwendevanêñ heja,

Di nav rûpelên Rewşenê de, digel kêmânî û çewtiyêñ me yêñ din, şâsiyêñ me yêñ rastnivîst jî hene. Heta ji destê me tê, em lê dixebeitin ku sererast bikin û kêmâniyêñ xwe jî, biqedînin. Berê, ji bo ku em hin peyvan ji hev veqetînin, me li wan peyvan tîpine dubare (wek pir, pirr, gel, gellek, birrîn, birîn) zêde dikirin. Tevî ku di rastnivîsa Kurdî de, du tîpêñ ji hev, bi hev re nayêñ nivîsin û bi lêv kirin. Lê wek ku hûn jî dizanin, me di van herdu hejmarêñ Rewşenê yêñ dawî de, dev ji dubarekirina tîpan berda. Li gorî dûtina me, ya rast jî, ev e. Ji ber ku dubarekirina tîpan, jîxwe di Kurdî de nîne û dema bêñ bikaranîn jî, dibin sedemên tevlîheviyêñ nû. Ev rewş jî, di rastnivîsa Kurdî de riya çewtiyêñ nû vedike. Em naxwazin û mafê me jî nîne ku em rê bidin çewtiyêñ nû.

Em, dê heta pêleke din jî, di Rewşenê de, ji sê paran parek (1/3) cih bidine nivîsarêñ Tirkî. Ji bo nivîsarêñ Tirkî, hin xwendevanêñ me, li me rexne digirin. Xwendevanêñ me gelek mafdar in. Jîxwe armanca me jî ew e ku em Rewşenê bi timî û xwerû bi zimanê Kurdî biweşînin.

STRANA BÊRÎVANÊ (*)

Em diçin bakur
Stêrk rêberên me ne.
Em diçin, di destêne me de çek
di çavêne me de roj
û li paş me şopa xwînê, sor û dirêj.
Em diçin bakur, lingêne me dişewitin
em dîlxweş in, em kilaman dibêjin, em distirê...
Tenê çiya zanin, em çawa mîrxas in
û tenê dijmin zane, birîna tisinga me çawa dijwar e!
Ji ber ku em diçin bakur
li bakûr dîlan e
dîlana Kurdan...
Û em radibin bi hev re, hey li bakur dîlan e
û em govend digrin, milêne me li milêne çiyan
bi çiyan re em govend digrin,
û dijmin dibîne
ku jina Kurd êdî wek şêran diqîre
bi lepêne xwe serê guran jê dike, serê celladan
kî kare bi min bigre, ez pêt im, pêta agirî
kî kare min bişewitîne, ez tim şewat im
Ez Berîvan im, hûn zanin?
ez cîhan im di nav cîhanan de
ez av im, ava hênik, ava zelal, ava xwes
diherikim bêdeng, di nav newalêne Kurdistane yê sor û şîn
di peyim bi çiyan, bi zinaran re, bi xezalan re yê ku wek
brûskan direvin
şev diçe, ez li welêt dimînim
roj diçe ez li welêt dimînim
li benda hevalan ip
ewê bêne emê bişewitînin zindanêne bajêr
ewê bêne emê dilşad bin bi hev re
emê bişewitînin tariya Tirkên hov
Ez Berîvan im, hûn zanin
zarokno, li tariyê li min biggerin, ez roj im
bêkesno, hûn li destê min biggerin li zilma zindanê, ez
azadiya sibê me
ez siba Cizîrê me, siba serhildanê ya ronî...
Ez Berîvan im, welat birînek kûr e di dilê min de
welat birînek zor e
Birîndar êşa birîna xwe dizane
Îro Kurdistan dêse di dilê min de...
Ez Berîvan im, welat welat diqîrim
welat, welat diqîrin teyr û tilûr
welat welat
tu çiqas şérîn î
tu bayê evîn î
bê te şev nayê razan, roj nayê ezman
tenê bi te hev dibînin ax û baran

ax û baran hev dibînin dibe bihar
li biharê rihan vedibe,
di nav xwînê de rihan vedibe, dibê ez im hingiv û ez im jehr
li biharê em diçin şer
Yadê, çiyayê bilind bê berf nabe
nabe ezman bê roj, rabe
emê bi xortêne xwe re hildin çek û rest, derkevin zozan û çiyan
emê tacek hildin ji bo serê jina Kurd a malxirabe
taca me serketin be!
Yadê, li her derê emê şerên giran bikin
jina Kurd êdî şêr e
Yadê, zivistan sar e, û dûr e bihar
bê me dicemide welat, li tariya kûr
di bin tanqêne Tirkên hov de, bê me
dicemidin miriyêne me
di bin cemseyen Tirkên hov de
dicemide mîrg û zevî
û xwîneke reş diherike ji nav lêvîne newalan
Ez Bêrîvan im, hûn zanin?
Kurdino, li min bipirsin
bipirsin, ez kî me, li ku me?
Kurdino, kes nebêje mirina min, ez dar im, dara şîn
Ez bêrîvan im, strana evîn, evîna zelal
li min bipirsin, ez rê me
riya dûr û dijwar li deşt û newal
ez destêne we me û heyf digirim
ez gerîla me, destê min bigre xort û ciwan, pîr û kal!
Ez Berîvan im,
Di dilê dijmin de ez bûm tirsa mezin
di dilê xortêne Kurdan de bûme evîn
bûme çek li milêne wan!
Ez Bêrîvan im
min nedixwest, ku ez bibim xulam li bajarêne mezin
li vir mirin çêtir e, di bin vê ezmane de,
min nedixwest, ku ez înakar bikim navê xwe
çêtir e ku ez biggerim wek kewa kovî
û çêtir e xwarina kok û berûyan,
min nedixwest, ku ez li xwe kim cilene xweşik
çêtir e cemidîn li vir,
Ji ber ku çêtir e serbilindiya min,
ji şerma mîrê bindest
û ji cil û livînen jina firotî
çêtir e livînek ji keviran,
min nedixwest, ku ez gulek bim di bexçê began de
çêtir e pelek biçûk û şîn, di newaleke dûr de...

(*) Ji kurtelîstika (skeç) "xwezgini" ya şanoya (îiyatroya)
"jiyana nû" hatiye girtin. Koma şanoyê ya "jiyana nû" li
MKMê xebatêne xwe yênerî didomîne.

ROJIJMÊR

(SALNAME)

Kaya MUSTAKHAN

Rojijmêr sazûmaneke ku demê(-wext) pareveyî rojê, heftê, mehê û salê dike. Rojijmêr, mijara stêrzaniyê (astronomi) ye. Bi her cûre sazgeha xwe ve rojijmêr, tûşî (teqabilî) bûyerên stêrnasiyê dibe ⁽¹⁾. Li gora dezge û bûyerên stêrzaniyê rojijmêr, bi çar tofa (grub) ve pareve dibe: Rojijmêra rojê, rojijmêra heyvê, rojijmêra heyv û rojê, rojijmêra guhêrek.

Roj, hefte, meh û sal hîmê rojijmêr ne. Bi awayekî din, roj, hefte, meh û salan dide xuya kirin.

Di kronolojiyê (hûrnêrîna bûyerên dîrokî) de rojijmêr, pîrî caran bi bûyerekî dîrokî an olî dest pê dike. Wek: Afirandina dinê, destpêka olimpiyadan, roja mirina Bûda, ji dayîk bûyina Îsa pêxember (mîlad); koçkîrina Hezretê Mihemed (koçî); damezinandina Împaratoriya Medya û hwd..

Li gora senifandineke (tesnîf) din jî rojijmêr, pareveyî ev tofan dibin:

1- Rojijmêra kevn:

a) Rojijmêra Misrê (ya rojê)

b) Rojijmêra Kasîtan û Babiliyan (ya heyvê)

c) Rojijmêra Yûnanîstana kevn (ya heyvê)

d) Rojijmêra Maya û Aztek (olî û rojê)

e) Rojijmêra Romî (ya rojê)

2- Rojijmêrên oli:

a) Rojijmêra Mesîhî (ya heyv û rojê)

b) Rojijmêra Kiptî (ya rojê)

c) Rojijmêra Mûsevî-cihû- (ya rojê)

d) Rojijmêra İslamî (ya heyvê)

3- Rojijmêrên Kevnesopî:

a) Rojijmêrên Çînî (ya heyv û rojê)

b) Rojijmêrên Hindû (ya heyvî, iro ya heyv û rojê)

4- Rojijmêra nûjen:

Di nav rojijmêrên kevn ên olî û kevneşopî de, tevlîheviyeke mezin heye. Li gora bawermendiya yekxwedâyî û pirxwedâyî, rojijmêr hatibûn çêkirin. Stêrzani (astronomi) û stêrnasi (astroloji) tevlîheviyek pêk anî bûn. Her diçû rojijmêrên dîrokî wek ên İbranî, Misri, Yûnanî, Romî, Kiptî, Çînî; û yên İslamî (koçî), Hindû, Kamboç, Laos, Vietnam, Çîn cihîn xwe ji rojijmêrên nûjen re dihiştin. ⁽²⁾

Julius Sezar, bi reformeke bingehîn, berî mîladê (zayînê) di çerxa 16'an de rojijmêra Julyen pejîrand ⁽³⁾.

Sal, 365 roj dihat hesibandin.

Rojijmêra Julyen, heta 1582 wan dom kir. Rojijmêra julyen ji, sedî sed ne rast û tekûz bû.

1- Meydan Larousse, Berg (cilt) II, rp.856, Memo Larousse, Berg I, rp.178,182

2- Meydan Larousse, Berg II, rp.857

3- Memo Larousse, Berg I, rp.182

Papa Gregoriusê sêzdemîn, rojîjmerek bi navê xwe çêkir (4'ê Cotmehê 150). Roma, İspanya û Portekîz vê rojîjmêrê bi kar anîn. Ev rojîjmêra zayinî, bi gelempêrî hatiye pejirandin. Frense (1582), Holende (1582), katolikên Elman û Swîs (îsvîre) (1584), Poloniye (1586), protestanan (1700), İngilîstan û Swêdin (İsveç) (1752) du sed sal şunde rojîjmêra zayinî pejirandin. Japon (1873), Çin (1911), welatêr ortodoks ên Rûsiyê (1918), Romen, Yugoslavya (1919) û Yunanistan di sala 1923'an de, Tirk jî, di 26'ê Kunûna Paşin 1925'an de rojîjmêra zayinî pejirandin (qebûl kirin).

Osmaniyan, heta sedsala XVII'-min rojîjmêra koçî; di 1839'an de rojîjmêra Rûmî bi kar anîn. Carina jî, rojîjmêra koçî û rûmî bi hev re dihatin xebitandin.

Rojîjmêra Kurdî

Mezopotamya, gencîneke dîrokî ye. Navenda şarezahiyê ye jî. Wek tê zanîn, dîrok bi nûvadan (îcat) a nivîsê ve dest pê dike. Di erdnîgariya firehiya Mezopotamyayê de, pir gel cîwar bûne.

Semsedîn Gunaltay (4) di pirtûka xwe de, navê Gûtiyan hil dide. Qona-

xa neolîtîkî, teqabilî 8000 sal bêrî zayinê dike.

Gûti, gelek şareza bûn. Nivîsîna bizmarî, ji alî Gûtiyan ve hatiye nûvedan (îcat kirin). (5) Kasît, (B.Z. 1800) di hiquq û felsefê de gelek pêşve çûbûn. Hesp ji alî Kasîtan ve hatiye perwerde kirin.

Tekera erebê, nûvedana wan e. Li gora sazgeha heyvî, bingehêr rojîjmêr jî, Kasîtan daniye (6). Sumerîyan û Babiliyan jî, li ser stérzanî û stérnasî (astronomî û astroloji) xebitîne (7).

Diyar e ku rojîjmêr, di nav cîvakêrî Mezopotamyayê de, hindiktirîn 2000 sal (berî zayinê) hatiye bi kar anîn.*

Ji Kasîtan ve heta Medan, hezar û sed û cil û heft (1147) sal derbas bûye. Ji Medan vir de jî, rojîjmêr bi gelempêrî dom dike.

Me li jor gotibû ku rojîjmêr, bi seredestpêkîn dîrokî, an ên olî dest pê dike. Kurd jî, ji xwe re du bûye-rêr dîrokî nîşan didin.

Ya yekemîn : Yekîtiya Medan (damezirandina serdariya Medan) Bz. 653

Ya diwemîn : Standina Nînowayê (Musil) ye (B.Z. 612). Li ser yekîtiya Medan dîroknavîs, dîrokêr cuda-cuda didin. (B.Z. 700, 649, 653).

Îro Kurdistanâ basûr, rojîjmêra

700'i, û Kurdistana rojhilat jî, 612 sal berî zayinê bi kar tînin (8).

Îro li ser rojîjmêra Kurdî, du dîtin, an du nêrînê bingehîn hene:

1- Navêr mehan ên ku bingehêr wan digihêje Kasîtan, Babîlan û Medan; navêr mehîn ku bi gelempêrî ji alîyê Kurdêr bakur, hinek ji Kurdêr başûr û rojhilat, Kurdêr li Sûriyê, Sovyetîstanê û Libnanê dixebeitînin. Navêr mehan ên ku di kovar, pirtûk, rojîjmêr, dibistan û Enstituyêr Kurdi de bi kar tînin, ev in: Adar, Nîsan, Gulan, Hezêran, Temûz (Tîrmeh) Tebax, Îlon, Teşrîn (çîrî), Kanûn (Çile) û Sîbat (9).

Cihû û Suryanî jî, van navan bi kar tînin. Lî navêr mehan ên ku civatêr Mezopotamyayê bi kar tînin, tenê ne Suryanî û ne jî, Îbranî ne. Mirov kare bêje ku ev nav enternasyonal in. (Binêrin Lîsta Yekem, navêr mehan).

2- Hinek Kurd (bi piranî yêr ku zaravayê Soranî bi kar tînin) jî dibêjin: "Navêr mehan yêr ku berî zayinê hene, ne Kurdi ne, divê neyêr xebitandin. Navêr mehan xwerû divê Kurdi be. Ji bo yekîtiya ziman jî, pêwîst e. Rojîjmêrek pardayî, wisa çêdi-be."(10) (Binêrin, lîsta diwemîn, navêr mehan)

Dibêjin ziman yek e. Malê her kesî ye. Divê ku dîtinêr cûrbecûr na-

4- Günaltay, Şemseddin, Dîroka Mezopotamya (Mezopotamya Tarihi), 1938 Ankara.

5- Botan Amedî, Dîroka Kurdistan û Kardan, rp.28, C.Bender, Dîroka Kurdan, Rp.21

6-Aksøy Gürdal, Zimanê Kurda û efsaneyen Wan (Kürt Dili Söylenceleri rp.12)

7-Botan Amedî û Cemşîd Bender (ibid)

8-Feqi Huseyn Sağrıç, Rewşen, H.3, 1992, rp.45

9- Hawar Kovareke Çandî ye, Bedirxaniyan weşandiye, 15.4.1932, Şam / Ronahî Kovareke Çandî û Siyasî, 1.4.1942, Şam. / Azadi Kovareke Çandî, 1978, Paris. / Rewşen Kovara Navenda Çanda Mezopotamya, 1.2.1992, İstanbul. / Welat Rojnameya hefteyî, çandî, siyasî, 22.2.1992 İst. / Riya Azadi Kovara PSK, Adar, 1982. / Deng Kovareke çandî û siyasî, K.Paşîn, 1989 İst. / Komal Weşanxaneyeke Kurdî (1974 Ank.) / Medya Kovareke çandî û siyasî, Nîsan 1988, İst. / Ferheng (J.Bleau, Gulan 1991 rp.188-189) D.İzolî, Sîbat 1992, rp.268. / Kurterastî Pirtûk, A.Tigrîs, Adar 1991 Stockholm:

10- Koma Newrozê, Salname, 1983 Şam.

B.Soran, Govend, H.3, Nîsan 1992 Amed Li ser rojîjmêra Kurdî... / Dildar Berwari, Roja-Nû, H.3, 1983 Stockholm, Li Ser navêr mehan... / Ferheng (J.Bleau...D.D.İzolî...Tewfik Wehbî, 1971 London) / Torî, Alfebeya Kurdî, Tîrmeh 1992 İst. rp.111 / Feqi Huseyn Sağrıç, Kovara Rewşenê, H.3, rp.45-47

*Li gora çavkaniyekê Sumerîyan, Kurd rojîjmêra xwe, berî zayinê (B.Z.2300-2150) li nîpûrê bi kar anîn (G.Aksøy, Zimanê Kurdan û...rp.127)

vêñ mehan û rengêñ wan neguherîne
(11).

Gelo kîjan dîtin rast e?

Bi dîtina me, navêñ mehan (listâ yekemîn) ên rastîrîn gelên Mezopotamyaya jorîn û yên ku Zaxrosê ji bi kar anîne û îro ji, piraniya Kurdan, di jiyanâ xwe de, di kovar û pirtûkan de dixebişînîn, rast e. Eger em xwedî bermayêñ gelên Mezopotamyayê bin, eger em ji bingeha Gûtî, Kasît û Medan hatibin, wek Seydayê Cigerxwîn ji dibêje: "Em bermayê Med û Sobar û Kasît in." Divê em nirx û dewlemenidyêñ xwe û navêñ ku çar hezar sal in didominin, ji biyaniyan re nehêlin. Bi hesteke (his) netewî, navêñ mehêñ enternasyonalîst bi kar bînin û biparêzin. Daxwaza me ew e ku Kurdêñ başûr û yên rojhîlatê wêlêt û kesêñ din, vê mijarê baş bifikiñ û baş binirxînin.

Di rojîjmêra Kurdi de, tiştêñ ku balâ me dikşînin, ev in:

Destpêka rojan, şemî ye; ya Tirkân duşem e.

-Destpêka demêñ salê, ji zivistañê dest pê dike û bi rêz li dû hev têñ <F(12).

-Yêñ Tirkan payîz, zivistan, bihar û havîn e. Her wiha Tirk biharê dikin du bes.

-Kurd ji berê de, bircan ji, nas di-kin. Astroloji (stêrnasi), bi awayeke teng di nav Kurdan de cih girtiye. Rewş û tevgera stêrkan, xêr û bera ku ji wan têñ der, sêredarî û falzanî, bi gora serboriya stêrkan, dêhatî û serpêwerêñ mirovan di stêrkzaniya Kurdan de ji, xwe nîşan daye. Lê di bircêñ Kurdi de, destpêka bircê, di kîjan mehê de be, kutahî ji, di wê mehê de ye, ya ku li pey de tê (13). Anku roja pêşî, meh dikeve birca xwe û roja dawî, jê derdikeve (14).

-Rojîjmêra Kurdi ya berê (b.z.) heyvî, lê rojîjmêra îro ya rojê ye.

Daxwaziya me ji ew e ku "hemû rewşenbûrêñ Kurd, hewl bidene xwe û li ser rojîjmêreke Kurdi li hev bêñ (15).

Navêñ Mehêñ Kurdi

(Hejmarêñ (reqem) di nav nîşan-deka kevanê (parentez) de, navêñ mirrov, pirtük, kovar, rojîjmêr / salname û ferhengan dide nasin.)

1- -Çile (2, 3, 5, 6, 8, 9)
-Çileya Paşin (4, 7, 10)
-Rêbendar / Rêberdar (12, 13, 15, 17)
(Ocak, Januar, January, Janvier)
-Befranbar/Berfanber/Befranber a Diwemîn (11, 16)
-Kanûna Paşin (1)

2- Sibat (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 10, 16)
-Reşeme/Reşemeh (9, 11, 12, 16, 17)
-Polan (14)
-Gecok (15)

SUBAT (Februar, February, Février)

3- -Adar (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 10, 11, 16, 17)
-Avdar (9)
-Newroz (6, 15, 16)
-Noroh (14) -Xalelêw,xakelêw, axalêwe, axlêwe (12, 16)
-Newrozmang (13)

MART (Marz, March, Mars)

4- -Nisan (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10)
-Cotmeh (11)
-Banemer,Benamer (12, 15, 16, 17)
-Hirmê Pişkûan (13)
-Gulan (14)
-Şestebaran (16)

NİSAN (April, April, Avril)

5- Gulan (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 13, 17)
-Cozerdan Cehzerdan (12, 15, 16)
-Baranbiran (14)
-Bextebaran (16)
-MAYIS (Mai, May, Mai)

6- -Hezêran / Hezîran, Hizêran / Xizêran (1, 2, 3, 4, 5, 7, 8, 10, 16)
-Pûşper (6, 9, 12, 16, 17)
-Xermanan (11)
-Bextebaran (13)
-Cehzeran (15)
-Germacîman (14)
-Coxinan (16)
-Xêve (16)
-HAZIRAN (Juni, June, Juin)

7- Tîrmeh (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 16)
-Xermanan (12, 13, 15, 16, 17)
-Gelawej (14)
-Miwegeyan (16)
TEMMUZ (Juli, July, Juillet)

8- Tebax (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 16)
-Gelawej (12, 15, 16, 17)
-Pûşper (11)
-Miwegeyan (13)
-Berewpayîz (14)
AĞUSTOS (August, August, Août)

9- İlon (1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 10)
-Rezber / Rêzber (9, 12, 16, 17)
-Gelarezan (11)
-Gelawej (13)
-Miran (14)
-Kergenan (15)
-Kewçêring / Kewçêr (16)
EYLÜL (September, September, Septembre)

11- B. Soran, Govend, H. 3, 1992, rp. 8, *Li ser rojîjmêra Kurdi*.

12-B. Soran,.. rp. 7

13- B. Soran,.. rp. 10

14-Feqi Huseyn, Rewşen, H. 3, 1992, rp. 46 "Salname"

15- B. Soran, ... rp. 10

- 10- Çiri (5)
 -Çiriya Pêşin (1,4,7,8,9,10,16)
 -Cotmeh (2,3,6)
 -Gelarezan / Gelarêzan
 (12,13,14,15,16,17)
 -Kewçerin (11)
 -Xezelwer (16)
 EKİM (Oktober, October, Octobre) November, Novembre)
- 11- Çiri (6)
 -Çiriya Paşin (1,4,7,8,9,10,16)
 Teşrin (5)
 -Mijdar (2,3)
 -Sermawez (11,12,13,15,16,17)
 -Agirdan (14)
 KASIM (November, November, Décembre)
- 12- Kanûn (2,3,5)
 -Kanûna Pêşin (1)
 -Çileya Pêşin (4,10)
 -Bergile (8,9)
 -Berfanbar/Befranber/Befrenbar /Berbaran (6,12,15,16,17)
 -Kewberdan (13,16)
 -Seholbendan (14)
 ARALIK (Dezember, December, Décembre)

N a v ê n M e h ê n K u r d ï

Hawar Ronahî	Kovara Azadî (Paris)	Welat Rewşen	Deng R. Azadî	Salnameya Komal	Salnameya Medya	Ferhenga J. Blau	Ferhangâ D. izoli	Salnameya K. Newroz
Kanûna Pas.	Çile	Çile	Ç. Paşin	Çile	Çile	Ç. Paşin	Çile	Çile
Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Sibat	Reşeme
Adar	Adar	Adar	Adar	Adar	Newroz	Adar	Adar	Adar
Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan
Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan	Gulan
Hezîran	Hezîran	Hezîran	Hezîran	Hezîran	Pûşper	Hizêran	Hezîran	Pûşper
Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh	Tirmeh
Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax	Tebax
Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Îlon	Rezber
Çiriya Pêş.	Cotmeh	Cotmeh	Çiriya Pêş.	Çiri	Cotmeh	Çiriya Ber.	Çiriya Pêş.	Çiriya Pêş.
Çiriya Paş.	Mijdar	Mijdar	Çiriya Paş.	Teşrin	Çiri	Çiriya Paş.	Çiriya Paş.	Çiriya Paş.
Kanûna Pêş.	Kanûn	Kanûn	Çileye Pêş.	Kanûn	Befranbar	Çileya Ber.	Bergile	Bergile
Kurterastî A. Tigris	R. Soran Govend	D. Izoli Ferheng	J. Blau Ferheng	T. Wehdî 1971 London	K. Newroz Salname 1983	Dildar / Berwarî Roja Nû, Hej: 3, 1983	Torf Alfabé	
Çileye Paşin	Befranbar	Rêbendan	Rêbendan	Navzîstan	Rêbendan	Befranber Duwemin - Rêbendan	Rêbendan	
Sibat	Reşeme	Reşeme	Çile	Polan	Gecok	Reşemeh / Reşeme		Reşeme
Adar	Adar	Xalelavêj	Newrozmang	Noroj	Newroz	Newroz Adar Xakelêw Ax(e)lêve	Adar	
Nisan	Cotmeh	Banemer	Hermê Pişkûan Gulan	Banemer	Banemer	Banemer Gulan Şestekaro		Benamer
Gulan	Gulan	Cehzerdan	Gulan	Beranbiran	Cozerdan	Cetan Cozerdan Bextebaran		Gulan
Hizêran	Xermanan	Pûşper	Bextebaren	Germaciman	Cehzeran	Xêve Pûşper Coxinan Xizîran		Pûşper
Tirmeh	Tirmeh	Xermanan	Xermanan	Gelawej	Xermanan	Tirmeh Xermanan Miwegenan		Xermanan
Tebax	Pûşper	Gelawej	Miwegenan	Berewpayz	Gelawej	Tebax Gelawej Gelawej		Gelawej
Îlon	Gelarezan	Rezber	Gelawej	Miran	Kergehan	Kewçerînan Rezber		Rêzber
Çiriya Pêş.	Kewçerin	Gelarezan	Gelarezan	Gelarêzan	Gelarêzan	Gelarêzan Xezelwer Çiriya Pêş.		Gelarezan
Çiriya Paş.	Sermawez	Sermawez	Sermawez	Agirdan	Sermawez	Sermawez Çiriya Paş.		Sermawez
Çileya Pêş.	Gelawej	Berfbaran	Kewbedar	Seholbendan	Befranbar	Befranber Kewberdar		Berfbaran

Kurdî	Tirkî	Asûrî	Îbranî	Babîlî	Avestayî	Erebî	Farsî
Kanûna Paş.	Ocak	Tebet	Tevez	Tebet Tebetû	Dîn	Şaban	Behmen
Sibat	Şubat	Şubat	Şevat	Şebat Şebatû	Vahûman	Ramazan	İspend
Adar	Mart	Adar	Adar	Adar Adarû	Spendarmat	Şevval	Ferwerdîn
Nisan	Nisan	Nisan	Nisan	Nisan Nisanû	Firavartîn	Zilkade	Erdîbiheşt
Gulan	Mayis	Ayar	İyar	İyyar Ayarû	Arbavahîst	Zîlhîcce	Xûrdat
Hezérân	Haziran	Sîvan	Sîvan	Sîvan Sîmanû	Harvadat	Muharrem	Tîr
Tîrmeh	Temmuz	Temmûz	Tamûz	Tammûz Dûûzû	Tîr	Sefer	Mûrdat
Tebax	Ağustos	Ab	Av	Ab Abû	Amerodat	Rebiyulewvel	Şehriyawed
ilon	Eylül	Elûl	İllûl	Elûl Ülûlû	Satvaîro	Rebiyyulahîr	Mîhr
Çiriya Pêş.	Ekim	Teşrit	Tigrî	Tîşrî Teşritû	Mîtro	Cemaziyulewvel	Aban
Çiriya Paş.	Kasım	Arahsamra	Hervan	Arahsamna Marşesvan	Avan	Cemaziyulahîr	Azer
Kanûna Pêş.	Aralik	Bîsilîmnû	Kîslev	Kîslîmû	Ataro	Recep	Dî

Jêder (Dawî / Netîce)

Ev vekolin, divê bi belge û çavkaniyên nû ve, were fireh kirin û kûrandin.*

Mezopotamya, navenda dîrok û kultureke pir dewlemeden e.

Dîrok, bi nivîsê ve dest pê dike. Bi vedan û kolana kolanzanan û bi xwendina pisporêñ kevir an qermîtan hatiye peyitandin ku nivîs, di vê hêrêmê de hatiye nûvedan (icad kirin).

Gelên Mezopotamyayê, di stêrnâsi û stêrzaniyê de jî, gelek pêşve çûbûn. Rojîjmêrên heyyîn (heyyî-roj) û rojîjmêrên rojê rast dîtibûn.

Gelên Mezopotamyayê, di herêmên xwe de, rojîjmêrên cûrbecûr bi kar anîne. Lî mixabin despêka me-

han, hevûdû nagire. Bi taybetî, dinav rojîjmêrên Sumeriyan de, tevlîhiyeke giran heye. Mînak: Di rojîjmêra olî de meh bi Nisanê dest pê dike, di ya gelî de, bi meha Nisanê diqede. Di rojîjmêra Lagaş, Umma û Ur de, meha yekem, bi Adarê dest pê dike. (Se. Gur. Kûd.)* Di ya Sumeriyan de, meha dawîn, meha Adarê ye (Binêr, Gûrdal Aksoy, r. 126, 127, 128)

Di vekolin û hûrkolîna vê mijarê de, tiştên bal dikisîne ev in.

-Destpêka şahî û mihrîcanêñ olî, an xwezayî (tabîi) di meha Adar û Nîsanê de, tê pîroz kirin. (Binêr, lîsteyen navên mehan 1,2,3).

Sersalên gelên Îranî yên kevin

(natîk), berê di payîzê de, dawî jî di bîharê de hatiye pîroz kirin. ***

-Salê du car, wekheviya şev û rôjê (Adar û ilon), salê carek şevdirêji/rojkurtî (kanûna pêşin), carek jî rojdirêji / şevkurtî (Hêzérân) bi mihrîcanan dihate pîroz kirinê.(16)

-Hêta sala 1752'ar (mîladî) Îngilîsan, di 21 ê Adarê de sersal çedîkirin. Di dawî de bi biryara parlamentoye sersala xwe hildane meha Kanûna Paşîn (Çile)(17).

-Di rojîjmêrên biyaniyan de (Tirk, Oranî, Asûrî, Sumerî û Romî) bi Kurdi navên peyiv, hejmar û mehan hene.(18)

-Gelek peyivên Sumerî û Kurdi nêzîki hev in.(19)

16- G.Aksoy, eynî cih.

17- L.A Waddlell, Sumer-Aryan Dictionary, (Neqil ji G.Aksoy, eynî pirtûk)

18- Gurdal Aksoy, Kürt Dili Söylenceleri, rp.130

19- Ibid (eynî pirtûk) rp.168-182

* Di pirtûka Gurdal Aksoy de çavkaniyên hêja hene (rp.133)

** Şe cur kûd (Adar Sumerî) selçeh kûd / kod. Di wateya (mana) koda ceh an embara ceh.

*** Biyanî ji van bûyerên werzedemsalî re ekînoks û solstîz dibêjin. Di ekînoksa payîzê (ilon) û di ekînoksa bîharê de şev û roj dibin yek. Di solstîza zivistanê (Kanûna pêşin) de şev, di solstîza havînê de (Hezérân) jî, roj dirêjtir in. (G.Aksoy, eynî pirtûk, rp.125)

Şirovekirina Mehan

Di vê vekolînê de, hevdeh çavkanîyê mehêndi Kurdî hene. Mehêndi ku bi piranî hatine pejirandin û bi kar anîn ev in:

1-Bi Tirkî	Bi Kurdi (a) %
1. Ocak	Çile
2. Şubat	Sibat
3. Mart.	Adar
4. Nisan	Nîsan
5. Mayıs	Gulan
6. Haziran	Hezîran
7. Temmuz	Tîrmeh
8. Ağustos	Tebax
9. Eylül	Îlon
10. Ekim	Çiriya Pêşîn
11. Kasım	Çiriya Paşîn
12. Aralık	Kanûn

2-Di rojîjmêrên Babîlî û Farisî yên kevin de, du mehêndi payizê bi eyî navî hatine bi kar anîn.(20)

Bi Kurdi	Bi Babîlî
Çiriya Pêşîn / Teşrîn	Marçesvan / Adûkanî
Çiriya Paşîn / Teşrîn	Marçesvan / Adûkanî
	Bi Farsiya Kevin
	Margazana
	Margazana

Divê em jî, di rojîjmêra xwe de, Çiriya Pêşîn û Çiriya Paşîn, an ji Teşrîna Pêşîn / Teşrîna Paşîn bi kar bînin û binivîsinin.

Rojîjmêr û Çend Belge

Belge : 1 (21)

Paul Beidar* 1925

Adar
Nîsan
Gulan
Hezîran
Tîrmeh/ Temûz
Tebax
Îlon
Çiriya Ewil
Çiriyan Paşîn
Kanûna Ewil
Kanûna Paşî
Sebat

M. Garzonî**1787

Adar
Nîsan
Gulan
Hezîran
Tîrmeh
Tebax
Îlûn
Çiriya Pêşî
Çiriya Paşî
Kanûna piçûk
Kanûna Mezin
Sivat (Svat)

Wek tê dîtin P. Beidar , 69 sal, M. Garzonî jî, 206 sal berê, navêndi mehêndi Kurdî, di pirtûkên xwe de nîsan dane. Di nav Kurdan de, ji bo meh û demsalan (werz) ji stran û mamikan helbest hatine nîvîsandin.(***)

20- Louis H. Gray, *Calendar (Persian) Rojîjmêra Farsan*, G. Aksoy, rp. 124. Fr. Hommel, *Calendar (Babylonian) Rojîjmêra Babiyyîyan*, ibid.

21- Mahmûd Lewendi, *Berhem*, Hej. 9, 1990, rp. 65

* Paul BEIDAR: Papazekî Keldanî ye ku gelek salan li Kurdistanê bi taybeti li mintiqâ Botan û Behdînan li bajarê Cizîrê û Zaxoyê maye. M. Lewendi, *Berhem*, H. 9, rp. 65

** M. Garzonî: Demeke dirêj li Mûsilî jiyaye. Navê pirtûka wî "Gramatica e Vocabolario Della Lingua Kurda, Roma 1787"

Salname, peyiveke Farisî ye. Ev peyv, wateya (mana) rojîjmêre (teqwîm) nade. Salnameyêndi Osmaniyan û Salnameyêndi bajaran (wilayetan), halîn û çûyîna wê salê, bûyeren wê salê û xebatêne dewletê nîşan dide; salnamêndi bajaran jî dîrok, erdnigarî, kultur, aborî û xebatêne fermî dicivîne.

Rojîjmêr, Demê pareveyî rojê, hefteyê, mehê û salê dike. Bûyer bi tevahiya xwe ve li ser stêrezaniyê ye. Bi baweriya me, di şûna teqwîmê de, rojîjmêr rastir e. (Kaya Müştakhan).

Li Ser Mehan⁽²²⁾

1

Kanûnê w kanûnê

Berf têt ji ezmanê

Qira ebd û insanê

2

Sebat e

Çi şer e w ci şewat e

Xwezi nîv meha da nehatâ.

3

Hijdê bi Adarê

Melyaket têt xwarê

Gazî dikit beharê

4

Taviya Nisanê

Hêja ye malê Xurestanê

5

Heyva Gulanê

Xweyê reza bi kul û kovanê

6

Yazdê bi Hezîranê serê havînê

Berê xwe bide

7

Temûz û Tebaxê

Agir digirit axê

Dû dirabit ji şaxê.

8

İlonê zik têr e

Ü dunya xêr e.

9

Çiriyê w Çiriyê

Mal teyr û tajî yê

Mirov dabin xweşiyê.

Li Ser Demsalan (Werz)⁽²³⁾

1

Bi pahîzê

Bi behare zû rake

Em hatin pahîza

Çêkin cihê ezîza

2

Zivistanê

Tengava ber mirinê

3

Bihare

Bereket tête xwarê

Xelk dabin şikirdarê

4

Havînê

Teyr gazî dikan meydanê

Borî roja Remezanê.

Belge II

Binêrin: Kovara Berhemê, Hej. 8, r. 10, M. Düz-
gün, "Teqwîmê Michael û Marie'yê Sero"

Belge III**Dirêjahiya Şev û Rojan**

Di rojekê de 24 saet hene. Lê drêjahiya şev û rojan, di salê de tenê carek, di 23 ê Adarê de roja Newrozê, weke hev dibil. Her du jî dwanzdeh saet in. Piştî vê mîjûyê (tarixê) şev dest bi dirêjbûnê, roj jî bi kurtbûnê dikan. Lê herweki Lista Jêrin ku şanî me di-de, roj tucaran bi qasî şevê kurt nabin.

	Saet	Deqîqe
Roja dirêjtirîn : 22 Hizêran	16	8
Roja kurtirîn : 22 Kanûna pêşîn	8	11
Şeva dirêjtirîn : 22 Kanûna pêşîn	15	49
Şeva kurtirîn : 22 Hizêran	7	52

Piştî 22 ê Kanûna Pêşîn, roj dirêj dibil û li rojê seatek û çend deqîqe zêde dibil:

	Saet	Deqîqe
Kanûna-paşîn	1	4
Sibat	1	38
Adar	1	30
Nisan	1	26
Gulan	1	23
Hizeran	1	...

Piştî 22 Hizêranê roj bi aweyê jêrin kêm dibil:

Tîrmeh	1	2
Tebax	1	50
İlon	1	46
Çiriya Pêşîn	1	40
Çiriya Paşîn	1	14
Kanûna pêşîn	1	14

CEMRE

Cemre ci ye? Li gor dîtineke kevin, hêmanên (unsurên) dînyayê, çar bûn (ax, av, hewa, agir) Di tabîtetê de, di nav wan çar hêmanan de, yê xurtir agir bû. Gava agir digiha hêmaneke din, ji vê bûyerê re cemre digotin. Ji xwe cemre, bi mana pereng e. Bi gotineke din, bi ketina her cemrê, germî digehe hêmaneke din û wî divejîne.

Cemreyê salê ev in:

1- 20 ê Sibatê: Cemre dikeve hewayê.

2- 27 ê Sibatê: Cemre dikeve avê.

3- 6 ê Adarê: Cemre dikeve axê.

22- Mahmûd Lewendî, *Berhem*, Hej. 9, 1990, rp. 65

23- Gramaire Kurde, P. Beidar, ji M. Lewendî, *Berhem*, hej. 9, 1990

Belge IV

Navên Mehan

Kurdî	Almanî	Fransizî	İngilizî	Tirkî
Çile	Januar	Janvier	January	Ocak
Sibat	Februar	Fêvrier	February	Şubat
Adar	Marz	Mars	March	Mart
Nîsan	April	Avril	April	Nisan
Gulan	Mai	Mai	May	Mayıs
Hezîran	Juni	Juin	June	Haziran
Tîrmeh	Juli	Juillet	July	Temmuz
Tebax	August	Août	August	Ağustos
Îlon	September	Septembre	September	Eylül
Çirî	Oktober	Octobre	October	Ekim
Teşrin	November	Novembre	November	Kasım
Kanûn	Dezember	Décembre	December	Aralık

Rojên Heftê

Gotina hefte, ji jîmara heftan (7) tê, bi xwerû Kurdî ye.

Di hefteyekê de heft roj hene:

Kurdî	Almanî	Fransizî	İngilizî	Tirkî
Yekşem	Sonntag	Dimanche	Sunday	Pazar
Duşem	Montag	Lundi	Monday	Pazartesi
Sêşem	Dienstag	Mardi	Tuesday	Sali
Çarşem	Mittwoch	Mercredi	Wednesday	Çarşamba
Pêncsem	Donnerstag	Jeudi	Thursday	Perşembe
Înî	Freitag	Vendredi	Friday	Cuma
Şemî	Samstag	Samedi	Saturday	Cumartesi

Çavkanî

- 1-Aksoy, Gûrdal, Kurt Dili ve Söylenceleri (Ankara,1991)
- 2-Amedî Botan Kürtler ve Kürdistan Tarihi 1 (İst.1991)
- 3-Bender Cemşid, Kurt Tarihi ve Uygarlığı, (İst.1991)
- 4-Bilge Yakup, Süryanilerin Kökeni(Ist,1991)
- 5-Berwarî Dildar, Li Ser Navê Mehan (Roja-Nû, H.3, 1983)
- 6-B'lau J., Kurtçe-Türkçe Sözlük (İst.1991)
- 7-Ciger.xwîn Tarîxa Kurdistan 1 (Stokholm,1985)
- 8-D.Îzoli, Ferheng Kurdi-Tirkî (İst,1992)
- 9-Gray I, Calendar (Persian) ERE-V.3
- 10-Günaltay Şemseddin, Mezopo-

- tamya Tarihi (Ankara 1937)
- 11-Hommel Fr, Calendar (Babylonian)ERE-v.3
- 12-Huseyn Feqî, Salname (Rewşen,H.3,1992)
- 13-London O, Babylonian Menologies and the Semitic Calendars London,1935)
- 14-Macler Frederich, Calendar (Armenian)ERE, V,3
- 15-Mihotulfî Selehaddin, Arya Uygarlıklarından Kürtlere (İst.1992)
- 16-Sayılı Aydin, Misirlilarda ve Mezopotamyalılarda Matematik, Astronomi ve Tıp (Ankara,1966)
- 17-Smith Sdney, (Babylonian and Assyrian Calendar) EB.V.4
- 18-Tigris A.Kurterastî (Stockholm,1991)
- 19-Tori, Alfebeya Kurdi (İst.1992)
- 20-Mandel,L.A, A Sumer-Aryan Dictionary, par 1 (London, 1927)
- 21-Wehbî Tevfîq, C.J.Edmons, Ferheng (London-1971)
- 22-Welatê Torî, Kurt Kökenî Büyük Boylar (İst.1991)
- 23-Woods. F.H. Calendar (Hebrew) ERE-V.3
- 25-Xemgîn E. Kürdistanda Dini Inançlar ve Etkileri 1 (İst.1992)
- 26-Rojijmêra Deng (1992)
- 27-Rojijmêra Koînal (1992)
- 28-Rojijmêra Komkar (1992)
- 29-Rojijmêra Koma Azadî (1983 Sam)
- 30-Rojijmêra Medya (1992)
- 31-Hawar Kovar (15 Nisan 1932 Sam, ya Bedirxan)
- 32-Ronahî Kovar (1 Nisan 1942 Sam)
- 33-Rewşen, Kovar (1 Sibat,1992)
- 34-Welat, Rojnameya Hafteyî (22 Sıbat 1992)
- 35-Ensiklopediya Brîtanîka,(deqa rojijmêr)

MKM (NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA)

"Yê ku
 iro
 gelê Kurd
 li ser piya
 hiştiye,
 çanda
 Kurdi ye.
 Ev çand,
 bingeha
 çanda
 Mezopotamya
 ye.
 Emê
 bi
 çanda xwe
 û
 têkoşîna xwe
 her
 tim
 hebin."

li Amedê

İbrahim XORT

MKM - Navenda Çanda Mezopotamya, di 3'ê Kanûna paşin de li Amedê, şaxé (şuba) xwe vekir. Gava ku MKM li Stenbolé vebû di nav armancén wé de, vekirina şaxan ên li Kurdistanê jî hebûn. MKM nézî salek e ku li Amedê xebat dikir. Belki ji bo pir kesan salek zehf dûr û diréj be, bi rastî, ji bo me jî, gelek e. Lé ji

ber hin problemén ku ne di destén me de bûn, ev wext hebekî diréj dom kir. Sedemén van yek teknikî û yek jé jî, rewşa welét bû.

Diviyabû pésin Navend xwe bi rék bixe. Ji bo vé jî, hebekî wext dixwest. Armancén ku MKM danîne ber xwe, xezîneyeke pir dewlemedend e û reha vé xezîné jî, li welét e. Ji bo

ku karibe li vé rehé xwedî derkeve, divé wé av bide. Ji dûr ve jî, nayé avdan. Xebatén MKMé li Stenbolé berhemén xweş dan. Xebatén MKM é li welét û li dervâyi welét deng da.

Berî her tişî ev xebatén hané, ne bi ramanén bazirganî û fen û fûtan bû. Ji ber vé yeké ev xebat, ewlekariyeke mezin da gel. Gel jî li MKMé xwedî derket.

Gel dixwest ku şaxekî MKMé li Amedé jî hebe. Ji ber vé xwestiné, MKM é şûba xwe ya Amedé bi alîkariya gelé xwe vekir. Bi rastî gelé Amedî, ji gumanan zédetir lé xwedî derket. Di roja vebûné de, bi sedî mirov besdari vebûné bûn, MKM pîroz kîrin û xwestin ku di nav xebatén wé de cih bigi-



rin. Di vebûnê de, gelek avahiyên fermî, weke sendiqe, komele, partî hwd hatibûn. Ji bo vebûnê gelek mirov û komele pîrozbahî çelingen kesk, sor û zer şandibûn.

Vebûna şaxé bi axaftina seroké MKM dest pé kir. Seroké MKM İbrahim Gurbuz, di axaftina xwe de li ser peywirén MKM û giringiya wé rawestiya û wilo digot:

"Çand bingeha hebûna miletekî ye. Ger em dixwazin hebûna xwe xurt bikin, divê em çanda xwe jî, xurt bikin. Yé ku iro gelé Kurd li ser piya hiştiye, çanda Kurdi ye. Ev çand ku bingeha çanda Mezopotamyayé ye. Emé bi çanda xwe û bi tékoşîna xwe ve her tim hebin."

Di pey axaftina İ. Gurbuz de, A. Lokmen jî, bi Kurdi ji mévanan re weha digot:

"MKM li dijî talankirina çanda Kurdi hatiye avakîrin. MKM bi seré xwe nikare tu tişîf bike. Divê her mirovekî Kurd, çawa li xwenasiya xwe xwendî derdikeve, li çanda xwe jî, xwendî derkeve. Xwendîderkezin a li çanda Kurdi, ji bo Kurdeki, peywirê neteweyî ye."

Di vebûnê de tişteke din ku zêde bal dikişand, pirbûna jinén Kurd bû. Mirov di çavén wan de, xwedîyê çan-



da Kurdi didît. Kî dikare rola jinén Kurd înakar bike? Helbet tu kes nikare înakar bike. Ji zimén bigre ta orf û adetan gişt bi xéra jinén Kurd hatine û gihiştine iro. Di nava jinén Kurd de, hin ji wan hebûn ku hîn bétir bala mirov dikşand. Ev jî, yén ku ji wan re té gotin "turbanlı". Bi rastî jî, pir kéfa mirovin dihat, gava ku me wan didît. Ji ber ku ji her kesî Kurd, li çanda xwe xwendî derdiket, ci olprerest û ci sosyalist. Di van rojén dawî de ku neyar, ola İslâmî li dijî tékoşî-

na rizgariya neteweyî dixebeitîne, ji ber vé hatina van jinan, hîn bétir watedar bû. Lé dîtina wan ci dibe bila bibe, armanceke wan hebû: li çanda Kurdi xwedî derdiketin. Balkşeke din jî, beşdarbûna mele û kalan bû. Kalén beşdar welé digotin: "me pirtî dîtin di jiyana xwe de, ev tiştén me dîtin, çanda me û dîroka me ye. Lé tu carî bi dilekî bé tirs em lé xwendîderkezin, lé belé iro gelé me tev bi hev re di nav tékoşîne de ye, zar û zéç tev çawa ku li welaté xwe xwendî

derdikevin li çanda xwe jî xwendî derdikevin. Gava em van dibînin, em xort dibin. Bi rastî jî, wechê wan kal û meleyan weke gulén biharé bû, çavén wan dibiriqî.

Şaxé MKMé yé li Amedé, bi piranî xebatén xwe dé li ser lékolîn, berhevkirin û dersén muzîk, folklor û şanoyé bidomîne. Mamostetiya dersén muzîkî, Sadiq Ziypak dike. MKM dest bi berhevkirina pirtûkén kevin wek muzîk û helbestén herémî kiriye. MKM bang li her mirovekî Kurd dike û dibéje: gotinén péşîyan, çîrok, metelok, stran, helbest, pirtûk û hwd. anku tiştén ku di destén we de an li heréma we hene, berhev bikin û ji me re bisînin ku em karîbin çanda xwe li ser hev bicivînin.



EBI GORE BÊ EDETANE MA ZEWAC CENÎ WAŞTİŞ RA HETANÎ ZÊREY ŞİYAYİŞ

(1)

J. ESPAR

Zewac yew derg û dila wo. No proses bi cenî waştiş dest pey keno û hetanî rojo ki veyki zêrey(zêvi) ra yena dewam keno. Prosesê zewacî, bî gore bê cayan û kesan vuriyêno (bedeliyêno).

Mi na nuştada xwi di zewac, ebe gore bê edetanê zerrey Pîranî niuşto. Zeki yeno zanayış edet û torey çidê statik niyê û zeman miyan di vuriyêni. Nê edet û toreyê ki ez tiya di nusena, hetanî 20-25 serrî verê zî Pîran di bî. Çiyê ki mi tiya di nuştî, zafiney yînî mi bi xwi dî ya zî eşnawtî. Labelê mi na mesela ser o yew cenî û yew camêrdê Pîranij reyra zî qisey kerdi.

Emrê Zewacî

Zafiney estanik û meselandê ma di, emre zewaci çares o. Mesela vanî, "xorto çares serre bi newe amebi xwi ser, hinî wextê yê yî zewaci bi." Herçiqas na mesela estanikan di ana ya zî, labelê kê nişnî vajî emrê zewaci illehim ehendi yo. Emir gore bê weziyetê keynek û lacekî, gore bê weziyetê key pêrdê lacekî ya zî keyneki vuriyaynî. Faktorê ki rew ya zî erey zewaciyiş ser o tesîr kerdinî zafi bî. Mesela eke lacek yewek bibînî, zafiney reyra rew zewecnaynî. Çunki mar û pêrê lacekî waştinê ki rew tor-

nanê xwî veynî. Eke may lacekî nê-weş bibînî, no weziyet bînî sebebê bînî û herundey pêrdê xwi di bînî sermênê keyî. Veyki zî, herundey



rew zeweciyê lacekî. Ebi inhewa ve-yezi heti (yardimê) vistiriyya xwi kerdi. Yanî tiya di may û pî tenya lacê xwi nêzeweçnenî, eyñî zeman di, karê keydê xwi zî veynenî. Ge ge zî çaxo ki may ya zî pî, lacekî rew bimardinî lacek rew zewecaynî. Sebebê na mesela aya bi ki, mîrdimo ki bize-wecnaynî, hinî şarî miyan di gede nê-hesbaynî, otorîte û prestijê cê vêşî

vistrîdey xwi di wayirey keyi û vistew-re û gorimandê xwi kerdinî. May key-nan wexto ki rew bimardinî, zafiney keyney rew zewecnaynî. Ebi inhewa, keyney xezebdey damêrî ra xelesay-nî. Hetê bîni ra keyneka bê may, bê mihefeze bî. Yew girwewo xirab şiyaynî bêro yay serî sar-di. Helbet nî-nan ra teber zî sewbê faktorê ki wex-te zeweciyayişi ser o tesîr kerdinî bî.

Labelê emre zewaciyo normal, beyn-tardê 15-20 di bi. Mesela xorto ki es-kerey ra pey bizewecaynî qart hese-baynî. Keyneka ki bibînî vîst serra, hi-nî "keye di menda" hesebayni.

Wexto ki lacek ya zî keynek bînî 15-16 serre, yanî lacek bînî xort û keynek zî bînî keynay, zewac bedeli-yayışo biyolojik ra teber, tiyageyra-

ye (ya zî resayey) fistanê xwînê tewr weş pira girewtinî, biskey xwi viraştinî û ya mexmela mureyîni, ya zî qinta oyekerda eştinî xwi serî sar di elbê girewtinî şînî *Eyniwo Cêrên*.

Eyniwo Cêrên seredê çarşuy di bi. Ü hema hema hîrê mehlandê Pîran ra eynî durey di bi. Tînci wexto ki şînî awan, gitley keynanê verênan

elbê xwi daynî çimandê ey-nî ver. Eyniwo Cêrên wexto ki bînî ye-re tenya xizmetê keynekan dê Pîran-jan di bi. Aynanê ki pelasî, cacimî, xeysey ya zî izerî (wextê rezan di) bi-sutinî, ga-

nî girwey xwi verê meladê mexrebî bi-qedênatî. Hergû keyneki embazey xwina en hewli reyra şînî awdey yerî. Eke xeberê yînî pinonî bibînî, yewbînan rî vatînî. Embaz û mîrdimê xwinê mehlandê bînan dînî. Xeberê heme hîrê mehlan zî Eyniwo Cêrên ra vila bînî. Aw kiriştişê keynan heta-nî dina tarî bibînî romitînî. Hetta za-finî melay eşay rayirdê eynî ser o goş-tartînî. Semedo ki keynekî yew di qisey yewbînan reyra bikî û biney nor û dorey xwi ra bewnî, yew di ray rayirdê eynî ser o elbê xwi ronaynî. Keyney mehlay Celloni çaxo ki Comiyo Cêrên ra viyartînî, elbê xwi ronaynî. Yew deyîra dormarey Pîranî awey yerî inhewa teswîr kena:

Keyney rindî Eliyon î, nînnayey,
Keyney rindî Eliyon î, nînnayey.

Elbonê xwi todonî, nînnayey,
Elbonê xwi todonî, nînnayey.

Hokay comî tadowî, nînnayey,
Hokay comî tadowî, nînnayey.

Seyday comî di rononî, nînnayey,
Seyday comî di rononî, nînnayey.

Pey çimon xeber donî, nînnayey,
Pey çimon xeber donî, nînnayey.

Keynanê mehlay Mehmu Çelebon zî wexto ki kure ra viyartînî, elbê xwi ronaynî. Ey mehla Yareliyon zî, Duzê Xonî ra ki viyartînî elbê xwi ronaynî.

Zeki ma va, rayirê eynî keynan rî zaf muhîm bî. Ayê ki waştey yînî bî, rayirê eynî di şiyaynî yînî veynî û biney "çimanê xwi roşn bikî." Ayê ki bê waşte bî, hêvî kerdinî ki xwi rî yewî veynî, ya zî xwi xortan binawnî û xwi yînî virî finî. Înênan ra teber zî, bi awey yerî cîfî keynan vejiyaynî. Keyneka ki bi nîşan bibînî ya zî biamey-nî waştiş, hinî fek awey yerî ra vere-daynî.

Baş o, çaxo ki keyney şînî awdey yerî, xortan se kerdinî? Hema pey Eynîwo Cêrên di, "*Eynî Comérdo*" bi. No eynî, serê yê girewtebî. Hem camêrdan desmaj girewtinî û hem zî te de dekewtinî aw. Keynan wexto ki dest bi aw kiriştişê kerdinî, xortî zî Eynî Camêrdan di pêser bînî. Ya zî cay cî mene kerdinî naşt-dâşt şînî ameynî. Tayn xortan zî nîzdî eynî çend dikanan di refin girewtinî.

Kortan sewbî hewa zî zewacwaş-tîşê xwi daynî teber. Eke xort raşte-raşt nîşno vajo, "*ez zewecêno*" dest pey kerdinî keye di lej (dewa) vetinî. Qorînî çend aşmî keye terk kerdinî. Taynan zî vatînî "*Ez serey xwi gêno rageyreno*". Karê keyf nêkerdinî, şew erey ameynî keye û ebe inhewa may û piyê xwi dejnaynî.

Helbet her mar û pêrî waştinî ki gedanê xwi bi rispêney bizewenî. Ayay ser o wexto ki lac dozey zewaci kerdinî, eke debarey yînî zaf xirab nê-bînî, dest bi mişewrey zewacdê lacdê xwi kerdinî. Qorê mar û pêran zî, verê ki lacê yînî qaley zewaci biko, yînî zor daynî lacdê xwi ki bizeweco. Ser meseladey mişewredê mar û pêrî



yış, wariştiş û roniştişê yînî heme he-way ra bêdeliyaynî (vurîyaynî). Key-nan zî, lacan zî waştinî mar û pêrdê xwi, der û cîrananê xwi binawnî ki yê ameyî çaxdê zewaci. Çunkî 15-16 ser-rî emrê zewaci bi, û ganî "yew welli xwi ser o bikerdini".

Awey Yerî

Ay wext Pîran di edet nêbi ki kê vaji, "*ez wazeno bizeweco*." Na mese-la di girwey lacan hina asan bi. Lacî ge ge şiyaynî mar ya zî ward xwi ra vacî, labelê keyney nîşaynî raşte raşt qaley zewaci bikî. Ez bawer keno ki no weziyet ewro zî hetey keynan râ zaf nêbedelawo. Labelê lacan zî, key-neka zî zewac waştişê xwinê zewaci bi tayn hewayan reyra nor û dorey xwi nawitinî. Pîran di çaxo ki keyna dest bi awey yerî bikerdinî, ay çax herkesî zanayni na keyna keynay zewaci ya. Pîran di wexto ki bînî yere, wazeni wa ay keyf rî aw lazim bibînî, wazeni wa lazim nêbînî, keynay keyf ya resa-

yew mesela Pîran di vajêna:

Vatişan gore, roçê yew may û pî cil mîyan di qalê zewacê lacdê xwi keni. Mérdek vono:

-Cenêk, ma herê xwi biroş û pey lacê xwi bizewecnî.

Cenêk zî rotişê herî munasib veynena. Oxmo ki lajek zî nérakewto, yînî goştaren. Zaf keyfê lacekî inê qalon rî yeno. Ay beyntar di yew deme şono, lacek ewnêno veng dayê û bawoy ra nêvecêno. Ayay ser o roçê lacek mardey xwi perseno vono:

-Dayê şima çirî qalê herî nékenî?

Coka Pîran di wexto ki lajek bi-ameynî çaxê zewacî, şar naşt-daş bi-heneki persaynî, vatinî şima "çirî qalê herdê xwi nékenî?" Ya zî mérdimanê lacekî vatinî, "ma ganî hinî qalê herdê xwi biki".

May hetey cenî veynayîş ra hina aktif bî. May xortan hetanî ki lacê xwi bizewecnaynî, timi konsantrê zewacî bi. Hêşê yînî timi keynekan ser bi. May timi bi heyecan bi. Û nê gir-wiy ra, yanî veynayîş keynan ra, ya zî na mesela ser o qisekerdişê ra zaf zewq girewtinî. Marey lajekî keynekê ki hêşdê yay bikewtinî, mérdedê xwi rî behs kerdinî. Eke zerrey lacekî nê-kewtibî yewerî zafîney vatey mar û pêrdê yê bîni. Ge ge na mesela ser o gerar dayîş xêlê zeman girewtinî. May ya zî waranê lacekî derî keyney omaritîni. Ge ge zî tena na mesela ser o mérdimê lacekê nizdî ameynî pêser, qorînî namey keynan vatinî û yînî ra tizbihî ontinî. Keyneyê ki ameynî yînî virî pêrû hesebnaynî. Zafîney ebi inhewa çend aşmî namey keynan omaritişî reydi viyartîni. Keynan vicinayîş ya zî waştiş bi gore bê haldê lajekî bedeliyaynî. Ma vajî eke lacek wayîrê yew guri bibîni, ya zî biney hal û wextê yînî wes bibîni, abi gore keyney omaritîni. Labelê eke lajek karê yê çinêbinî, feqir û belengaz bibîni, omaritiş yînî zî abi gore bîni. Yanî, "hergû teyr qordê xwi reyra firayû".

Helbet eke lajek yew mérdimda xwi reyra bizewecaynî, ay wext gir-wey zewacî hina rehet bîni. Eke way lacekî ya resaya bibîni ay wext cenî "bedelî" zî pejmiriyyaynî (duşmişaynî).

Keyneki Veynayış

Caxo ki key lacekî di hemînî qaley yew bikerdinî û qerar bidaynî ki lacdê xwi rî keynarey filanesi waze-nî, ay wext verê heme çî ganî keyneki bidiynî.

Bê guman, eke polê lacekî keyneki bişinasaynî, ay wext icab nêkerdinî şerî keyneki veynî. Labelê eke kinarê lacekî keyneki ya zî key keyneki nêşinaynî se, meselây keyneki veynayış tikê zehmet bî. Polê lajekî ganî yew qasudi biersawitînî key keyneki. Qasidi zî, raşte-raşt nişaynî şera key keyneki, ganî cay çî mene bikerdinî. Qasidi ya vatinî mangay ma, bizey ma bîya vinî; ya zî cay yew haci qard kerdinî.

Pîran di edet bi, caxo ki yew cenî-ya xerîb bişînî yew keye ki te de keyneye resaya bî, keyneki şînî lew destê mêmmandey xwi ra daynî. Ebi inhewa qasudi keyneki dînî. Helbet wezîfey qasudi tenya keyneki veynayış nêbi, ganî hetamî boyey fekdê keyneki, keyneki kontrol bikerdinî. Rayir şiyâyiş-dê yay ra bigêri, hetanî qise kerdişê keyneki, qasudi dîşet kerdinî. Labelê polê lacekî tenya bi vatis bê qasudi rehet nêkerdinî. Sewbî zî, derheqdê keyneki di, derheqdê keydê keynek di melumat girewtinî. Nê melumatan ser o polê lacekî qerarê xwi daynî.

Lacekî û keyneki zafîney durî ya yewbinan dînî. Veynayîş lacekî hin-dey qasudi û mar û pêrdê lacekî mu-hîm nêbi. Zaf kembo zî yew yew keyneki û lacekî yewbinan nizdî ra bibînî, ya zî rez û bostanê yînî nizdî yewbinan bibînî û yê zî zaf jîhatî bibînî, şiyaynî yew-di qisey zî yewbinan reydi biki. Gelekê yînî zî, şewa ki zewe-caynî yewbinan dînî. Qorêni zî şini-key di yewbinan dîbi.

Hetey keyneki ra meselây veynayışê çinê bî. Labelê eke keyneki xwi "bê arey" binaynî, ay wext şiyaynî durî ra waşte rê xwi veyna. Tayn mar pêranê keyneki zî, waystini ki keynay yînî waşterê xwi veyna. Ay wext lacek eke imkan bibînî berdê pêrdê keyneki ver a viyartîni. Keynek zî yo çarçiba ra dînî. Ya zî ebe yewna hewa. Labelê her hal û kar di keyneki

wayştey xwi duri ra dînî. Yew yew keyneki zî waştey xwi begam nêkerdinî û zewac red kerdinî. Ganî kê vajî keyneyê anaserênî kem bî.

Mar û pêrê keyneki zaf waştinî ki, keynay xwi bi rispêney bîdî û tira "pank" bî. Ketî ra kê şenî vajî keynya ya resaya keye di mar û pêrî rî heze yew bela bî. Hetanî keyna daynî, hetanî rojê veylekî hewelnayîş, zerrey yînî terpi-terpi kerdinî. Çunki keyna namus bî, şeref û itibar bî. Ma heti yew qali esta vanî: "Cenî kê rezilî zî kena, wezir zî". Cora zî may û pî, keyna ser o zaf hesas bî. Helbet meselâdey keyna di mesûliyet zafîney mar di bi. Keyna cay yewerî rey bikewtinî ya zî çî biameynî yay serî sar di, şarî, lomey verê hemînî mar ra kerdinî. Aw samec ra çimê mari tim û tim keyna ser o bi.

Herkesi waştinî ki cay keynerdey yînî rind û rehet bo. Labelê eke hal û wextê mar û pêrdê keyneki rind nêbînî, ya zî keynekî yewda rind û tira-omeya nêbînî, dayîşê keyneki biney zehmet bîni. Heta bîni ra yew nişaynî keynardey xwi rî xortan bomaro, hewna yew nişaynî şarî ra vajo, "filankes ez wazeno keynarey xwi bido lacdê to". Labelê eke may, way yan zî yew mérdemey keyneki tikêjî jihatî bibînî, ay çax dayîşê keyneki bineyna (asan) rehet bîni. Yew ceniya ona, şiyaynî cemâtê ceniyan di wesfanê keynekî bida û mardey lacekan reyra dostey bika. Sewbî zî may keyneki, bi yew hewawo nimitikî, şiyaynî mardey lacek ra vaca, ki ya wazena keynarey xwi bida lacdê jay. Ge ge zî maranê keynan raşte-raşt verey xwi tadaynî xortan. Caxo ki yew xorto hêşkewte bidîni vatinî: "filankes la, qey ti hînî nêzewecêni?" Û zaf alaqa xortî nawitinî û bi yew hewa behsê keynardey xwi kerdinî.

Tayn keynekê jîhatî ne têda, zafîney keynekan derheqdê zewacê xwi di yew rolê yînî çinê bi. Keynan xwi nawitinî ki wextê yînî yo zewacî yo. Û eke xortê ki weş bê, yînî bişînî bidînî, herçî binê çiman ra ewnayîşî ri texsîr nêkerdinî.

Do dewam biko

gerîla

negrî bilbil

Jîr DILOVAN

Daketine meydanê
Gerîlayêñ dînemêr
Ji bona tolhildanê
Wek baz û piling û şêr

Tolhildana Kurdistan
Tax û gund û şaristan
Ji bo nebin goristan
Şerî danîne ber kîr

Wek Gabar û wek Cudi
Wek sîpan û wek Sîndî
Bi çîk û serbilindî
Kuştin, mirin dibe xêr

Bira ne rêheval in
Qozeqera bi xal in
Tim bi sewq û şemal in
Wek heyv û roj û stêr

Rêwingî ne li riyan
Li deşî û çol û çiyan
Bo karker û gundiyan
Dixwînin wek kewê nêr

Çi mîrxas û leheng in
Dilsoz û pir çeleng in
Tim bi şer û bi ceng in
Bê nan, bê av û nîv têr

Bi rûmet canfida ne
Parêzarêñ Kurda' ne
Çavkaniya merda' ne
Ew egid û merdemêr

Başokeyen sîpî ne
Çiya bo wan hêlin e
Keleqija havînan
Av in ji bo me li cêr

Li Serhed û li Botan
Ew dikin şerê giran
Wê rizgar kin ji destan
Axa me wek zîv û zêr

Jîr Dilovan bi havar
Divê tev bibin şiyar
Bo wan bibin alîkar
Bi melhêb û tevr û bêr

Sibehê re meşûme nav bax û bexçan
Çi bi axân û bi figan dixwîne bilbil

Min jê pîrst: "Bo ci wiha tu dixwîni?"
Got: "Nepirse, tu nekole birînên kul"

Bilbilê zar û perîşan bi te zanim
Ez jî dikim girî birîndar im ji dil

Lê bi girî em nagîhîn mexseda xwe
Bes rondikan bibare ji çavêñ bi kil

Got: "Ez çawa nekim girî, nekim havar?
Ev çend hezar sal in ku ez qut im ji gul"

Kund û tütik dideynin li ser gulan
Em ji gul û gulîstanen xwe bâne sil

Were bilbil tu gazin û loma neke
Ez bi te re rêwingî me bi te dim mil

Bi këf û şahî bixwîne, ci ye girî?
Jîte re desmal, tu paqij ke wan çavêñ sil

Divê em xweş biborînin bîhara xwe
Hê ser me de nehatî ew çileye çil

Edî em hay ji xwe hebin nekevin xew
Da ew gurêñ dev bi xwîn me nekin xafil

Jîr Dilovan dibê ku tev bibine yek
Hê xan û man, gund û bajar nebûn kavîl

HEVPEYVÎN BI ORDÎXANÊ CELÎL RE

Hevalê me Ehmet Xelîlî, ji vir çend meh berê, bi Ordîxanê Celîl re, li bajarê Bochumê -Almanya-hevpeyvînek çêkir. Lê vê hevpeyvînê ta niha me nekarî ku em biweşînin, ji ber ku rûpelên kovarê tejî bûn. Bila xwendevanê me, heval Ehmet û Kek Ordîxan me bibexînin.

Wek ku xwendevanê me jî dizanîn, di warê çanda Kurdî de Ordîxanê Celîl, mirovîkî zana, xwedî otorîte û pispor e. Ordîxan, li Erîvanê di sala 1932'an de ji diya xwe de bûye. Bavê

wî Casim, Hozan û torevanekî mezîn e. Bi rasî malbata Celîl, malbateke zana û welatparêz e. Ev malbat, di hemdemê de wek xwendegeheke Kurdî ye. Zarowên vê malbatê, anku xwendekarên vê xwendegehê, di qada çandê, wêjeyê, folklorê, dîrokê û hwd. de, ji gelê Kurd re gelek xizmetên mezîn kirine û hêj jî dikin.

Malbata Celîl, di sala 1918'an de ji ber zîlm û zordes-tiya dewleta Osmanî koç dike û diçe li Erîvanê bi cih dibe. Ordîxan pişti ku zanîngehê di-dîne, di radyoya Kurdî ya Erîvanê de, demeke dirêj dixe-bite. "EZ xwe kubar dibînim ku dengê min ketiye guhêne Kur-dîn Kurdistana Bakur. EZ xwe kubar dibînim ku dengê min ketiye guhê Serok Apo "dibêje Ordîxan.

Ordîxan, di sala 1949'an de dest bi berhevkirina çîrok, metelok, serpêhatî, stran, lawje û hwd. dike. Ew li Lenîngradê di sala 1957'an de diploma doktoriyê digre. Anku êdî ew Kurdolog e.

Rewşen: Ta iro çend pirtûkîn

-berhemênen te hetine weşandin. Ev berhem li ser çi mijarê ne û niha hûn bi çi re mijûl dîbin?

Ordîxan: Mîl û mijûlaya min zê-detir li ser wêje (edebiyat), ziman û

la jî, li ser muzîka Kurdî dixebite. Ta niha 22 pirtûkîn min hatine çapki-rin. Ev berhem, tev, li ser edebiyat û zargotina Kurdî ne. Pirtûka min a pê-şîn di sala 1964'an de çap bû. Ev pir-


tûk, ji dîlökên civata Kurdî tê pê. Pirtûka min a didowan, di sala 1967'an de çap bû. Ev berhem li ser Keleha Dimdimê ye. Di vê salê de pirtûkeke min jî, li ser Cigerxwîn derket. Ji bo zarokên biçük, min pirtû-keke dersê hazir kir. Pir-tûkîn min ên din jî, li ser wêje(edebiyat) û çanda Kurdî ne. Ez vê xabata xwe niha jî didomînim.

Rewşen: Hûn Kurdîn Bakur dinasin, Kurdîn Sovyeta berê, ji hev gelek belewele û cida dijin. Hin li Azarbeycanê, hin li Er-menîstanê û hin jî li Gur-cistanê ne. Gava em Kur-dîn Bakur û yên Sovyetî bidim ber hev, kî ji wan zê-detir bişiviye (asimile bû-ye)?

Ordîxan: Kurdîn Er-menîstanê neheliyanê (ne-pişivîne). Lê yên Azerbey-canê gelek heliyan e. Di sala 1931 ê de, li Azerbey-canê nêzîkê 60-70 hezar

folklorâ Kurdî ye. Birê min Celîl, bêhtir li ser dîrokê, xwîşka min Cemî-

Kurd hebûn. Ev hejmar iro welê kêm bûye ku mirov dikare bêje ne-



maye. Asîmîle bûne û xwe Kurd na-hesibinîn. Li Ermenistanê him Kur-dên Ezidî, him jî Kurdên misilman hene. Kurdên Ermenistanê, li xwe xwedî derketine û xwe parastine.

Kurdên li Azarbeycanê zêde di bin bandêra (tesîr) misilmanî û Aze-riyan de mane. Xwendevan, zêdetir di nav Kurdên Ezidî de derketin. Ev xortêñ xwenda jî, xwe û derdora xwe parastin. Li Kurd û Kurdîtiyê xwedî derketin. Ez gelek mirov ji Kurdistana bakur dinasim. Rihê Kurdîtiyê bi wan re heye û gelek xurt e jî. Lê di bin tesîra Tirkî de ne. Rihê wan Kurd e, lê zimanê wan Tirkî ye. Hi-nek ji wan digirîn, dibêjin: Me zima-nê xwe ji bîr kiriye.

Hikûmeta Azerbeycanê û dewle-ta Tirkiyê, Kurdên li nav xwe, bi zor-destî asîmîle kirine û hîna jî dikin. Lê ev zordestî, li Ermenistanê nîne. Anku Ermenî, Kurdish bi hikmê zorê asîmîle ne kirine û niha jî nakin.

Em berê giş li Ermenistanê û Nexçivanê diman, pişti ku Sovyet çê-bû, em ji hev belewela bûn. Gelek ji me çûn Gurcîstanê. Ji ber ku aborî û hewayê Gurcîstanê baş bû. Di sala 1937'an de Stalin, bi hezarî Kurdish koçê(surgun) Kâzakîstanê kir. Niha li Kazakistanê 90 hezar Kurd dijîn. Kurdên li wir bi zimanê xwe baş nizanîn. Ji ber ku li wir xwendina Kurdî tune. Lê orf û adetêñ xwe ji bîr neki-nine.

Rewşen: Stalin çîma Kurdish ji ci-hê wan radiqewart (der dikir) cihêñ din?

Ordixan: Stalin ne tenê Kurdish, lê gelên (xelkêñ) din jî, ji ci-hê wan di-kir û diqewart. Kurd li ser sînorêñ Tirkiyê dijîn. Têkiliyêñ wan bi Kur-dên Tirkiyê re çêdibû. Stalin nedix-west navbera wf û Tirkiyê xerab bi-be. Têkili û çûnûhatina Kurdish, dikarîbû serê sovyetê bêşanda. Têkiliyêñ Kurdish sovyetê, ne tenê bi Kurdên Tirkiyê re, her wiha bi Kurdên Iranê re jî hebûn. Stalin dixwest têkiliyêñ Kurdish, ji hev qut bike. Ji ber vê ye-kê, Kurdish ji hev bela kir. Niha li Tirkmenistanê nêzîkê 3 mîlyon Kurd hene. Lê piraniya wan asîmîle bûne.

Yên mane jî, bi hev re bi zaravayê Kurmancî dipeyîvin. Ev Kurd, di de-ma Nadir şah de, nêzîkê 400 sal be-rê, koçê vê derê kirine.

*Kurdan pîrî caran
serihildan û xwîna xwe rêtin.
Mirov ku vê xwînê ber hev bike,
jê goleke mezin çêdibe.
Lê tu demê em bi ser neketine.
Sedemê mezin
tunebûna yekbûnê
û ïxaneta hundirîn e.*

Rewşen: Li Sovyetistanê jî, li Kurdish gelek neheqî hatine kirin. Niha tu rewşa (halê) Kurdish çawa dibîni?

Ordixan: Bêtîri 200 sal in ku rew-şa Kurdish ne qenc e. Kurdistan, pê-şîn di navbera du dewletan (Osmanî - İranî) de hat perçê kirin.

Anku ev her du dewlet, Kurdish-anê bi hikmê zorê, bi fêl û fendan vegirtin. Paşê Kurdistanê kirin çar perçê. Kurdish pîrî caran serihildan û xwîna xwe rêtin. Mirov ku vê xwînê ber hev bike, jê goleke mezin çêdi-be. Lê tu demê em bi ser neketine. Sedemê wê pir in. Sedemê mezin tunebûna yekbûnê û ïxaneta hundi-rîn e.

Lê iro ez dibînim ku li Kurdish-anâ bakur yekbûn heye û ïxanet jî, êdî nikare zêde li ber xwe bide.

Rewşen: Tu dibêji ku "xwîna Kurdish a ku hatiye rêtin, ber hev bibe çend golan tiji dike". Ev gotin dil bê-şîne jî, gotineke rast e. Gelê Kurd, di serihildanan de her tim xwe spartîne çiyan. Gelek netewe hene ku di bin zordestiyê de hun da bûne. Gelo gelê Kurd ji bo çi hunda nebûye. Se-demê wê çi ne?

Ordixan: Ez jî, li ser vê pirsê ge-lek fikirîme û difikirim. Gava te vê pirsê ji min pirsî, Mîraslaw Zigmind hat bîra min. Wî pirtûkek (kitêb) ni-visiye. Navê wê "Kurdistan: Welatê serihildanan, efsane û hêviya roja bê" ye. Anku me çiqas serî hildaye, me hêvi kiriye ku em dê bi ser kevin. Ev hêvi tim di dilê me de bûye. Lê bi

hêviyê tenê mirov bi ser nakeve. Xe-bat girîng(muhîm) e.

Serihildana Kurdish her tim li se-rê çiyan bûye. Ciya ji me re bûne pişt. Hin taybetiyêñ(xususiyetêñ) me Kurdish hene ku nahêlin em hunda bibin. Mêrani, ciyayêñ me yên bi-lind, Kurdîtiya me ya hişk ku di dilê me de rûniştiye û ziman û çanda me.

Rewşen: C. Bedirxan dibêje ku gelê dînyayê xwe bi du tiştan parastine: Ol(dîn) û ziman . "Ol di destê di-jîmin de li hemberî gelê Kurd hatiye xebitandin. Di destê me de jî ziman ma ye. Anku em xwedîyê nîvcek man e." Li gorî we, zimanê Kurdi di jiyna Kurdish de rôleke çawa lîstîye?

Ordixan: Gotina Celadet Bedir-xan bi rastî jî kûr e. Civatek, xwe bi sê tiştan xwedî dike: Ziman, çand û ol, zimanê Kurdi, zimanekê dewle-mend e. Çar zaravayê Kurdi hene. Zaravayê herî mezin Kurmancî ye. Dijminê gelê Kurd her tim xwestine ku me bindest bîhêlin, ji ber vê yekê dixwazin ku me ji hev perçê bikin. Dijminê gelê Kurd dibêjin ku Zaza-kî-dimili- ne Kurdi ye. Hin ji wan dibêjin ku lorî û hewremanî jî ne Kurdi ne. Heke em zimanê xwe ne-parêzin em nikarin xwe biparêzin. Divê her Kurdek, bi zaravayê xwe bi-peyîve û binivîse. Pirsgirêka zaravan gelek zehmet e. Kisenefon dibêje ku gava em di Kurdistanê de derbas bûn, em rastî zimanekî hatin ku me berê hîç nebihîstibû. Li vê derê ne Tirk ne jî zimanê Tirkî hebû. Lê dew-leta Tirk, li Kurdishana bakur bi nav-gîna (wesite) dînê, Kurdish pişavtiye (asîmîle kiriye). Li Azerbeycanê jî, xwestine û hîna jî dixwazin ku Kurdish bîmîhînin. Li Azerbeycanê, de-ma Kurdek diçû daîra pasaportê û di-got ez Kurd im. Azerî digotin: "Ma tu ne misilman i? Heke tu misilman i, tu Azerî yî jî..." Kurdên Azerbey-canê di bin hoyêñ (sert-merc) dijwar de, zimanê xwe ji bîr kirin. Zimanê Kurdi bi têne di nav Kurdên li serê çiyan de ma. Kurdên deşti zu heli-yan.

Rewşen: Dîn heta niha di civaka Kurdish de rôleke berevajî û ne qenc

listiye. Dema em li şoreşa Nikaragowayê dinêrin, dîn li vir roleke mezin û pêşverû dilize. Dîndarêñ déran (kîlise) di şoresê de cih girtine û li hemberî zordestan şer kirine. Dîn, di nav Kurdish de, çima xwedî roleke negatîv e?

Ordixan: Ereban, bi hikmê zorê (kotek) İslamiyetê bi xelkê me dane qebûlkirin. Tirkan, Ereban û Farsan bi navê İslâm gelê me xapand û ew bindest kirin. Dagîrkeran bi vê şeveyê (awa-tarz) xwestin ku gelê me di nav xwe de bimihînin û bibin xwendiyê hemû heyînên gelê Kurd. Şêx, mele bi Erebî xwendin û ibadetêñ xwe bi Erebî kirin. Bi vê awayê tesîra Ereban li ser gelê me zêde bû. Mîletek çiqas ji çand û zimanê xwe dûr bikeve, hewqas zû û hêsan (qolay) dihele. Lî Kurdêñ Ezidî li çand û zimanê xwe xwedî derketin. İbadetêñ xwe jî, bi Kurdi kirin û xwe parastin. Dijminêñ gelê me herçiqas xwestine ku gelê me bihêlinin û ji holê rakin, disa jî, bi ser neketine. Digel hertiştî, xelkê me xwe parastiye û di nav seri-hildanan de cih girtiye. İro gelê me, ji her demê bêtir bi zexm e. İro dîndarêñ me jî, di nav şoresê de hêdî hêdî cihêñ xwe digrin. Di nav gel de dîn, divê nebe sedemê perçebûnê, lî divê bibe sedemê yekbûnê. Divê em rûmetê bidin dînê jî. Divê herkes di dînê xwe de serbest be. Lî divê em tev, nîrx û rûmeta Kurdeperiye bi-parêzin. Divê armanca me yek be: Em bindestî naxwazin, em dixwazin azad bin.

Rewşen: Tê gotin ku folklor, metelok, serpehatî, anku edebiyata Kurdi ya zargotinê, (devki) ji ya nivîsarî pirtir û pêşdetir e. Li ser vê nêrinêne we ci ne?

Ordixan: Helbet zargotina me dewlemend e. Lî dijminêñ me dest danîne ser hemû dewlemendî û heynîn me. Lî dewletêñ dagîrker nekarîne ku zimanê me ji me bistînîn. Ji ber vê yekê jî, zargotinê me, ji me re mane. Gel bê çand, çand jî, bê gel nabe. Folklor bixwe jî, perçek ji çanda Kurdish e. Zargotinêñ me ji yên cînarêñ me tev dewlementir e. Ev ne

gotina min tenê ye.

Rewşen: Nivîskarekî Alman dibêje ku dema Kurdek ji diya xwe de di be, wek dengbêjek e. Ev gotin çiqas rast e?

Ordixan: Nivîskarekî Ermenî jî, dibêje ku her Kurdek bi rih û can helbestvan (şair) e. Derd, kul û xwestinê wî di nav stranan de cî girtiye. Anku jiyana me ya abori (ekonomik), civakî (sosyal) û konevani (siyasi) bûye derd, kul, xem û xiyal di dilê me de rûniştiye. Edebiyata me jî, gelek dewlemend e. Bêtiri cil şairêñ Kurd bi Kurdi helbestan nivîsine û xwedî dîwanêñ mezin in. Edebiyata me ya nivîsarî, jî gelek kevn e. Zend-Awesta, Mishefa Reş (pirtûka pîroz a Zerdeş pêxember) bi Kurdiya kevin hatine nivîsandin.

Herwek destnivîsarêñ Kurdi yêñ kevn gelek bûne. Lî tev ketine destê dijmin. Dijminêñ gelê Kurd van berheman ji holê rakirine. Gelek ji wan jî, hunda ne. Gelek nivîskar û hozanêñ Kurd hene ku bi Tirkî, Erebî û Farisi nivîsine. Ev nivîskarêñ ha, her çiqas ji çanda neteweyêñ serdest re xizmet kiribin jî, disa ew Kurd in. Divê li ser van nivîskaran lêkolîn bêñ kirin.

Rewşen: Wek ku hûn jî dizanîn, di navbera zaravayêñ (Kurmancî, Soranî, Dimîli, Lorî) Kurdi de hin cihêti hene. Yekîtiya zimêñ dê çawa çêbe? Dê Kurd çawa hev serwext bikin?

*Iro gelê me,
ji her demê bêtir bi zexm e.
İro dîndarêñ me jî, di nav şoresê de
hêdî hêdî cihêñ xwe digrin.*

*Di nav gel de dîn,
divê nebe sedemê perçebûnê,
lî divê bibe sedemê yekbûnê.*

Ordixan: Belê, çar-pênc zaravayêñ Kurdi hene. Wek ku te jî got. Ji bo têkilî û hevserwextkirinê, divê ev her çar zaravayêñ ha jî, bêñ xebitanîn. Divê nizikaya van zaravayan ji hev re hebe. Anku divê nêzîkê hev bin. Lî ne rast e ku mirov yek ji wan

serdest bixe. Divê wekheviya zarava yan hebe. Mirov nikare yekê qedexe bike û bi yek zaravayê bipeyivê. Ev pirsgirêke mezin e. Zimanzañ divê li ser vê pirsgirêke bisekinin.

Rewşen: Hin nivîskar û zimanzañ ên Kurd dibêjin ku, divê nivîsandin û xwendin bi zaravê Kurmancî be, ji ber ku zaravê Kurmancî pirtir pêşve çûye û dewlementir e. Tu çawa difiki ri?

Ordixan: Ev dîtin ne rast e. Divê wêjeya (edebiyat) me bi her çar zaravân bimeş. Zaravayêñ ku qels mane divê em wan jî, xwirt û dewlemend bikin.

Rewşen: Wek ku tê zanîn Kurd, niha sê alfaban dixebeitînin. Ji bo Kurdi kijan alfabe çêtir e?

Ordixan: Niha Kurdêñ sovyetê bi alfaba Rusî, yêñ Îranê û yêñ Iraqê bi alfabe Erebî Kurdeñ Tirkîyê û yêñ Suriyeyê jî, bi alfaba latînî dînîvîsin. Li gorê dîtina min, alfaba Celadet Bedirxan ku bi tipêñ latînî hatiye amade kirin, dikare neteweya me bigihîne hev. Lî di vê lafabeyê de hin kîmanî hene. Divê em çend herfan wek ç,p,k,û t ya hişk lê zêde bikin.

Rewşen: Wêjê (edebiyat) û çanda Kurdi çawa dikare bi pêş keve?

Ordixan: Heke gelê Kurd azad û rizgar bibe, ji bindestiyê xelas bibe, dê çanda wî jî azad be û pêşve here. Çanda mîletê bindest nikare li pêşkeve û xwirt bibe.

Rewşen: Tekoşîna rizgariya neteweyî ya li Kurdistanâ bakur, bandereke (tesîr) çawa li ser çandê dihêle. Hûn di vê xalê (niqte) de ci dikarin bîbêjin?

Ordixan: Şoreşa li Kurdistanâ bakur wek rojê hil bû. Ev roj ne tenê li bakurê Kurdistanê, lî her wiha rona-hiya xwe da her çar perçeyêñ Kurdistanê. Ez vê şoresê, wek rojê dibînim. Gava roj dertê, gul û kulîk vedîbin û çûk distrêñ. Gava roj dertê, gundi û karker diçin karê xwe. Roj bi xwe re tav tîne, jiyan tîne. Roja me derketiye, tekosîn ji bo me roj e. Dema tekosîn hebe, bawerî jî heye. Gelê me, iro rabûye ser piyan, ji guleyêñ dij-min natirse, ji top û tankan natirse,

ev ji tesîreke mezin li ser çandê dihê-le. Têkoşin, iro çanda gelê Kurd e, dîtina wî ye, roniya çavê wî ye. Gava têkoşin tunebe, mirov kor e. Niha gelê me li Kurdistanâ bakur rabûye ser piyan. Serîhildana gelê me yê li Kurdistanâ bakur, di bin serokatiya Abdullah Ocalan de her diçe xurt di-be û pêşve diçe. Ev serîhildan, di dî-roka gelê Kurd de, tişteke nû ye. Rengê Kurdan êdî diguhêre. Di saya têkoşinê de, niha çanda Kurdi jî, zi-manê Kurdi jî, li pêş dikeve.

Rewşen: Serokê Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK) Abdullah Ocalan, di hevpeyîneke xwe de dibêje ku têkoşina gel li pêş neke-ve, ne zimanê wî û ne ji çanda wî li pêş dikeve, iro li ser ziman û çanda Kurdi lêkolîn û lêgerîn tê kirin. Lê hin mirov dibêjin ku çand û ziman bi têkoşina rizgariya neteweyî ve ne gi-redayî ne. Hûn vê dîtinê çawa dibî-nin?

Ordixan: Serokên tekoşerê, iro dîtinê xwe bi Tirkî dinivîsin, gelek pirtûk bi Tirkî çap dibin. Ev ji mecburiyetê tê. Serokên serîhildanê, dix-wazin ku bîr û baweriya xwe, dîtinê xwe bigihînin gel. Bi kîjan zimanî dikarin vi karî bikin, divê bi wî zimanî bikin. Ev tişteke tabii yê. Lî em dibî-nin ku hêdî hêdî rewş tê guhertin. Se-rokên serîhildanê, baş dîkin ku bi Tirkî dinivîsin. Divê Tirk ji bizanî ka em ji bo ci ser dîkin, daxwaza me ci ye. Divê dijmin bizane ka em ci dixwazin.

Divê mirov teng nefikire. Heke têkoşina iro nebûya, iro em nedibûn xwediyê tu tiştekî. Wê xwendegehê me ji çêbin. Ez bawer im ku di pêş-erojê de, dê kovarê me, rojnameyê me, pirtûkê me bi zimanê Kurdi bêن çapkîrin. Lî ji vê re ji, wext lazime.

Rewşen: Li gora dîtina we ji aliye çand (kultur) û wêjeyî (edebî) ve kî-jan perçê zêde pêşketî ye?

Ordixan: Li Kurdistanâ başûr zê-detir pêşketî ye. Lî ez dixwazim ku edebiyata me li her çar perçeyê Kurdistanê bi hev re bimeşe.

Rewşen: Şerê rizgariya neteweyî ya di bin pêşengîya Partiya Karker ê

Kurdistanê de her diçe berfirehtir û xurtir dibe. Di navbera serîhildanê neteweyî yên kevin û têkoşina iro de hûn ci cidahî (ferq) dibînin?

Ordixan: Serîhildana bakur, serî-hildaneke nû ye. Kurdên bakur, ji şasî û çewtiyên serîhildanê kevin, gelek ders girtine. Ez bawer im û hêvi dikim ku ev serîhildan, dê bi ser ke-ve. Gelê Kurd ku hejmara wî iro di-gihê 30 milyonan, êdî nikare bindest bijî. Iro 150 dewlet endamên UNO (Yekîtiya Neteweyan -YN) yê ne. Hin dewlet hene ku nifusa wan 160 hezar e. Çima neteweyek bi 30 milyon-nî nikaribe bibe dewlet? Mafê Kur-dan jî heye ku li ser axa xwe bexter-er, azad, serfiraz û serbixwe bin. Di navbera vê serîhildanê û yên ke-vin de gelek ferqên mezin hene.

Rewşen: Bandêra (etki) şoreşa Kurdistanê ya ku di bin serokatiya PKKê de didome li ser Kurdên Qaf-qasyayê ci ye?

Ordixan: Kurdên Ermenistanê tev, bi vê şoreş hesiyane. Her Kur-dek PKK ê dinase. Şoreşa bakur, ji bo me bûye hêviyeke mezin. Kurdên me ji Serok Apo razî ne û jê hez dîkin. Di her malê de stranê şoreşê tê gotin. Kurdên Qafqasyayê, niha li pênc Komaran (Cumhuriyet) dijîn. Dijminatî li hember Kurdan tune, lê "şam şekir e, welat şîrîntir e."

Rewşen: Kurdên Qafqasyayê, bi taybetî ji yên Ermenistanê zêdetir li ser çandê dîrokê, folklorê, muzikê û hwd. xebitîne. Anku bi siyasetê re mi-jûl nebûne, dozeke siyasi çênekirine. Gelo sedemên vê ci ne? Niha rewş çawa ye?

Ordixan: Rast e. Kurdên Qafqasyayê heta niha karêni siyasi nekirine. Lewra berê yek partiyek hebû, parti-ya komunist. Karêni politîk qedexe bûn. Ji derveyî politîka partiyê, politî-ka tunebû. Niha ji li Qafqasyayê, Kurd nikarin karê politîk bikin. Ev şansê me tune. Guhêni me zêdetir li ser deng û behsêni welêt e. Ez dikar-im bibêjim ku hema hema gel tev alîgir û dilsozê PKK ê ye. Ji ber ku PKK xwestina gel bi cih tîne. Her-kes xwe endamê ERNK ê dihesibîne.

Her Kurdekk PKKê dinase.

*Şoreşa bakur, ji bo me
bûye hêviyeke mezin.*

*Kurdên me ji Serok Apo razî
ne û jê hez dîkin.*

*Di her malê de
stranê şoreşê tê gotin.*

Dijminatî li hember Kurdan tune...

Rewşen: Hingî em pê dizanîn, hûn çend sal berê çûbûn Akademiya Mahsum Korkmaz. Ji wê demê ve ci guhertin çêbûne? Hûn rewşê çawa di-bînin?

Ordixan: Di van 2-3 salan de Par-tî û şorêş xurtir bûye. Di van salan-de, gelek pêşveçûn çêbûn. Gel êdî zaftir li doza xwe xwedî derdikeve. Li Kurdistanê mirin û kuştina ji bo welêt êdî bûye kareke bi şeref. Ev ji diyar dike ku dê Kurd bi ser kevin.

Rewşen: Hûn derheqê qetliamên dawî yên li Kurdistanê ci difikirin? Li dijî van qetliaman Kurdên derive ci dikarin bikin?

Ordixan: Dewleta Tirkîye ber bi dawiyê ve diçe. Em van qetliaman ji tv, radyo û rojnameyan dibihîzin. Kurdên derive divê van qetliaman, protesto bikin. Divê em rûyê dewleta Tirk ê hov û bixwîn eşkere bikin, bi dinyayê bidin nasîn.

Rewşen: Ji lêkolînvan û lêgerîn-vanê Kurd ên nû re hûn ci dixwazin bêjîn? Ji cerbê (tecrûbe) we çawa dikarin istifade bikin?

Ordixan: Her Kurdekk divê bi dî-roka xwe baş bizane. Her bosteke axa me, bi xwîna bav û kalêni me hati-ye avdan. Divê ev tu car neyê ji bîr kirin. Berî her tişti divê zimên û çand bê parastin. Xortêni me yên nû gelek jêhatî û dilsoz in. Ez bawer im dê bi ser kevin.

Rewşen: Di dawiyê de ji bo xwen-devanê me, tişteke ku hûn dixwazin bêjîn heye?

Ordixan: Daxwaziya min ev e: Yekbûn û biratî. Xwezi bi we ku hûn Kurdistanâ serbixwê dê bibînin. Ez hevîdar im ku ez ji bibînim.

Rewşen: Zor spas.

Ordixan: Ez ji spasdarê we me.

XWÎN Û HÊSTIRÊ ÇAVAN

Lokman POLAT

Redaktorê rojnameyê, ji keçika sekreter re got:

— Wan nîvîs û nûçeyên ku li ser bûyerên Kurdistanê ne, bîne, ez lê binêrim.

Navê berdesta (sekreter) redaktor Maria bû. Keçikeke porzer, çavşîn û bejinzirav bû. Karê xwe bi hostatî dikir. Wê, nûçeyên ku di kovar û rojnameyên cûr be cûr de derçûbûn, hemûyan bi meqesê jê kiribû û hilanî bû.

Li ser daxwaza şefredaktor, Maria çû hemû nivîsaran anî, danî ser masa şef. Lê xişûsek ket dilê Maria yê. Ji xwe re fikirî û di hundirê xwe de got:

— Dê şef miheqeq rojnamevanekî bişîne Kurdistanê.

Maria, hemû rojnamevanan, ên ku di wê rojnameyê de kar dikirin, dinasî û wek birayê xwe, ji wan hes dikir. Lê di nav wan rojnamevanan de, ji Hans pir zêde hes dikir. Maria, rewşa Tirkiyê û Kurdistanê dizanibû, ji bo wê yekê jî, nedixwest hevalên wê biçin ew derê. Lewra Maria, bi xwe hovîtiya (barbariya) polis û leşkerên Tirkan dizanibû û wê bi çavêن xwe dîtibû ku polis û leşker bi ci tewirî li meşvanan, li gel dixistin, li wan zilm û zordestiyekê nedîti dikirin. Maria, tenê yek carek çûbû Tirkiyê, lê, wê sond xwaribû ku hew biçe.

Şefredaktorê rojnamê, telefon ji Hans re kir, got, ‘were vira, em hinék baxifin.’ Di navberê de demeke kin derbas bû, Hans hat, li ba şef rûnişt. Şefredaktor jê re got:

— Li Kurdistanâ Tirkiyê, rewş xirab e. Kovar û rojnameyên cûrbecûr, di nûçeyên xwe de, dinivîsin ku gelê Kurd, di cejna Newrozê de, dê serhil daneke mezin çêkin. Leşker û polîsên Tirk jî, haziriya xwe dikin ku vê serhildanê bipelçiqînin. Dê xwîn pir bê rêtin. Ez dibêjim qey leşkerên Tirk, dê qetliam (jenosîd) ên mezin bikin. Gelê Kurd, di nav xwînê de dê bihêlin. Ji vê rewşa hanê re, tu ci dibêjî?

Hans bersîva wî da û weha got:

— Belê, rast e. Vê carê dixwazin ku gelê Kurd qîrbikin. Jin, mîr kal (pîr) zarok, kî bikeve ber wan, dê bîkujin. Dixwazin Helepçeve nû çêbîkin. Gelê Kurd, dê careke din, pir xwîn û hêstirê çavan birjîne. Welê di xuyê ku kolonyalistên Tirk, dê Kurdistanâ bikin bêrma xwînê.

— Welê ye. Li gor ku rojnamen Fransiz û Ingiliz dinivîsin, serekomarê Tirkiyê dibêje ku li biharê dê li dijî cudaxwazan operasyonên leşkerî dest pê bike û dê şerekî giran çêbe. Divê em li ser van bûyerên ku çê bibin, pir bisekinin.

— Divê mirov li ser bisekine. Lê rojnamegeriya Swêdî, bi qasê yên Ingiliz, lman û Fransizan li ser bûyerên Kurdistanê nasekinin. Rojnama me bi xwe jî, hewqas ji Kurdistanê nûçê naweşîne. Di Kurdistanê de her roj bi dehan kesên Kurd bi destên leşker, polis kontr-gerilla têñ kuştin. Lê ji bo rojnameyên Swêdê ev tişt qet nabin nûçê. Li Swêd, xwîn jî poza yekê bê, em wî dikin manşet û di rûpela pêşin de (yekemîn) didin!

— Tu rast dibêjî, divê içar bi girin-gî li ser pirsa Kurd bê rawestin. Ji bo vê yekê, divê em yek an du rojnamevanen xwe bişînin Kurdistanê.

— Pir baş dibe. Ji rojnama me du rojnamevan biçin, baştır e.

— Vaye çend car e ku tu diçî Tirkiyê û Kurdistanê. Ji xwe tu dostekî gelê Kurd ê naskirî yî. Gava par tu çuyî Kurdistanâ İraqê, te nûçeyên baş ji me ra şand û te resmîn gelek baş kişand. Ez dixwazim ku dîsa tu biçî. Tu kîjan rojnamevanê me bixwazî, karî bi xwe re bibî.

Hans li Mariyê mîze kir, di bin lîvan de keniya û ji şef re got:

— Ku Maria dest ji rojnamevaniyê bernedabiwa, min dê wê bibra. Lê ew niha sekreterî dike û ji xeynê wê, ez naxwazim tu keseke din bi xwe re bibim.

Maria, heta wê gavê bê deng guhdariya Hans û şefê xwe dikir. Li ser vê gotina Hans, wê got:

-Min dixwest ku ez bi te re bihata, lê ez naxwazim bêm Tirkîyê. Ez careke din jî, naxwazim ku eskerên Tirkan ên hov û xwînxwar û polisê çavşor bibînim. Li kêmâniya min (Qusur) nenêre. Ez bawer dikim ku tu min fam dikî.

Hans jî Mariyê re got:

-Spas, ji te re û ji van gotinêne yên vekirî re. Bi rastî jî wisa ye. Min lêkolînekê li ser dîroka Kurdan a ji 1900 û vir de çêkiribû. Ji 1920 û ta iro ev çend car in ku Tirk, li Kurdistanê qetşiam çêdikin û bi deh hezaran Kurd dikujin.

Hans rabû ser lingan û ji şef re got:

-Divê ez biçim haziriya xwe bikim ku sibê bi rê kevim.

Hans û Maria, bi hev re, ji odê derketin der, Maria, kelegirîni bûbû, ji Hans re got: 'li xwe baş binêre, haya te ji te hebel!' Paşa hev maç kirin, ji hev xatir xwestin û Hans lê xist çû.

Hans bilêta xwe ya balafirê (teyare) sitend. Sibehê Haps li teyarê siwar bû û çû Stenbol, ew

gîrker a Tirk, haziriya perçiqandina serihildana gel dikir. Gelê Kurd, birîndar bû, lê bi bawer bû. Ji aliyeke ve jî, haziriya pîrozkirina cejna Newrozê dikir.

Hans, li otobusê siwar bû û berê xwe da Cizîra Botan. Di rê de, cemseyên eskerî, ber bi herêma Botan ve diçûn. Li Mêrdînê, Qiziltepê tijî eskerên Tirk bûn. Otobusa ku Hans tê de bû, hat gîhişt Cizîrê; Hans ji otobusê peya bû. Li der-dora Cizîrê tank û topan rês kiribûn. Li nav bajêr cemseyên eskerî û panzerên polisan wek seyên har diçûn û dihatin. Timêx xususî (kontra) yên xwînxwar sikakan tev girtibûn. Bi her awayî dixuya ku ordiya Tirk, haziriya şerekî giran û qetliameke mezin dikir.

Hans ji otobusê peya bû, çû otêlê, ji xwe re cih girt, û paşê derket ku di nav gel de bigere. Hêj ji cejna

rê, bi girseyî dest bi pîroziya Newrozê kir. Herkes cilêne xwe yên neteweyî li xwe kiribû. Keç û jînên Kurd, fistanêne xwe yên rengîn wergirtibûn. Dîlanê jî dest pê kiribû. Ne tenê di Cizîrê de, li hemû derêne Kurdistanê, li bajaran, qezan, gundan û li serê çiyayêne Kurdistanê, agirê azadiyê pêxistî bû. Gelê Kurd, li dijî zilm û zore rabûbû piyan.

Hans ketibû nav gel, wêne (resim) dikişand, piştre ew jî ket nav govendê. Wek wan nizanibû govendê bigre, lê dîsa bi wan re diçû û dihat. Heta nîvê şevê Hans di nav gel de ma. Piştre çû hotêlê; tiştên ku dîtbû, nivîsand. Pir rehet bûbû. Çend saet raza, sibehê zû rabû ji otelê derket, berê xwe da nav gel.

Roja 21'ê Adarê, gelê Cizîrê, bi girseyî di çend hêlan de meşîya û ber bi goristana şêhidan ve çû. Bi hezarin

mirov ber bi aliye goristanê ve dimeşîya. Leşker û polisan, çarmedorê wan girtibûn. Dema gel gîhişt qebristanê; dujminê xwînxwar, berên çek û silahên xwe dan meşvanan û li wan gule barandin. Bû teqe-reqa sîlehan. Ji her alî ve gule dibariyan li ser gelê Kurd. Bi dehan mirov hatibûn kuştin û bi sedî birîndar bûbûn.

Hans jî, li ser go-



şev li wir ma û roja din jî wir çû Amedê (Diyarbekir).

Hans rojek jî, li Diyarbekir ma. Li wê derê çend rojnamevanêni biyani yên din, ku ji berê de hev û dû nas dikirin dîtin. Wan bîryara xwe da ku ji wir biçia Cizîra Botan.

Diyarbekir, bajarekî birîndar bû. Ji dijîmîn gelek zilm û zordestî dîtbû. Di meşa cinaza Vedat Aydin de, bi dehan kes hatibûn kuştin, û bi sedî kes birîndar bûbûn. Li her der tank, top û panzer hebûn. Ordîya da-

Newrozê re rojek mabû. Lî gelê Kurd, dest bi pîrozkirina cejna Newrozê kiribû jî. Li Cizîrê dikan tev girtî bûn. Di nav bajêr de, zirne lê diket û gel govendê digitin. Keç û xort bi desten hev girtibûn direqisyan, berê demance û keleşkofan didan hewa, gule titeqandin û şahîye ges dikirin.

Şahî û pîrozbaşıya Newrozê, bi şev jî berdewam bû. Heta 21'ê Adarê, di nav gel û leşkerên Tirk de, ne şer ne jî teqandinek derneket. Di roja 21'ê Adarê de, gelê Kurd ê Cizî-

ristanê, di nav gel de bû. Carna xwe davêt vî alî û wî alî; xwe ji ber gulan diparast. Hans rabû û ber bi taxa Cuđî ve bazda. Gava dibeyî, didît ku li ser rîjin, zarok û mîr li erdê dirêj bûne, hatine kuştin an birîndar in. Zarokeki piçûk li kîleka rê, li erdê bi deverû dirêj bûbû. Hans, ber bi wî ve çû ku hilgire û bi xwe re bibe. Hans gava wî bi serpiş qeliband, çi bibîne, mêze kir ku zarok di nav bêrma xwînê de ye. Hemû gule li dev/u singê wî ketinê û şehîd bûye. Hans,

wî di cî de hişt, hêstirêن çavê xwe paqîj kir û dîsa bazda. Hans gihîst ber taxa Cudiyê. Lê neçû nav taxê. Leşkerên Tirkan, bi tank û topan gule davêtin wê mehlê, roketan davêtin xaniyan û xirab dikirin. Leşker û polîs, bi barbarî kevir li ser kevirê nedîhiştin.

Hans vê carê, berê xwe da otêlê û bi wî alî ve bazda. Ji kuçeyekê (sikak) derbas bû, lê di kuça din de po-

zanibûn. Wisa li Hans xistibûn ku êdî nikaribû rabe ser piyan. Hans, hindik mabû ku biteyişa. Hew dît dengê teqîna gulan ji nêzîk ve hat. Mîlitânên azadixwaz berê gulan dabûn xaniyên polîsan. Ji bo vê yekê, polîsan dev ji Hans berdan û bazdan aliye derve. Tu kes li ba Hans nemabû. Hans hinekbihna xwe berda û ji azadixwazan re spas kir ku ew ji işkencê xilas kirin.



lis û tûmêñ taybetî ew girtin. Wî avêtin erdê û ketin ser û lê xistin. Dev û pozê wî tijî xwîn bû. Hans di emrê (tewan) xwe de, lêdanekê weha nexwaribû. Hans, li erdê bû û her derê wî dêşa, nikaribû xwe tevbida. Du mirov Hans girtin û birin, avêtin cemsa eskeriyê. Cemse bi rê ket. Ew avêtin nezaratxaneyê. Li vir polîs û tîm hebûn.

Polîsan, dest bi lêdanê û işkencê kirin. Li Hans dixistin, digotin "Tu kî yî? Çira bi Tirkî an Kurdi naxîf?" Lê ci dikirin, Hans xeber nedida, ji ber ku ji xwe ne bi Tirkî ne ji bi Kurdi nizanibû. Lê polîsan, jê bawer nedikirin ku ew Tirkî û Kurdi nizane. Ji bo vê yekê, işkencê lê zêde dikirin; wan digot qey ew mîlitân e, an qadroyeke hêja û azadixwaz e. Loma xeber na-de. Carna Hans bi wan re bi zimanê Îngîlîzî daxifiya, lê polîs bi Îngîlîzî ni-

Piştî nîv saeti, polîs dîsa hatin ba Hans û lê xistin. Piştî lêdanê, wî hilgirtin, birin panzerê û ew birin avêtin ciyekî din. Deriyê odê vekirin û wî avêtin hundir. Di hundir de, gelek mirov li erdê, di nav gola xwînê de bûn. Hewar û qîrîn dikirin, dinaliyan, polîsan xetayekî mezin kiribûn ku Hans avêtibûn nava wan' insanen birîndar. Hans zilm, wahset û barbâriya Tirkêñ dagîrker, bi çavêñ xwe dîtibûn.

Hans ji xwe re, di hundirê xwe de weha fikirî: "Min vê bûyera hovîtiyê bi çavêñ xwe dît, divê ez vê bûyerê ji raya giştî ya cîhanê re qal bikim. Ev ci hovîti ye (barbarî ye) ku Tirk li ser gelê Kurd dikan. Pariyeke insanîyetê ji, di van leşker û polîsen Tirkan de nemaye."

Piştî demeke kin Hans, ji nava wan birîndaran (ku piraniya wan za-

rok û jînêñ Kurd bûn) derxistin û birin oideke din. Hans mîze kir ku hinek polîs, leşker û hinek ji, cilê (lîbasê) gerilan li wan e, wê derê rûniştine. Hans ji xwe re got: "Cilê gerilan li hinek leşker û polîsan dikan û wan dixin nav gel û provakasyonan çedîkin."

Hans bi çaveke kîndar li wan mîze kir. Polîs dîsa hatin ba Hans û bi kulman lê xistin. Gotin, "tu çîra xeber nadî?" Paşî dev ji Hans berdan û çûn derve, Ji dev û poza Hans xwîn dihat. Hans di nav xwînê de bû. Polîsekî, Hans ji erdê rakir, da rûniştin û li bêrika Hans nêrî.

Polîs, di cêba Hans de, resma Marîayê dît û derxist. Hinek lê mîzekir. Maria dimaniya Hulya Avşar. Polîs rabû ser lingêñ xwe û resmî nîşanî hevalêñ xwe da û ji wan re got:

- Ev mirov dibêje ku ez ne bi Tirkî û ne ji bi Kurdi dizanîm, lê ci işe resma Hulya Avşarê pê re heye?

Hevalêñ wî rind li resmî mîze kirin û gotin:

- Erê, dirûvî Hulya Avşar pê dikeve, wek wê rind e, lê ev ne Hulya Avşar e.

Polîs demeke dirêj bi resmî re mijûl bûn, dev ji lêxistina Hans berdabûn. Di saya resma Marîayê de Hans çend deqîqe ji lêdanê xilas bûbû. Ji ber işkencê Hans hemû tiştan ji bîr kiribû. Hans ketibû derdê êşa xwe. Hans di hundirê xwe de spas dikir ku resma Maria ew çend deqîqe ji ber lêdanê xilas kiribû.

Hans dîsa di hundirê xwe de, ji xwe re digot: "Pêşî Kurdan, paşî ji Maria ji bo demeke kin be ji, min ji lêdanê xilas kirin, ez ji herdiwan ji hez dikim."

Polîs dîtin ku li pişt resmî nivîsek heye, lê ew nizanîn bixwînin. Polîs bawer kirin ku ev zilam xerîb e. Di navberê de demek derbas bû. Hans hew dît ku jîneke polîs li ber serê wî sekinîye. Polîs bi Îngîlîzî ji Hans pirs kir:

- Navê te ci ye?

Wî bersîv da got:

- Navê min Hans Anderson e.
Hans pariye kêtfxwes bû. Keçika polis got:
- Tu çi kes i, ji kû derê yi, li vir çi digeri?

Hans got:
- Ez ji Swêdê me û ez rojnamevan im.

Hans gava weha got, lingê polis lerizî, zivirî çû ba hevalên xwe. Bi wan re bi Tirkî peyivî û hema zû bi zû hatin Hans ji erdê rakirin, birin li ser qoltixê dan rûniştandin. Îspîrto û pembû anîn ser û çavên wî ji xwînê paqîj kirin. Jê re çay û qehwe anîn danîn ber. Cixarê pê xistin kirin nêv lîva wî. Polisa jin li ber rûnişt û bi Îngilîzî pê re axifiya got:

- Kêmasiya me nenêre, polisan te nas nekirine û nizanibûne ku tu rojnamevan i. Ger zanibûna, qet li te nedixistin û ji xwe te nedigirtin û netanîn vir. Lê şâsiyek bûye, wan gotiye qey tu militan, an qadroyekî cudadxwazan i, loma hewqas li te xistin.

Hans jê re got:
- Ez we qet nabexşinim (efu nakan). Hûn ji însaniyetê derketine. Ev çi ye hûn tînin serê gelê Kurd ê feqîr û belengaz. Ev zilm û zordariya ku hûn li Kurdan dikin, li dinyayê, li tu derî nayê kirin. Bi rastî, em Ewrupî bê sedem ji we Tirkan re nabêjin barbar. Hûn layiqê vê sifatê ne!

Hans û polisa jin dûr û dirêj bi hev re axîfîn û mineqeşe kirin. Lê polis nikaribû bi Hans re serî derxe. Hans ji wan re digot:

- Hûn pir şoven û nijadperest in. Poliseki digot:

- Kurdan Olaf Palme kuş, tu çira wan diparêzî?

Hans:
- Na, Kurdan ew nekuş. Em dizanin kî ew kuş.

Polisa Jin:
- Kurd hemû terorîst in. Terorîstên har ji li Cizirê û Şîrnexê ne.

Hans:
- Têkoşîna rizgariya netewîne terorîzm e. Kurd ji, ne terorîst in. Ew azadîxwaz in.

Piştî mineqeşe polisa jin çû der-

ve, bi xwe re du polisên din anî, ji wan re got:

- Vî bibin merkezê (ciyê navendî yê polisan), bila li wê derê ifada wî bigrin.

Herdû polisan Hans birin, siwarê otobusekî kirin ku tê de jin, kal û zarokên piçûk hebûn. Hemû ji, di nav xwînê de bûn. Libasên wan lewîtibûn. Otobus bi rê ket, di ser pirê de derbas bû û çû li ber xaniyê navenda polisan sêkinî. Esker û polis bi kîn û nefret li Kurdan mîze dikirin.

Hans ji anîn xwarê û birin hundir, ba komîser. Polisek ku bi zimanê Îngilîzî zanibû, ifada Hans girt û nîvisand. Paşî Hans teslîmê du polisan kir. Ji wan re got, "wî bibin berdin!"

Hans kirin hundirê panzerê û birin di nav Cizirê de ew berdan. Gava ku Hans li dorê xwe nêrî, li sukê kes tunebû. Ji lewre, derketina sikakê qedexe bû. Kurd hemû li ber pencerên xwe, li derive mîzedikirin. Gava Hans dîtin, hemûyan cepikan lêxistin, kirin tilîlî.

Hans ji cepikan lêxist û bi herdu tiliyên xwe "V" yanê nîşana serketinê çêkir û ber bi otelê ve çû. Hans û çend kes ji İHD (Komela Mafêni Mirovi) bi hev re li otobusê siwar bûn û ji Cizirê derketin. Di rê de çend car ew sekinandin. Polis û leşkerên komando çîrê wan kirin gotin:

- Mesulê (berpirsiyarê) vê tişti hemû hûn birêvebirên İHD û rojnamevan in. Ger hûn nehatana vir, me dê vê problemê bi zû û hesanî çareser bikira.

Hans û birêvebirên İHD bi zor gihiştin Diyarbekirê. Hans sibehê li tiyarê siwar bû çû Stenbolê. Li wê derê daxuyaniyeke çapemenî "press konferans" çêkir. Tişte ku dîtibû û di serî de derbas bûbû hemû qal kir, serpêhatiya xwe ji wan re got. Nûnêrên kovar û rojnameyên pêşverû bi Hans re hevpeyîn çêkirin. Hans, li Stenbolê piştî ku karê xwe qedand, berê xwe da Stockholmê, çû Swedê.

Elo û Şetan

Besir BOTANI

Mirovek hebû, digotinê Elo. Ew dostê şetanan bû. Carekê wî gote wan.

- Werin em dê genimî bi hevre biçînin!

Şetan:

- Baş e! De em biçînin.

Wan genim çandin û dema genim giha û çêbû, Eloyî gote şetanan:

- Gelî şetanan! We serê genimî, yan binê genimî divê?

Şetan:

- Me binê genimî divê.

Elo genimê xwe yê taze dirû û bire êş. Şetanan zemîn (erd) hemû kolan. Hindî dikolan, her rihîn genimî derdiketin. Şetanan ax li serê xwe werkîn û gotin:

- Xwelî li serê me! Eloyî em xapandin û fêleka wisan li me kir ku hêj kesî ew fêl (hîle) li me nekikiye. Piştî demekê, Eloyî gote şetanan:

- Werin em dê pîvazan di gel hev biçînin.

Şetan:

- Va em hatin, va em hatin.

Wan pîvaz çandin, çandin û...

Şetan:

- Elo vê carê tu nikarî fêla xwe li me biki.

Piştî ku pîvaz giha û çêbû, Elo:

- Gelî şetanan! We belgên (pêlîn) pîvazan, yan binê wan divê?

Şetan:

- Me pelên pîvazan divê.

Şetanan, belgên pîvazan hemû dirûn û Elo ji, binê pîvazan hemû anî der û ji xwe re embar kir. Lê belgên şetanan hemû rizîn û Eloyî careke dî (din) fêla xwe li şetanan kir... Elo:

- Kes ne şete (nikare) bi min! Ez ji şetanan şetantir im! Ha ha...

Şetan:

- Mala te wêran be Elo!

Elo:

- Ha ha ha...

zimzamzniamzniamnzianzimn~~ziman~~^{izmann}zianmzniamznamzina_

RÊZKIRINA ZIMANÊN ÎRANÎ-ARÎ YÊN ROJAVA

Prof. Pierre LECOQ
Wergêr : Mamo CUMî

Ji sed salî zêdetir e ku, em dizanî zimanê û zimanê Hînd-Arî nêzîki hev in. Em dikarin bibêjin ku pêşî zimanekî Hînd-Îranî, an ji Arî hebû. Ew ziman jî, ji zimanê Hînd Ewrûpî yê pir kevin hatiye. Ev ziman, di nav şaxên zimanî, ên Rojhilat de, yê herî girîng e. Zimanê Îranî, ji yê Hînd-Arî, ji gelek alî ve cu-da dibe. Wek "s" di Hînd-Arî de maye, lê ev deng di Îranî de bûye "H". Ji belgeyêr herî kevintirîn, em têdi-gihênu bi kêmanî du zaravayêna bas û ji hev cuda, ji zimanê Îranî derketîne: Parisiya kevin û Avistî. Dirêjahiya demê û belavbûna gelên Îranî-xêv, hîst ku bêtir zû perçebûn çêbi-be. Iro, şaxên zimanê Îranî, li ser

herêmeke pir fireh belav bûne. Ev ji rojhilate Anatoliya û Kokazê dest pê dike heta Çinê dirêj dibe. Bi gotine-ke din, iro ev ziman, ji sînorêne Îranê yên siyasi derbas dibe. Li gorî pêşni-yareke Gilbert LAZAR ku pirî caran li ser hatiye deng kirin, "pir rast e ku em ji van komên ziman re bibêjin 'Îranî = Arî'". Tevî ku ev herdu gotin ji kokekê ne. Gotina Îran (Eran), ji "Aryan" hatiye. (Li gorî Pierre LECOQ, navê "Alan" di nav Kurdan de jî, ne dûrê rastiyê ye ku dîsa ji vê gotinê hatibe. Camêr, dîsa dibêje ku hinêk bawer dîkin ku ew peyv, Samiyan (Sêmitan) ji Ariyan re gotine. Hemberê (pêşberê) wê peyvê di Ere-bî û Hebrî de "Hurî ye").

Zimanê Îranî-Arî yên nû, paraveyî dû koman dibin: Koma Rojava û ya Rojhilat. Em di vekolana xwe de, li ser Koma Rojhilat nasekinin. Diyar e, pêkhatina Koma Rojhilat ne ji mêj de ye, durûvê wan ê herî nas ev e: konsonê dengdar (sonore, voiced) li serê gotinan û bi alikariya he-nasê (hilm, bayê dev) derdikevin. Li gorî xebatê Hubschmann, belgeyêr Îraniya Navîn, li Asya Navendî hatîne dîtin. Du komik di koma Rojava de ji hev derdikevin. Yek, grûpa Parisî, tevî Farisî û zaravayêna wî yên cu-da. Dudu, gelek zarava tê de bi cih dibin. Yên li Rojava ev in:

1- Dimîf-Zazakî, li jorî Ferêt

(çemê Ferêt) tê axaftin,

2- Kurmancî, zaravayê bakur Soranî, Mukrî yê navîn û yê başûr

3- Goranî û devokên wî: Hewramî li rojavayê Kermansahê, Bacelani li bakur-rojavayê Mûsilî, hwd.

4- Talêşî, li peravêñ başûr-rojavayê Kaspînê, li Azerbaycana Sovêtî û li Iranê,

5- Azerî (nav Azerî ye, lê tu girêdan bi Azeriya Tirkî ve nîne, MC) bi gelek zaravayêñ xwe ve; li bakur-rojava (Herzendî-Kerîganî), li bakur-rojhilat (Xekalî û Tarom) Şehrûdî, Şalî, Kecelî, hwd.) û zaravayê başûr, li navça Qezwînê (Takîstanî, Ebrahîmabadî, Eştehardî, hwd.),

6- Gilakî, li peravêñ başûr-rojavayê Kaspînê, li Iranê,

7- Mazenderanî, li başûr-rojhilatê Kaspînê,

8- Semnanî, zaravayê bajarê Semnanê,

9- Sorxî û çend zaravayêñ din, li başûrê Semnanê,

10- Sengiserî, li bakurê Semnanê,

11- Zaravayêñ Navendî (ZN), li gelek navçeyan fireh tê deng kirin, navenda wê Esfahan e. Li bakur-rojava Mehelatî, Vonîşunî, Xunsarı, hwd., li bakur-rojhilat Kaşanî, Ebûzeydabadi, Qohrûdî, Ebyanî, Ferîzen-dî, Netenzi, Kêşî, Tarî, Erdistanî, hwd., li başûr-rojava Gezî Zefri, Verzinî, hwd., li başûr - rojhilat Yezdî, Kermanî, Nayînî, Enarekî, hwd.,

12- Sivendî, li bakurê Şirazê,

13- Zaravayêñ Kevir: Xuri, Fervî, hwd.,

14- Beloçî bi gelek zaravayêñ xwe ve li başûr-rojhilate Êرانê û li Pakistanê.

15- Ormuri, li geliyê Logarê (Efganistan) û li Kaniguramê,

16- Peraçî, li gelek gundêñ bakurê Kabûlê bi vî zaravayî dîpeyîvin.

Cudabûna mezin ku em dikarin di dengnasi û peysaziya van şanzde zaravan an şaxêna zaravan de bibînin, dîhêle em biramîn (bifikirin) ku çenabe ji wan zaravan tevan re yekitiyeke zimanasi hebe. Bê guman, hia durûvên xwe yêş gelempers hene ku digi-

hêne hev, lê ew ji bi awakî negatîv in. Ji bo nimûne, tipa ('g / 'gh) di tevan de 'z' derdikeye, wekî din, di Farisî de 'd' derdikeye. Ji xwe di vir de û di gelek xalêñ din de, komika Fari-sî, ji hemû zaravayêñ Iranî-Arî yêñ din cuda dibe, bêyi ku yekitiya grûpe-kî bakur-rojava ewqasî li meydanê hebe. Li aliye din ji, çenabe ku ev şanzde zarava tev ji zaravine kevin ên serbixwe hatibin. Heger em li gorî hejmar û rengê metoda "isoglosses" herin, em dikarin bibêjin ku ji van zaravayêñ nû re wê sê-çar zimanê mak hebin. Em dê disa şaş bibin, heger em bawer bikin ku em bi ronakî dikarin ji her zaravekî re, ga-vêñ guhertinêñ wî ya roja iro diyar bikin. Li gorî prensibê zaravnasiyê, nûbûn ji zaravayekî digihêje zaravayê cînar; wiha girêdanêñ bi koka zaravayê paşin re têye winda kirin. Zaravayêñ ku ev prensînb li wan dikeve, pir in. Ji xwe ev rewşa hanê bi cîguhastina berdewam a hiñ neteweyan gelemeşeyê zêdetir kir: koçeri, li Iranê ade-teke pir kevin e. Eşkere ye ku gelek zaravayêñ nû, berê, cînarê zaravayêñ din bûn. Lê pir ji hev dûr bûn. Vêga, em dê bi carkî nikaribin bi ronakî hejmar û rengê zaravayêñ kevin ku yêñ jê çebûne, binasin. Wekî din, em dikarin hin grûpêñ xwedî durûv, nûbûn û kevinbûnen hevreng, ji hev ve-pincirînia (veqetînia). Tevî dudiliya me, ji hin xalêñ din ên ku em nizanîn wekheviya wan ji ku hatine.

Ji ber tengbûna cî, me hin kiri-nêñ pêşkêşkirî ji bo rezkirina zimanêna Iranî-Arî danîne aliyekei. Pirani-ya wan ji ber hebûna xebatêna ku ji hingê de hatine kirin, bê bingeh der-kekin.

Rêzkirina ku li jêr pêşkêş bûye, sê komikan dadigre. Ew ji, li gorî prensîba îstîmala kêmadar e:

1- Kermanî: Kurdî bi hemû zaravayêñ xwe yêñ navendî ve û Sivendî,

2- Mêdi-Kaspînî: zaravayêñ Azerî, Talêşî, Gilakî, Mazenderanî, Semnanî û Sorxî. Dibe ku şaxekî din yê Kaspînî hebe, weki din durûvên wî pir çetin e, werine bi ci kirin.

3- Hîrkanî tevê Sengiserî, Ormû-

rî, Peraçî, Beloçî, Zazakî û Goranî. Dibe ku Zazakî û Goranî di nav de komikeke serbixwe be.

Dîv were diyar kirin ku li vir armanca me tenê rêzkirina komên Zi-manêñ Iranî - Arî ye. Rêzkirina wan li gorî pivanekê erdnasiyê ye. Belki devera koka ku jê hatine bêtir nişan bide.

1- İranî 'a'

Di Zaravayêñ Navendî de, her tim 'a' li pêş 'm' û 'n' bûyê 'û' an 'o' û carina 'ö' ji. Di van hinek zaravayân de, mîna Kêşî û Ardistanî "mar" bûye "mûr"; di Yezdî de, "bala = bilind" bûye "bûlû". Dîroka vê guhartinê ne kevn e, ji ber ku ji grupa Ker-mânî ev di Kurdi û Sîvendî de çene-bûye. Ev fenomen, ber bi bakurê rojhilat ve dirêj bûye. Di Mazenderanî û Semnanî de (ne Gilakî) 'a' li pêş 'n, m' an li pêş 'p' ya kevin bûye 'û'. (Av) = (ape- bi İraniya kevin). Guhertineke wiha lê bi serê xwe li bakur-rojava çêbûye: Talêşî (vo), Herzendî (vör), Kerîganî (vû), Kurdi (ba), Farisî (bad). Hemû zaravayêñ Hîrkanî 'a' parastine. Dawî, em nizanîn cîma 'a' li rojava, li bakurê rojhilat, di Sorxî û Sengiserî de û heta di çend zaravayêñ navendî (Gezî, Yezdî) de bûye 'ê'.

2- İranî 'û'

Guhastina û, ü, i diyar e ku pêşî di zaravayêñ navendî de çêbûye. Di-vê ku ji mêj de be, cîma ku em di Sî-vendî de ji dibînin. Vêca, ev guhartin, di ser Kurdi re derbas bûye, ji bîlî zaravayêñ wî yêñ başûr ku nêzîki zaravayêñ navendî ne. Guhartina û, ü, i mîna a, û, ö çêbûye, lê jê firehtir bûye. Bi piyê bakur-rojhilat ve, em vê guhartinê di Semnanî de dibînin: "pîl", Kurdi 'zîv', Farisi 'pûl'; di Mazenderanî de dûr 'dûr', lê ne di Gilakî de; di Sorxî de "pûl" û tenê di zaravayekî Hîrkanî de, Peraçî 'dhi, dû', Farisi 'dûd'. Li dawiyê, zaravayêñ Azerî yêñ bakur-rojava, Talêşî jê der-xinî, ji zaravayêñ Azerî yêñ bakur-rojhilat û başûr Herzendî, Kerîganî: dû 'dû' vediqetin, ew bêtir mîna

xwe ya berê mane.

3- İranî 'dv'

Du guhartinê eşkere tê de hatine dîtin. Di ya pêşî de, tîpa lêvkî ketiye: *dver(a) der (Kurdî, Farisî, Beloçî). Di hemû zaravayê din de bûne 'ber'. Em dibînin ku di vê guhartinê de 'v' dibe 'b', berî ku tîpa diranî bîkeve, ji ber ku di van zaravan de 'v' li serê gotinan li ciyê xwe dimîne. Pir çetin e ku em van du guherdinan bi navê zaravan rawe bikin. Em dizanî ku ew di Avistî de hene, lê em nizanîn ku ew formeke zaravayî ye, an ew formeke demên cuda ne. Her wişa, ev guhartina du rengî pir kevin e û divê were xuyan ku Kurdî û Beloçî ji zaravayê komika xwe zû cihê bûne.

4- İranî 'ç'

Çar guhertin di vir de jê derketîne:

a- 'ç' di Beloçî de maye: roc, reuç 'roj'; Peraçî 'rûç';

b- 'ç' bûye 'c': Di Azeriya bakur-rojhilat û başûr de "rûc", Di Gîlakî, Mazenderanî û Zaravayê Navendî yên bakur-rojhilat û başûr-rojhilat de "roc, rûc";

c- 'ç' bûye 'j': di Kurdî û Zazakî de "rûj" (Kerînganî "rûj"), di Semnanî, Sorxî û Sengiserî de "rûj", di zaravayê navendî yên bakur-rojava û başûr-rojava de "rûj", di Ormûrî de "roj";

d- 'ç' bûye 's': di Sîvendî de "rûşa" 'roji', 'reş-' (rijandin), 'şî' 'bin'; Farisî bi "rûz" jê cuda dibe.

Xêza dutîşî 'j, c'

Talêşî	Gîlakî	Mazenderanî
Azerî	Azerî	
j >		>c
Zara. Nave.	Semnanî	Zara. Navendî

5- İranî 'c'

Du guhertin di vir de têne dîtin:

a- 'c' bûye 'j': Di Kurdî de "jin" cenî-, di Goranî û Talêşî de "jên", di Azerî de "jen" (carina "zen" weki Fa-

rîsî), di Sorxî, Sengiserî, zaravayê navendî yên başûr-rojava û Sîvendî de "jên" (lê carina "cen" jî!);

b- 'c' di Zazakî de mîna xwe maye "cenî", di Semnanî de "cenîka" (lê "zeniye" tê gotin!), di Beloçî de "cen", di Ormûrî û Peraçî de "cinq", di zaravayê navendî yên rojhilat de "cinq" (lê carina "jinc"!). Divê em Gîlakî, Mazenderanî û hinekî Azeriya başûr bidin aliyeke, ew mîna Farisî ne "zen" (gelo jê birine?). Li aliyeke din jî, "c" ji xwe bûye "y": Di Masûlî (zaravayekî Talêşî ye) de "yen", di Azeriya bakur-rojava de "yen" û di du zaravayê navendî de, Qohrûdî "yen" û Yezdi "yên".

Ev guhartin pir tevlihev e. Lê xêza dutîşî "j / c" bi gelempêri nişan di-de ku ew ji "ç" hatiye. Kurdî û Sîvendî, dîsa digihêjine zaravayê navendî yên rojava. Heçî komika Hîrkanî, guhartina li rojhilat lê tê, lê ev guhartina vê carê kevinbûn e (li "ç" ya Beloçî û Peraçî binêrin).

Talêşî	Gîlakî	Mazenderanî (Hîrkanî)	>c
j >			
Azerî	Semnanî		

Zara. Nav. Zara. Navendî

6- İranî 'm'

'm' di Kurdî de bûye "v"; ("nav", Kurmancî) û "w" ("nav, name'n", zaravayê navendî). Ev guhartin di Vefsî (zaravayekî Tefresî) de jî çêbûye. Bi gotineke din, ji Kurdî pir dûr e: "zawe" (Kurdî: zave, Farisî: damad), "nûwaz" (Kurdî: nimêj, Farisî: nemaz), hwd. Ev guhertineke rasthatî ye. Weki din Kurdî û Vefsî, pir ji hev dûr in. Lê ev ji têrê dike ku Kurdî ji zaravayê navendî cihê bibe.

7- İranî "thr"

("th" mîna tîpa gotina İngîzî "three" tê xwendin, MC.)

Guhartina van du tîpan di hin zaravayê (Talêşî, Gîlakî, Mazenderanî) de çetin e were nişan kirin. Li derêñ din, di van gotinan de hatiye xuyan: threye- 'sê' û puthre- (pis,

law). Em çar reng guhartin tê de dibînin:

a- "thr" bûye "hr": Zazakî "hîrê", Goranî "yerê" hyerê, Azeriya bakur-rojava, Herzendî "hêrê", Semnanî "hêrê",

b- "thr" bûye "r" (ji "hr" hatiye): hemî zaravayê navendî "pûr, pûr, pîr, por, Pör, hwd",

c- "thr" bûye "ş": Sengiserî "şê", "peşê" "bav", Ormûrî "şö", Peraçî "şî, puş",

d- "thr" bûye "s" Beloçî "pîss" (bav), "baras" (bra), "p'useg" (pis, law) (zaravayê bakur-rojhilat); nimûneyen di Kurdî de ne diyar in çawa çê bûne; di zaravayê Kevir de "pus, pos" hene, dibe ku ji Farisî dibînin. Em dikarin guhartinê ku di "thr" de bûye wiha nişanbidin:

	Kermanî	Mêđî-Kaspîni	Hîrkanî
thr >	Kurdî(?)		Beloçî
*şr>ş			
> s			Seng. Orm. Pera.
hr>r	Z. N.	Az., Sem. Sorxî.	Ze. Gor.

Di Kermanî de, cihêkirina Kurdî û zaravayê navendî ji hevdû ne ronî ne. Heçî di Mêđî-Kaspîni, de forma "hr" pir rûniştiye. Di komika Kirmâni de, Zazakî û Goranî ji hev dûr di kevin, lê zaravayê din, forma xwe ji forma "sr" girtine.

8- İranî 'v'

Goranî ji tevan kevintir e, tîpa dulêvkî "w-" parastiye: "wa" 'ba', Farisî "bad vate". Piraniya zaravayê din tîpa lêv-dirankî ya henasi (spirante) "v" parastiye: Talêşî "voe", Herzendî "vör", Mazenderanî "va", zaravayê navendî "vad, vay, voy, vûy, hwd." Piraniya zaravayê Kurdî "ba(d)" e, lê ev guhertina nû ye, ji ber ku zaravayê başûr forma kevintir parastine: "wa, va". Sê zarava ji komika Hîrkanî tîpeke qırıki bi ser ve bûye: Beloçî "gwat" (ba), Peraçî

"ya" (ba), Ormûrî "yoş" (befr) vefre. Li aliye din jî, ev guhertin nişan dide ku Peraçî û Ormûrî iro tenê li Esgenîstanê mane, berê ji Beloçî re nêzîk bû.

9- İranî "xv"

("*v*" di zimanê zimanasî de "*w*" tê *xwendin*, MC.)

Piraniya zaravayan an "xv" parastine, an jî, tipa lêvkî "v" winda kirine: Kurdi "xwardin, xwarin", Azeriya basûr "xverden", Gilaki "xor-", Mazenderanî "xér-", Semnanî "xûr-", zaravayên navendi "xor-, xûr, hwd.", Ormûrî "xolok", Peraçî "xer-". Di Zaravayên din de lêvkirina henasi tê de an sivik bûye û (bûye) "h" mîna Talêşî û Azerî (piyê basûr jê derxîn) "herd", an jî tipa lêvkî parastine: Zazaki "werd", Goranî "wardey", Beloçî "vereg". Weki diyar dibe, "xv / x" di komika Hîrkanî de maye. Divê em hebûna "f" di Sîvendi û zaravayên Kevir de deymin aliyeke: "farden", ev form cihe bûye û dibe ku bi vi awayî guheribe: xv, vh (Perthî "wh" binêrin) f.

10- İranî 'vh'

Baş e ku mirov wê bide ber guhartina "xv", nemaze ya serê gotina "vehûni" (xwîn). "xv" û "vh" di piraniya zaravayan de teví hev bûye: Kurdi "xwîn", zaravayên navendi "xûn, xün, xîn, hwd.", Goranî "wînî", Sîvendi "fin". Lî di hin zaravayên Hîrkanî de "vh" bûye "h" (teví "xv" tê de bûye "v"): Beloçî "hon", Peraçî "hîn, Ormûrî "în". Di Zazaki te tiştî balkêş "v" bûye "g", mîna hin zaravayên komika Hîrkanî.

11- Mê

Hebûna mî-nîr di hin zaravayan de, diyardeke sade ya neguhartinê ye û ji bo rîzkirina zaravayan, me pêş naxe. Lî baş e em bizanin ku ew di zaravayên Kurdi yê bakur de maye. Lî di yê bakur de winda bûye. Di zaravayên navendi de ji, wisa bûye. Zaravayên bakur ew parastine. Yê bakur winda kirine. Wiha em dikarin bibêjin ku zaravayên kevintir, anga zaravayên bakur, ji gişan bêtir ji na-venda belavbûna du komikan dûr ke-

tine. Em dikarin navenda wan di navbera Esfahanê û kermanê de bi cih bikin. Zaravayên ku di vê herêmê de mane, ketine bin bandûra Farisî, bi vi awayî peyvsaziya wan hêsanter bûye.

12- Haleta berwar (xar, oblique)

Em ji ber sedemê sentaksî dîzin ku genetîva têmatîka (koka dengdâr) kevin { -ehye (-ê, -î)} ji hemû haletê din bêtir li ber xwe daye. Em hêj jî, şopên wê di Parisiya Navîn de dibînin. Weki haleta mî, mayîna wê di zaravayên nû de meseleke kevintiyê ye. Lî em tiştî din ê gelempere di vir de dibînin. Kurdi jê derxin, haleta berwar tenê di komika Mêdi-Kaspîn û Hîrkanî de maye. Ev jî, ne ji xwe berê hatiye. Weki em dê paşê bibînin (benda 13 li binî binêrin), di van zaravayan de, danasîn (genetîva kevin, determinant) têye pêş nasiyayı (determine), û ji xwe vê avahiyê hiştîye ku ew morfêma rasthatinê bimîne. Rast e ku di Ormûrî de ev halet bûye "locativ" (cîgehî) û di Peraçî de bûye "ablativ" (biriyayî), lî cihe danasînê nehatiye livandin. Ev avahî di Zazaki û Goranî de wenda bûye, lî haleta berwar a ku ji gênetîvê hatiye tê de mane. Wisa em têdighîn ku ew ji bandûra Kurdi li ser van zaravayan hatiye.

13- Pişkbera "determinatif" a nêv

Di İranî kevin de, genetîv, eger nav be an bernav be, têye pêş gotina ku dinasîne. Ev rengê sentaksî, ji Hind - Ewrûpî hatiye. Lî ne dûr e ji, ku ji ber sedemê stîlî an ên din nav, di haleta genetîv de li pey gotina nasiyayı were. Vêca, ev ji, tiştî normal e ku herdu avahî, bi hev re, di hemû zaravayan, de ji kevin de, bi kar hatibin. Lî dîsa ji, her zaravayekî, an her komikek zarava, avahiyek ji xwe re parastine. Danasîn + nasiyayı (benda A) an nasiyayı + danasîn (benda B), tevê hin guhartinê din ên rawekî: xurtkirina genetîv bi pêş-bestekê (preposition), an karanîna destkekî bestandinê (gehineka nasiķe izafe). Mirov dikare şaxen cuða ji bo hevoka "bavê di min, bavê min" bi vi

awayî bi du paran li jêr deyne:

A			
I	mene pîta	Semnan	mo piye
II	heçe mene pîta	Talêşî	çime piye
III	menehye pîta	Beloçî	menî piss
		B	
IV	pîta mene	Eb. Z. N.	piye men
V	pîta heye mene	Farist	piderê men
VI	pîta heçe mene		

Em dikarin şaxê VI'an deynin aliyeke ji lewre ku em wî di gişan de dibînin, gava haleta "partin" bi kar tê. Li gor rîzkirina jor, zarava baş li hev têne cihe kirin. Komika Kermanî, Kurdi, ZN, mîna Farisî, anegorî para (B) bi kar tê; weki din komikên Mêdi-Kaspîn û Hîrkanî anegorî para (A) bi kar tê. Zazaki û Goranî jê derxin. Ne dûr e ku bandûra Kurmançî li ser zazaki û ya Farisî ji, li ser Goranî hebe. Jê û pê ve, Zazaki piçekî avahîya kevin parastive (li benda jêr ya 15'aa binêrin). Ji nav komika Kermanî, Kurdi nasik (êzafê) parastive ku di ZN de nasik xerîb e (devera ku lê heye, ji Farisî hatiye). Lî hin şopine girîng bi avahîyeke bestandinê maye. Di hin zaravân de, avahîyeke ku jê rî dibêjin "girêdana ser-best" maye. Tê de li pêş gotina nasiyayı dengdareke bestandinê tê: "kurê paşa" bidine kîleka "kurî paşa" (ev hevoka bi nasik e: i). Helbet, ev dengdara bestandinê ji koka xwe de bê erk e. Dengdareke ku ji xwe berê ketiye. Ev dengdêr, bi gotinê ku dawiya wan dengdar be re, xuya nabe, ne mîna nasiķe ye. Vêca, em dikarin êdî bibêjin Komika Kermanî giş para (B IV) lê tê, tenê Kurdi karanîna nasiķe tê de baş belav bûye.

14) Rengdêra építêt

Ne xerîb e ku em eynî parvekîrîna zaravayî, di warê rengdêra építêt de bibînin. Ji zaravayên para (B) de, di Kurdi û ZN de, rengdêra építêt, eger nasik hebe an tune be, dikeve

pist gotinan. Hema (lê, labrê) di zaravayên para (A) de, dikeve pêşiyê. Rast e ku di Kermanî de, mîna Farsi, rengdêrin, hene bi "-în" -in, dikevine pêşıya gotinan. Lê ew rengdêrên taybetî ne. Anku ên jimaran in, ên "superlatif" in, bikaranîna wan ne pir kêm e. Di hemû zaravayên para (A) de, rengdêra êpîtêt, alî pêş paşgirekê ("a", "-ê" di Beloçî de) pê re tê. Bê gûman, ew paşgira ji a kevin a ku ji rengdêran çêbûye, hatiye: "-eke", koka wata wê nîne. Em dizanîn ku paşgira "-în" a hin zaravayân û paşgira "-êñ" a Beloçî, ew ji koka paşgira rengdêra "-eine" tê. Bi karanîna vê paşgirê bi rengdêra êpîtêt à li pêş, hiştiye ku haleta berwar a gotinan di, eyñi zaravayân de û di eyñi cî de, bimîne.

15) Bernavê Kesanî

Zaravayên nû hejmara formen bernavî yên kevin pir kin kirine. Pirî caran, tenê nomînatîf û genitîvên kevin parastine. Wek ji bo bernavê (pronav) yekejmar, "ez" <"ezim" û "men" <"menem". Carina ev forma duduyan bi hemû erkan radibe. Hebüna herdu haletan, di Kurdi û ZN de têne ditin. Heçi Mêdi-Kaspînî, ji sistemeke din a çetintir afiriye. Hin zaravayên tê de genetivê din ê zêde ji rengê "mana-hye" çêbûye. Ew zaravine ev in: Gilakî "mi", Mazenderanî "mê" (lê ne "-mey"), Beloçî, Semnanî û Sorxî "menî". Zaravayên din, rengekî din ji genetiv nas kirin, di riya gotineke pêşbestî re ("heçe mene" çemen); Teleşî, Azerî û anegorî hin kesina, Semnanî û Sorxî. Ormûri di gava ravekirî de maye: "ter mun". Carina çêbûna formen nû hîn dûrtir çûne. Wek Herzendî, tê de 5 halet (tewang) hene: Nomînatîf "ez", akûzâtîf "edim" - "eçim", ajan "mun", genitîf "çemen"). Îca, herdu rengén nû yên genitîvî di zaravayên para (A) de hatine guhartin (li benda jor a 13'ân binêrin).

Zazaki û Goranî di vir de jî, ji komika xwe cihê dibin. Hema (lê) Zazaki di pronavê sêwemîn ê yekejmar de, genitîvek "cey" parastîye. Ev

form ji du aliyan ve girîng e. Yek, ev nîşan dide ku Zazakî forma xwe ya kevin mîna zaravayê din parastîye. Dudu, ev dihêle em bibêjin ku Zazakî, zaravayekî ji para (B) ye, ji kevin de forma para (A) nas kiriye.

Ma em bala xwe bidin ser hîn formen taybetî yên bernavê (pronavê) 2, pirejmar), tevî ku niha em bi carekê nikarin wan zaravayan ji hev veqetînin. Piraniya zaravayan forma xwe ji gênîtîva "xşmaxem" > Farisi "şuma", Kurdi "hûn" we" hwd. hatiye. Lê di hin zaravayân Kurdi de "hûn, hung, eng hwd." û di Sorxî de "huc" jî hene. Dibe ji nomînatîva kevin "yûzem" hatibin. "xa" ya Sengiserî ji "xwa < xşma ("şm- > -w- wekî Kurdi) hatiye, belki ya Peraçî "wa" (lê ne "<va") ji. "t "y" os" ya Ormûri dibe ji Peşto hatibe.

16) Bernavê Paşgirî

Bernavê paşgirî bi tevahî ji formen bernavî yên kin hatine. Pirî caran, formen nû yên pirejmar ji yên yekejmar çêbûne. Qertafa pirejmarê ji bo navan "-an < -anam" e. Em dikarin sistema kevin a her komikekê bikolin:

I) Komika Parisî: Formen wan ji forma Parisiya Kevin hatine. Bernavê 1-2-3, yekejmar "-may,-tay,-şay" > "-m, -t, -ş"

II) Komika Kermanî: Kurdi, Kurdiya bakur jê derxin ji ber ku bernavê paşgirî tê de winda bûne. Bernavê 1-2-3 yekejmar "-m, -t, -i" > "-mê, -tê, -hê". Lê sistema ZN nêzîkî ya Farisi ye. "-m, -t, -ş", bernavê 3, "-ş", bê gûman ketiye, ji lewre hin zaravan forma kevin parastine, ew forma ku di Kurdi de tê ditin: Qohrûdî "-y / ï", Ebûzeydabadi "-ê", Ebyanê "-î". Îca, di vir de Kurdi û ZN di gihêne hev.

III) Komika Hîrkanî: Sengiserî û Zazakî. Bernavê paşgirî di Zazakî de winda bûne. Goranî, yên xwe ji Farisi birine. Zaravayên din, forman tevîhev nişan didin. Lê em dikarin sistema gişan du formen bêsertik û çar formen bi sertik pareve bikin. Ye-

kejmar 1 "mene", 2 "teve", 3 "ehye"; pirejmar, 1 "neh", 2 "veh", 3 "eşam". Emê bibînin ku di komikên borî de, formen pirejmar, ji yên yekejmar çênebûne. Em wiha dikarin forma piraniya wan rawe bikin: Beloçî, yekanî, bernavê 1"-ûn", piranî, 1 "-êñ". 2 "-o", 3 "-ış"; Ormurî: yekanî, 1 "-em", 2 "-et", 3 "-et", piranî 1 "-en", 2 "-en", 3 "-e / -we", Peraçî: yekanî 1 "-ûm", 2 "-eu", 3 "-ê", piranî 1 "-en", 2 "-en", 3 "-en" (ji dawîya pişkan hatiye).

IV) Komika Medi-Kaspînî: Zaravayên Kaspînî: Gilakî, Mazenderanî, Semnanî û Sorxî bernavên xwe yên paşgirî nînin. Herdû zaravayên paşin, dawîya pişkîn xwe yên derbasî (transitif) di bihêrkê de hene. Belkî paşgirên xwe ji Farisi girtibin. Zaravayên mayîn pir çetin e ku yekbûnec tê de derkeve. Azeriya başûr: Yekejmar "-m, -î, -ş", piranî "-mom, -yon, -son". Em dibînin ku bernavê 2, di yekaniyê de "-î" ye. Dibe ku ew paşgir be. Bernavê 2, piranî, di Talêşî û Kêringanî de "-on" e, ango nişana piraniyê "ye", bi paşgir e. Wisa, em dikarin bibêjin ku bernavê 2 ê yekaniyê yê Azeriya başûr "-î", yê Talêşî "-a" û yê Kêringanî "-e" dengdarekî bestandinê ye û paşgira yekejmarê, bernavê 2, winda bûye. Li aliye din, di Herzendî de yekanî, 2 "-ûr" e, piranî, 2 "-lûn" e. Di Azeriya bakur-rojhilat de yekanî, 2 "-r" e, piranî, 2 "-ran" e hwd. Paşgira "-r" dibe ku pir ji kevin de wiha guheribe: "-t" "-t": > "-r". Ew di zaravayên vê navçê de hatiye nas kirin. Vêca em dibînin ku sistema pêşî ya van hemû zaravayan, eyñi mîna ya Farisi ye. Lê guhartin tê de bi du rengan zû çêbûye. yek "-t" bûye "-r"; rengê din "-t" winda bûye.

17- Nişandan

Farisiya cihêyi ya zaravayên din, bi "-în / an" e. Ew jî, hîna gotûbêj li ser koka wan heye. Di komika Kermanî de, Kurdiya bakur "ev, ew", a başûr "em, ew" e. Koka wan ji "îme / eve" yên kevin hatine. ZN formine xwe yên cuda û bi serê xwe hene. Divê ku kokêن wan û yên Kurdi yek

bin. Bê gûman, ("imehye / eve "h" ye" > mî / o), ev form di Kêşeyî "mî / û" Talêşî de "mî / û" têne dîtin. Di zaravayên din de "mî > nî" et di riya analojiyî re "o" bûye "no": Qohrudî "nö / nû", Ebûzeydabadî "nî / no", Yezdî "min / u" (ji "m-" a kevine!) hwd. Dawî, di Sîvendî de "î / û" heye, "î" ji ber bandûra "û" ji "mî < mî" hatiye. Di komika Mêdi-Kaspînî de, divê Gîlakî, Mazenderanî, ji Semnanî û Sorxî werin cihê kîrin. Formen wan mîna ên Farîsi ne. Zaravayên Talêşî û Azerî formen kevintir parastine. "em / e, a, av", ji "î-me / eve" hatine. A komika Hîrkanî "eyte / eve" ye. Peraçî "ê / ö" (berwari, ed-) Beloçî "e / a", Goranî "ed / ad" ("d" ya eva paşin mîna a "ed" e) lê Ormûri "e / efo" û Zazakî "n / ew" em nizanin ji ku hatiye.

18- Pêşgirên Pişkî Yen Berdewam

Pêşgira pişkî ya berdewam, di Farisiya nûjen de "mî" ya kevin de "hemî" ye. Di pir têmén cuda de bi kar tê. Komika Kermanî, dîsa bi wî awa-yî pêşgireke din bi kar tîne. Wek: "de- < da?", formen vê di Kurdî de pir bûne: "de-, e-", hwd. Di ZN de ev in: "e, ê, et- hwd". Ev pêşgira ku di zaravayên din de dernakeve, pir gi-ring e, yekitiya komika Kermanî di-çespîne. Sîvendî "mî" ya xwe ji Farisi girtiye. Zaravayên komikên din pêşgirekên wiha nas nakin. Berdewamiya kirinekê, pîrî caran, bi formeke taybetî ji têmeke pişkî pêk tê (benda jîr a 19 binêrin). Li vir, dibe ku ev maka forma kevin be. Gava "hemî" ya Farisi û "heda" ya Kermanî di çaxa xwe de "adverb" (rengpişe) bûn. Beloçî bi pêşgira "k- dûr çûye. Tenê bi wan gotinan re tê bikaranîn ên ku serênen wan dendgar bin. Dawî, gelek zaravan "mî" ya xwe, ji Farisi birine (Sorxî û Sengiserî tenê di dema buhêrka netemam de nas dikin.)

19- Têma Berdewamiya Nuhokê (niha)

(thème duratif du présent)

Di Farisi û zaravayên Kermanî de, berdewamiya kirinekê, bi pêşgiran

çê bûye. Têma nuhokê ku ji nuhoka kevin tê, rola xwe nalîze. Wekî din, di gelek zaravayên komika Mêdi-Kaspînî û Hîrkanî de, têmeke berdewamiyê, ya nû bi paşgira "participe présent" "-ant" çêbûye. Di Talêşî de, bi ser "participe passé" ya kevin ve zêde bûye. "krte-nt", "kerdid-em" jê hatiye (ez dikim). Kurtiya wê dibe "kerd-em". Wiha, di Azeriya bakur-rojava û Herzendî "eme-nd-ên" (ez têm) de ji, wek zaravayên Azerî yê din, mîna ZN tenê têma nuhokê ya kevin nas dikin. Gîlakî û Semnanî ne tê de, hemî zaravayên Kaspînî têmén xwe "-nt" in. Mazenderanî "kên-nê-nî" (hun dikin), Sorxî "vîn-ênd-ê" (ew dibîne), Sengiserî "pors-ênd-i" (ez dipirsim). Ormûri vê formen nas nake, lê Peraçî "xer-tö-n" (ez dixwim) heye. Beloçî di haleteke ravekirinê de ye. pir formen hevgirtî, rengê "revega ûn" (ez dikim herim) bi kar tîne. Zazakî formeke xwe heye ji "participe" hatiye: "şîn-an" (ez dicim). Dawî, Goranî di nuhokê de têma kevin nas dike. "ker-û" (dikim), lê di buhêrka netemam (imparfait) de "ker-ên-ê" (min dikir) heye.

Li tenîta vê forma berdewamî "-nt", yeka dinê ji buhêrka netemam re heye. Di vê komika zaravayan de hatiye dîtin. Lê ne di hemû zaravayan gişî de. Ew forma bi paşgira "-î" xwe nîşan dide, ji paşgira kevin a "opératif" (xwezekî) hatiye. Di berdewamiyê de, dema buhêrkê çêdiike. Ev form di Talêşî de "e-get-îm" (min dibin), di Şehrûdî (Azeriya bakur-rojhilat) de "lerz-î-m" (dilerizîm), di Gîlakî de "kerd-î-m" (min dikir), belkî hinékî di Semnanî de "meş-îy-un" (dimeşiyam) {li nuhokê "meş-în" (ez dimeşim) binêrin} têye dîtin.

20) Dawiya Pişkan

(désinences verbales)

Di zaravayên nû de dawîyên pişkan pir ji hev cuda ne. Çend haletan jê derxin, wekî din ên mayîn, bi pir cûran hatine guhartin. Di komika Kermanî de, Kurdi, bernavê 1, yeka-

nî, "-m" heye; ZN ji wisa ne, lê pîrî carana "-n" ji têye dîtin. Ew ji "sub-jontif" a kevin "-anî" hatiye. Ev dawîya pişkî, belawela di zaravayên din de ji, tê dîtin.

Bernavê 2, di piraniyê de, Kurdî dîsa ji ZN bi "-n" cihê dibe. Ew dîsa di çend zaravayên Kaspînî de ji, heye û pir ne dûr e ji modêla dawîya pişkî ya bernavê 3'an. ZN wê nas nakin (belkî Erdîstanî ne tê de be, wê ji Farisî girtibe), lê du rengên din yeh dawîyên pişkî nas dike. A yekê, "-d" ye. Ew ji bê gûman teqlidkirina Farisî ye. A didyan, divê ku dawî pişkeke orijinal be: Vonîşûni "-êgê", Mehela-tî "-îye", Ebûzeydabadî "îya", Qohrudî "eyê", Cowseqanî û Ebyaney "-îye" Ferîzendî "îye". Tipa qırıkkî divê ji "&w" ("-&wim" a Avistî binêrin) hatibe. Xaleke balkêş e ku dawîpîşka Sîvendî "-ikê" li vê tê. Ev ji tiştekî girîng e ku Sîvendî di nav ZN de bi cî dike.

Em dikarin niha ji şirovekirina jörîn, kurtiyekê bidin. Ji nav komikên li jor, Kermanî ji gişan bêtir baş rûniştiye. Du durûvên xwe hene ku li dereke din nîn in: Xebitandina pêşgira pişkî ya berdewamiyê "heda" û sîsema bernavê paşgîrî -m, -t, -î, ne. Bi ser ve em dikarin avahiya pişkberê, ciyê rengdêra êpitêt, kembûna çêbûnên nû di bernavê kesanî de, têma nuhokê ku ji forma kevin hatî, zêde bikin. Durûvên din ji, çi bi temamî û ci ji perçeyek ji wan, di zaravên din de têne dîtin. Guhartina "-ç" (benda 4) et "-c" (benda 5) ku tê de Kurdi û ZN bi aliye kî digihêne hev: parastina "v-" (benda 8) û "-xv / x-" (benda 9). Divê cudabûnên wan ji, ji hev bêne ve pincirandin. Guhartina "dv-" (benda 3) û belkî ya "-th" (benda 7) ji. Wisa, em jê têdigihêne ku Kurdi ji zû de ve ji ZN dûr ketiye. Hin cudabûnên sivik ku em li ser nesekinîn, di vir de em bêgav dibin, nîşan din. Di navbera Kurdi û ZN de cudabûnên ku hene, nahêlin ku em

kokekê ji wan re nebînin. Wek ku çawa di navbera wan û zaravayên komikên din de ji heye. Cudabûnê din, ji guhartinê ne ji mêj de hatine. ZN "a > o" (benda 1), "û > i" (benda 2), çêbûna amîrên nîşandanê (benda 17), Kurdî "-w- / -v- < -m-" (benda 6). Hecî Sîvendî, dawîpiška piraniyê, 2, "-ûkê" (benda 20) nêzîki ZN dike. Her wiha "û-i" (benda 2), "dv- > b-", "-ç- > -j- > -ş-" (benda 4) hwd. ji. Farisi jê derxin, ZN xuya ye neketiye bin bandûra zaravayêن din. Diyar e ku ZN, ji berê de li ser xaka xwe ya berê mane. Tenê Sîvendî di destpêka îslamiyetê de, ji wan veqetiyaye. Heçî Kurdi, ew nêzîki Zaravayêن Navendî yên rojava dibe û pir duruvêن xwe yên hevbes hene (bend 4,5). Dibe ku hozen (eşir) Lorî, ji herêma rojavayê Esfahanê ku ta roja iro ji tê re dicin û tê, bar kiribin. Bi vê dûrbûnê, Kurdî pir durûvêن kevin parastine, û di ciyekî xurt de ye. Li başûr Kurdî ketiye bin bandûra hin zaravayên mîna yên Farisi. Pir şop nîşan didin ku berê, Goranî li erdekî ji yê iro firehtir rûniştiye.

Herdu komikên Mêdi-Kaspînî û Hîrkanî bi kêmanî du durûvêن xwe yên hevbes ên girîng hene, ku dihêlin ew bi carekê ji Kermanî û Farisi veqetin. Yek, ciyê danasînê li pêş, nêv (benda 13) parastina haleten berwar (benda 12), ciyê rengdêra êpitêt ku paşgirek pê re tê (benda 14); dudu, çêbûna têmeka pîşki ya berdewamîyê "-nt" an "-î" (benda 19). Pir çetin e ku van pîvanê me têr bikin da ku em bibêjin komika rojavayê ïranê hevdû digre û ji ya Kermanî û Farisi cihê dibe. Gelek cudabûn di navbera zor zaravayan de hene. Em nikarin bi temamî yekîtiyeka wan a kevin a zimanasi derxînin. Divê em diyar kin ku wekheviyêن wan ên girîng hene, ev ji, ji xwe berê hatine.

Komika Mêdi-Kaspînî yekîtiya xwe ji "thr > hr" (benda 7) de û ji çebûna bernavêñ nû (benda 15) de dizane. Gerek e em du komikên biçük jê derxînin: Mêdi û Kaspînî, lê xêzeke cudadiyê çetin e, were danîn. Li

aliyê Kaspînî "û > i" (benda 2), bernavine nû li haleta gênîtiva ducarkî (benda 15), amîrên nîşandanê "-n" (benda 17), têne dîtin. Li aliyê Mêdi, "xv > h" (benda 9), bernavêñ ku ko-ka wan ji pêşbestê hatine (benda 15), bernavêñ paşgiri, yekanî, 2 "-t > * , > -r" (benda 16) et amîrên nîşandanê bi "-m" (benda 17), têne dîtin. Xaka ku van zaravayin jê hatine, diyar e bi dirêjiya demê ne hatiye guhartin. Tenê Tîrkan, ew ji kokêñ xwe yên zimanasiya kevin perçê kirine. Eger cîguhastina zaravayan ji hebe, ewqasî fireh belav nebûye, hewqasî karkirina zaravayan li ser hev kêm nekiriye.

Ji nav wan gişan, li ser yekîtiya Komika Hîrkanî gotûbêj heye. Durûvekî hevbes di navbera zaravayêñ wê de nîn e. Wekî din, nûbûnê orijinal geh li wî perçê zaravayan, geh li yê din dîtin. Wiha, guhartina yekaniyê "thr > s" di sê zaravayan de tê dîtin (benda 7), lê "v > g-" (benda 8) di sê zaravayêñ cuda de têye dîtin. Hin durûvêñ hevbes bi perçekî xwe kevintî ye. Parastina "a" û "û" (benda 1-2), mayîna "-ç-", "-c-" (benda 4), "c-" (benda 5) û "v-", ji bilî wan ji, Zazakî û Goranî di çend xalêñ girîng de ji wan dûr dikevin. Guhartina "th > hr" (benda 7) ku wan nêzîki zaravayêñ Mêdi-Kaspînî dike; ciyê danasîna nêv (benda 13) û ciyê rengdêrê (benda 14). Ev nakokiya kartékirina Kurdi, li ser Zazakî rawe dike. Nişanka me, li ser "cey" a yekîtiya kevin a van zaravayan, ji me re xuya dike. Ciye koka van zaravayan ji, ne diyar e. Ji ber gelek sedeman, em dikarin li ser navçeya Hîrkanî, an Xoresanê bifiki-riñ. Ji ïranê, ev navçe tenê di destê me de heye. Navçeya ku Farisan pir zû vegirtin (dagirtin) rê vekir ku talan lê pir bibin û xwediyê navçê bar kin, herin. Çiqas êlên ku zaravayêñ Hîrkanî dipeyivin hene, hema bêje hemî koçer in. A din, navça cînarê zaravayêñ Kaspînî ne. Ji ber vê yekê, durûvêñ hevbes ên girîng di navbera zaravayêñ Hîrkanî û yên derdora Kaspînê û yên xaka kevin a Mêdiya de, hene.

Sêr û Kêvroşk

Besir BOTANI

Şêrekî bê vijdan û du kêvroşkêñ zana hebûn...

Rojek şêri got:

- Ez ji her kesi zixtir û xurtir im. Ez serdarê daristanê me û divêt hûn hemû bi gotina min bikin. Yêñ ku bi gotina min ne kin, dê wan bikujim û bixwim!!!

Rojek ji rojan, şêri wekilek û nobaderek ji xwe re girtin. Sêr:

- Geli xulamên stûxwar! Divêt hûn her roj du heywanan ji min re bînin, heya ku bixwim û têr bîbim!

Kêvroşk:

- Ser seran û ser çavan!

Heywanan di:

- Herê ez benî!

Hemû bi gotina wî kirin û her roj ji wî re dianin. Her we tov û her we tov heya rojek bû nobeta wan û du kêvroşkêñ zana... Lê kêvroşkêñ jîr û çeleng hîzrêñ xwe kirin ku dê ci bikin? Yan ci nekin?! Bîreke mezin li wê derê hebû... Kêvroşka yekê got:

- Min zanî em dê ci bikin!

Kêvroşka Diwan:

- Em dê bêjne şêri ku heywanekî gelek mezin li binê birê ye û dibêje ku ez ji hemûyan xurtir im...

Kêvroşka Yekê:

- Haydê, em biçin!

Gava şêri zanî, wî got:

- Ka min bibine nik wî!

Kêvroşk:

- Fermo ez benî! Fermo ez xulam!

Hemû pêkve çûne ser birê... Gava ku gîhiştin wê derê, şêr çû ser lêva birê û wî şîklê xwe dît û ya ji wî ve rast e! Wî xwe havête birê û dît ku ci heywan li wê derê nîn e û her neşîya (nekart) ku xwe ji mirina reş rizgar (xilas) bike û hêdî hêdî mir.

Şêr:

- Oyl oy oy! ah ah! mmw...

Li dumahiyê (dawiyê) kêvroşk çône daristanê nik hevalan û kirine cejin!

Govend pir coş bûl!

Dengê wan xoş bûl!

Kêvroşk:

- Biji azadiya heywanañ! Biji serkwebûna daristanê!

COXRAFYAYA

BÊ NAV

I. XORT

Di cografyeke welê de ew mezin bûbû ku kes nizanibû û nas nedikir. Cografya wî, pir bi dilşewat bû, mezinê wî û rîvebirên wî jî... Ji cografya xwe, ji mezinê xwe û ji rîexistinê xwe jî, pir aciz bibû. Xort û xurt bû. Xwîna wî dikeliya. Lê ne weke xwîna xwe bi kel, bêhnfireh bû. Mijûl dibû, diramiya (difikirî), lê nikaribû mirovan bide ramandin!

Mirovîn weke xwe pir dîtin. Ev rewş hebekî ew rehet dikir. Lê dîsa di nava wî de tengasiyek, nexxeziyek hebû. Ji bêrika xwe, qutya titûnê derxist, cixarak herî mezin pêça. Vêxist. Hilmek kûr kişand heta kezeba xwe... Hilmek din kişand, dilê wî pê xweş nebû, careke din kişand... Gêj bû. Ji ber kişandina cixarekê, ji gêjbûna xwe pirr bêhna wî teng bû, qehirî. Ji cihê xwe rabû, derket derve. Mirov dîtin, digot belkî, serê wan jî gêj dibe. Halbüki yê ku gêj dibû ew bi xwe bû. Xwest ku alikariya mirovîn sergêji bike, lê mirovîn sergêj!-hatîn alikariya wî û li cihê xwe kumişî (tevizî).

Tesîra cixarê hêdî hêdî winda dibû, gêjiya wî jî, kêm dibû û her tişt li cihê xwe bû!

Bi xwe keniya. Yê li dora wî jî keniyan. Gişt bi hev re keniyan. Kena wan qediya. Hat bîra wî, bê çîma li ser hev ji cixarê hilim kişandin, gêj bû û li cihê xwe kumişî. Ji xwe fedî kir, li ber xwe ket, lê daxuya nekir! Rabû. Xwe dawesand, li yê dora xwe nêri, dîsa keniya û berê xwe da

çiyayêñ war û cihêñ eşqiyayêñ ku pişta wan lê nedihate erdê... Berê xwe da wan çiyayêñ pîroz ku serê wan di nava ewran de winda dibû. Ji ber çavan winda bû. Gîhûst serê kaniyekê. Li serê kaniyê runişt, çengê xwe tijî av kir, ser û çavêñ xwe şûst. Vexwar... Li ser repinêñ şîn xwe dirêj kir û kete xeweke kûr.

Di destêñ wî de pirtûkeke mezin, li milêñ wî çapeliyeke (mawzerek), ku ji kalan mayî û di ber wî de jî, demançeyek e gindorîn. Liderdora wî, ji jin û mîran qelebalixeke bê dawî. Ji xwe çûbû û bi wan re navê cografya me tune ye. Karwanek di vir re derbas bi-be û ji me

navê cografya me bipirse emê serê xwe bera ber xwe bidin. Cografya me pir bê dilşewat e, divê em wê zevt û revt bikin. Divê em nema mezinê xwe yî weke cografya me bê dilşewat jî, bipejirînin. Em ta iro weke

ku ew qedera me ye, em jiyan. Lê divê qedera me ne wilô be. Ger wilô be jî, divê em vê qedera xwe biguherînin. Qedera me, ne di destêñ mezinê me yêñ bê dilşewat û ne jî, di cografya me ya dilşewat de be, divê em bigrin destêñ xwe!

Peyvîn wî yêñ dawiyê, qelebalixa bê dawî, ponijand û ramankirin da. Ponijandina qelebalixê, ku ta iro tişten nikaribûn bikirana, anî ber çavêñ wî û ew pir pê kêfxwes bû, dilê wî hênik kir. Lawikê pêxwas ê ku li pêsiya qelebalixê rawestiya bû (sekinibû), bi heyranî û dev ji hev çûyî li wî dinêri. Wî jî, ew dît. Kêfa wî jî hat. Hêvî û biryardarî (kararlılık) di çavêñ zaro-kê de dît. Wî jî, bi heyranî û dilxweşî li çavêñ wî nêri. Weke ku ji hevdû fêm bikin, bi hevdû re bipeyivin, li hev dinêrin!

Zarok, ji wê nêrinê hewl girt û gotê:

- Cografya mezra me, mezinê me û birêvebirên me jî, ji yêñ we ne kêmter in! û belki ji wan hîn zêtetir nebaş in. Ji sibehê ta êvarê, ez şivan-tiya kar û berxan dikim, tasek şîr na-din min û min birçî dihêlin. Xwedîyê kerîyê pez, rojekê jî pezê xwe nedîti-



ye û neçûye ber.

Peyivîna wî zarokî, ew pir xiroş (heyecan) kir. Xwedîderketin a li qederâ xwe, di tûrêjîn çavêñ wî de dît. Ü hîn bêtir ewlekariya wî bi baweriya wî ya ku li xwedîderketina qederâ

xwe derdiket, hat.

Çavêن xwe li ser qelebalixê gerand. Silav da qelebalixê û ji tehta ku hilkişıya bû ser dakete jêr.

Zarokê mezin, ew bi xwe jî, hebe-kal bibû. Hîna li cem tehta ku hilkişıya bû ser radiwestiya. Vê carê, li ser tehtê, zarokê ku mezin bibû hebû. Bibû xortekî xurt û li eniya wî jî, şûna çend birînan hebû. lê qet guh nedida birînên eniya xwe. Ji xîtaba ku qelebalixa bê dawî re dikir, nuqîtên xwêdanê tevlî nuqîtên xwîna eniya wî dibû û weke cirokekê berjêr ve diheriki. Ji xîtaba xwe ya bi qelebalixa bê dawî re, ji xwe çûbû. Zarokê ku mezin bibû, ji ser tehtê daket û ji qelebalixê re got: Bidin dû min ku em herin mezrê, gund û hemû mirovîn wekî xwe xelas bikin. Meşîya. Qelebalixa bê dawî jî, da dû. Xortê din, ji hêza (qeweta) xortê nû û qelebalixê tirsiya, veciniqî, çend gav bi şûnde avêt. Şaş mabû, nema zanibû bê çi bike. Bang li xortê nû kir; bê pîrsîn, hûn bi kû ve diçin? Tiştekî we tune, ger hebe jî, hûnê bi vê hêza xwe, kambax (xera) bikin û bişewitînin. Hûnê tedê bidin xwe! Bêhna xwe fireh bikin. Belê kesî lê guhdarî nekir. Xwe bi xwe çend caran ev peyv li ser hevdû got...

Ji xewa xwe şiyar bibû. Hîn jî dîpeyivî. Tesîra cixarê li ser hebû, gêjbûna wî jî... Ew tiştên ku dîtin, xewn bûn, an rast bûn? Wî jî nema zanibû. Ber çavên wî, weke serê çiyayêن pîroz ewr û tarî bû. Çavên wî bi kaniyê ket û çû ser û çavên xwe şûst. Hate ser hişê xwe, dîsa bi xwe keniya. Rûnişt. Qutiya xwe ya titûnê derxist, weke ku her tim dikir, cixareke stûr pêça, çend hilmên kûr kişand... Gelo ew qelebalixa bê dawî, gîhişt gund û mezran? Ger gîhiştibin, ez li vir çi dikim? Çima ez bi wan re neçûm? Lê...Lê...of.. Serê min. Ma ez hewqas bê hewl (gayret) mame ku ez bi wan re neçûm?

Got na. Û ji bo ku xwe bi xapîne got; bi qelebalixê re ya di xewnê de jî, nayê meşîn...!

HALKIN AYDINI HALKIN SAVAŞÇISIDIR

5 Eylül ve 3 Ocak 1984 direnişle-riyle cezaevlerindeki esaret zincirleri tamamen kırıldı. Başta PKK merkez komite üyeleri Mazlum, Kemal ve Hayri olmak üzere, onlarca PKK'lı şehitler kervanına katılmıştı. Oysa Avrupa'yı mesken seçen reformistler, hayatlarnı örgütlemekle meşguldüler.

Şanlı 15 Ağustos atılımı, Kürdistan tarihinde yeni bir sayfanın başlangıcı olmuştur. Bu atılım, Türkiye ve Kürdistan'daki birçok yurtsever ve demokrat kişinin sempatisini kazanmış ve PKK'yi kendilerine bir kurtarıcı veya doğal bir müttefik güç olarak görmelerine neden olmuştur. Bu onurlu insanlardan biri de, İsmail Beşikçi'dir. Beşikçi'nin PKK'yi kendisi-ne doğal bir müttefik görmesi ve onunla düşünsel anlamda enternasyonalist dayanışmaya girmesi, başta TC olmak üzere, Kürdistan'lı reformistlerin de sözü veya yazılı hakaretlerine sebep olmuştur. Beşikçi'nin, reformistlere ve işbirlikçilere yanıtı kisa ve özlüdür:

"PKK ile ilişkilerimiz gönül, ruh

ve beyin birliğine dayanıyor. PKK Kürt ulusunun ruhsal yapısını çok yakından izledi ve tahlil etti. Kürt halkın ruhunun derinliklerindeki özü yakaladı. Silahlı mücadeleyi başlattı ve Kürt halkın yoğun destegini yanında buldu."

İ. Güçlü'ye yazdığı mektupta İ. Beşikçi, şu görüşlere yer veriyor:

"Bugünkü aşamaya nasıl gelindi? Binlerce şehit var. Arkadaşlarımızın çocukları olan pek çok gerilla var. Bazı arkadaşlarımızın toruları gerillada. Hepsî Kürt ulus için, Kürdistan için savaşıyor. Bugün Kürdistan'da her alanda gerilla var, her alanda şehit var. Bugün Kürdistan'da korku kırılmıştır. Bu korkunun kırılmasında PKK'nın düşünce ve eyleminin çok büyük rolü olduğu tartışılmaz. Korku kırıldıkça, Kürt halkı, Kürt halkın ruhsal yapısı derinleşmektedir. Dirençli, direnen bir kişilik gelişmektedir. Geçillanın bu süreçteki rolü açıkta. Kürdistan'a ilişkin düşünceleri, duyguları ve bekentileri olmayan in-

sanlar, bu tür sedakarlıklara katlanamazlar.

Kürtler, bugüne kadar hep başkaları tarafından yönetildiler. Şimdi bir Kürt örgütü ciddi bir şekilde, "Kurdistan'ı biz yöneteceğiz" diyor; düşündüklerini, planlarını, projelerini hayatı geçirmeye çalışıyor. Bu sürecin gelişmesine katkıda bulunmak gereklidir. PKK genel sekreteri Abdullah Öcalan, politik ve askeri

yönlere ağır basan bir önder. Bu bakımından, Kürthalkitlerinin "Başkan APO, Biji APO" gibi hitaplarda bulunmaları, sloganlaratmaları, yerinde bir harekettir. Abdullah Öcalan, artık Kürt halkın bir umududur. Omuzlarında milyonlarca Kürdün sorumluluğunu taşımaktadır. Abdullah Öcalan'ı artık yalnızca PKK'nın önderi, PKK'nın genel sekreteri olarak değerlendirmek gereklidir."

Bu cevap, zavallı mangasız onbaşının (İbrahim Güçlü) kişili-



ğinde, tüm reformistlere verilen bir cevaptır.

İsveç devletinin bir bakanı diyor ki: "PKK'yi bize Kürtler "terörist" ilan etti". Ardamarları çatlayan bu düşünüler, varsin Kürtleri ve Kurdistan'ı pazarlıyarak özel yaşamalarını örgütler. Elbette, bir gün sorulacaktır bunların hesapları. Beşikçi'ye küfür dolusu mektup yazarlar, özel yaşamalarını örgütlerken, Beşikçi, sömürgeci mahkemelerle hesaplaşıyordu.

PKK'nın ortaya çıkıştı, Kürtlerin tarihinde bu önemli bir dönüm noktasıdır. PKK bize şunu öğretmektedir:

"Ulusal özgürlük için, ulusal bağımsızlık için ölmek gereklidir. Irkçı, sömürgeci devleti endişelere gark eden de PKK'nın bu kararlı ve bilinçli tavridir.

ERNK (Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan), Beşikçi'ye gönderdiği bir dayanışma mesajında şöyle diyor:

"Sayın İsmail Beşikçi,
Düşünce ve bilim tezleriniz karşısında gücsüz ve aciz kalanların baş-

gırlükten mahrum bırakın çağdaş tıranların gücü yetiyorsa, dünyayı dönmeliğini kanutlasınlar. Bilim ve bilimsel yöntemi her şeyin üzerinde tutan gerçek bir bilim adamı, yürekli ve onurlu kişiliğınızı selamlar ve mücadeleinizde başarılar dileriz."

Beşikçi, Cezayir'deki ulusal kurtuluş hareketinin boğazlanmak istenmesi karşısında cübbesini çıkarıp

atan bir Fransız profesörünün onurlu davranışından özetmektedir. Fakat bize göre Beşikçi'nin verdiği kavga, Fransız profesörünün verdiği kavgadan daha anlamlı ve önemlidir. Ve daha büyük tehlikelere göğüs germektedir. Fransız profesör, cübbesini atmasına karşın tutuklanmamış, yarışmamamış, işkenceye tabi tutulmamıştır. Ortaçağ engizisyonundan kalma cezaevlerinde kalarak bir ömür tüketmemiştir.

Beşikçi, tüm işkence, baskın ve zulme karşı yılmamıştır, cezaevleri ikinci adresi olmuştur. Omuzlamıştır kalemi mitralyoz misali, hedefi faşist Türk sö-

vurduğu yöntem, her zaman olduğu gibi, yine sizi tutuklamak olmuştur. Kitaplarınız toplatılmak ve yasağatılmak suretiyle, düşüncelerinizin halk kitlelerine ulaşması engellenmek istenmektedir. Bu nedenle birçok kere özgürlüğünüz gasbedilerek, cezaevlerine konularak, çeşitli tehditler ve işkencelere maruz kaldınız. Ağır cezalara çarptırıldınız. Ama bilim adamı tavrinizden bir milim bile şaşmadan mağrur ve başı dik olmasını her zaman bildiniz ve her zaman 'dünya dönüyor' diye haykırdınız. Sizi yeniden öz-

mürgeciliği ve onun resmi ideolojisidir. O, bilimi, Kürdü ve Kurdistan'ı faşist mahkemelerde de savunuyor. Kurdistan adına yola çıkan sahte liderler gibi, mahkemelerde, "bu işleri ticaret için yaptım" demiyor, "bilim için yaptım" diyor, "insanlık için yaptım", diyor. Meydan okuyor sömürgeciliğe ve onun resmi ideolojisine. Beşikçi'yi yalnızca bir aydın, bir demokrat, bir bilim adamı olarak değerlendirmemek gerek. O halkın savasçısıdır. Enternasyonalist tugayın yılmaz neferidir.

...Bitti...

ZMAN Ü RASTNIVIS

F. Huseyn SAGNIC

Hnek mrov, "ji bo drist nvisandin û drist zanina rîziman û rastnivisa zmanê Kurdi, divê mrov mitliq bi İngilizi bizane", dibêjin. Hnek ji zanina zmanê Frensizi û hnek din ji zanina zmanek ji zmanê Hind-Avropa merc (şert) dibinin. Ez ji wanra: "Mitliq divê mrov bi Kurdi baş bizane. Lê çqas zmanek ji zmanê cihanê zêdetir bête zanin, ne ku teni ji bo rîziman û rastnivisê, ji bo hemi kari pîr qence" dibêjim. Belê zanina zmanê biyani kareki pîr hejaye. Lê ne mercê rastnivis û zanina rîzimanê Kurdiye. Lewra taybetiya hemi zmanan ji hevdu cdanin. Qenc bala xwe bîdinê; ji hemi zmanan zêdetir, zmanê Farisi nêzikê zmanê Kurdiye. Lê rastnivis û qaydên rîzimanî bi temami ji hevdu cdanin. Gava rastnivis û qaydên rîzimanî yên du zmanan manendê hevdu anji nêzikê hevdu bibin, ew ne zmanen cda, zaravayê yek zmanê têne hejmartin. Nexe ew beşa mirovan ji bo çi zanina zmanek ji zmanen Hind-Avropa mercê rastnivis û drist zanina rîzimanê Kurdi dibinin? Dî hezra mînda, ji ruhê bîdesti û xwe xorditinê tê. Şireta min ji wanra eve: Demek zû xwe ji vi ruhê bîdesti xwe xorditinê rîzgar kin û her kesê ji mina xwe nezanin.

Piştî vê şrovekirina jorin, em bêne li ser mjara xwe.

Rastnivis

Qertafê qedinekê (izafe = tamlama):

Ev qertaf ji bo zayenda nêr "ê" ji bo zayenda mî "a" ji bo praniya her du zayandan yek ji "ên, êd, êt" e.

Yekani, zayenda nêr:

Kurê Féris / Mêrê malê..

Hespê Reşo / Beranê tov

Yekani, Mê:

Keça Şevger / jna malan

Tvinga berikhûr / Bzina şir

Prani:

Beranê tov / Bzinê şir

Mêrêt malê / Jnêt malan

Tvingêd berikhûr / Kâxezêd mezin.

Gava pevv bi dengdêrek bîqede, "y" ya kelijindinê dixwaze. Mina:

Xwarziyê min, braziy te

Gayêd cot, axayê stemkar

Qenc bala xwe bîdine wan minakêjorin, qertaf hemi ji bi pevvê pêşive hatine nvisandin. Lewra qertaf bi tu ewayi ji pevvê xwe cuda nayê nvisandin. Ev qertafêjorin, gava ji peyvan cuda bêne nvisandin û danin, têgih (mana) diğuhere, ji qertafiyê derdikevin û dibin cinavk.

Mina:

Beran ê Kerevane, Keç a mine.

Tving ên Şoreşêne, dep êd derine

Ev celebêñ qertafan, gava bîbin cinavk û peywîra cinavkan bibin, dikarin "y" ya kelijandinê ji bigirin. Dî vê tintêlêda "y" ya kelijandinê dikeve pêsi û peve têne nvisandin. Mina:

Hesp yê Xweşmêre, jin ya Reşoye

Çek yên şerkeranın, kêran yêd xanine

Praniya hindik:

Praniya hindik bi qertafa "nê" pêktê û têgha hnek, hindek û beşek jê dide, ne ku hemi. Mina:

Keçnê şoreşker, Mérnê jêhati

Darnê berojan, sêvnê libgr

Çawan li jorin ji dixwiyê, qertafa "nê" bi peyva pêşive tê qertifandin û bi tu ewayi cuda nayê nvisandin û danin. Bi vê rewşê, têgîha hnek ji wan û beşek ji wan dide, ango ne hemi.

Yekani:

Peyvîn Kurdi hemi ji di tintêla xwe ya xwerûda yekaninin. Gava mrov hesp, ga, ker, hêlûn = min hesp ani, min ga grê da cot, min ker bar kir, di hêlûnêda hêk hebûn bibêjê, ji ali her kesve tê zanin ku hesp, ga, ker, û hêlûn yekaninin. Lê gava mrov bixwaze yekaniyê tam kifş bike ango têgîha yek li biyê bîde navan, hînga qertafa "ek" bi navanve tê qertifandin. Mina:

Hespek, gayek, kerek, hêlûnek.

monek, jnek, xaniyek, mrek,

Çawan li jorin ji dixwiyê ku nav û qertaf bîheve têne nvisandin û ew navên bî dengdêran qedane, wan ji "y" ya kelijandine girtine û hemi peve hatine danin.

Prani:

Bî qertafa "an" praniya tam:

*Hespan, gayan, keran, plingan,
çelekan, berxan, maran, hêkan,*

Her çgas dî peyvinêda carna "n" ya "an" tê êxistin, lê di nvisandinêda dive neyê êxistin. Peyvên bî dengdêran bîqedin "y" ya kelijandine dixwazin. Heker pevv bî dengdêra "a,e" bîqedin, dikarin ciye xwe bidine "a" ya qertafa "an" û ew "a" him peywira xwe û him ji peywira tipa keti bibine. Mina:

Axa- axan, mela- melan, xama-xaman

Pale-palan, fle-flan, deve-devan

Bî qertafa "na" praniya hindik:

Sêvna, - sêvna bine, zebesna - zebesna bine

Şêrma- şêrma bikuj, marna - marna qir ke

Bî qertafa "ne" praniya hindik:

Darne rindin, keçne bedewin, mérne basın

Kevirne pçûkin, şérne drekin, gurne harin

Bî qertafa "in" praniya hindik:

Sêvin hene pir qencin, mérin çelengin

Qelemîn qencin, tvîngin rastavêjin

Ev her sê praniyên hindik, bi têgiha hnek, hindek û beşek ji wan dide, angó ne hemi û hemi qertaf ji bî peyvanve têne nvisandin.

Navên hevedudani:

Pevedanina du navan çêbûna navên hevedudani:

Serder, tenijder, sertir, grav

Çrav, pirhevok, pingev, perav

Pevedanina nav û rengderek çêbûna navên hevedudani:

Sermezin, devpiçük, çavbelek

Enigever, pordurêj, çovstûr

Pevedanina nav û lêkerek çêbûna navên hevedudani:

Nanpêj, Avkêş, Zêrker, dranker

Masigir, pezkar, darbur, rêjen

Bî tevineka tipa "e" çêbûna navên hevedudani:

Kalemêr, pirejin, kevneperek

Şêrejin, nêrekew, şevederi

Bî tevineka "bi" çêbûna navên hevedudani:

Karbûdest, desibikêr, berbixêr,

Rojbiroj, dembidem, salbisal

Bî qertafa "gin" çêbûna navan:

Xemgin, lezgin, xwazgin

Desgin (dizgin), xwezgin

Bî qertafa "çe" çêbûna navan:

Xalîce, nalçê, navçê, derice

Derxiçe (terxiçe, kulinçe

Bî qertafa "ring" çêbûna navan:

Devring, soring, zering

garing, hevring, daring

Bî qertafa "man" çêbûna navan:

Şîyman, peyman, asiman

Poşman, ferman, derman

Bî qertafa "ak" çêbûna navan:

Hûnak cvak, svak,

Ronak, binak, minak

Bî qertafa "k" çêbûna navan:

Cinavk, berçavk, ciderk

Sersök, berguhk, bersivk

Bî qertafa "awer" çêbûna navan:

Cengawer, dilawer canawer,

Birawer, qencawer, semawer,

Bî qertafa "a" çêbûna navan:

Beza leza, geza

Xwera, zana, xama

Bî qertafa "ber" çêbûna navan:

Rêncber, dilber, rehber

Şikber, berêwber, hetikber

Bî qertafa "wer" çêbûna navan:

Dawer, dadwer, ramanwer

Kışwer, perwer, hisswer

Bî qertafa "avk" çêbûna navan:

Sêlavk, pşavk, soravk

Şoravk, hêyavk, zêravk

Bî qertafa "bend" çêbûna navan:

Nalbend, sazbend, hevalbend

Bazbend, fêlbend, derbend

Bî qertafa "best" çêbûna navan:

Serbest, dulbest, kemerbest

Darbest pêbest, destbest

Xwezay ev celebê çêbûn û hevedudanyên navan gelek hene. Teni ewên Rêzimana min nvisandida ci ne girtine, min beşek ji wan li vir nvisandin. Di van curêن navanda têgihêن têvel hene. Bêweku "serbest" bî têgiha serbixwe û azad tê. Heçi "dest-best" bî têgiha dest grêdanê tê, lê rastnîvisa hemiyan mina hevdune. Angó nav û qertaf gişk peve têne nvisandin. Şxwe mebesta me rastnîvise. Biminin xweş.

Têbinî: *Di hejmara bêda wê rastnîvis bidomine.*

HOZANÊN

KURD

Abdurrahman DURRE

Xwendevanên delal û hêja!
Ziman û wêjeya (edebiyat)
Kurdî, wilo dewlemend û mezin e
ku, bi sedsalan di binê givaştin û
helandina dagîrker û dijminan de
perçiqiye û talan bûye; hê jî di
nav ziman û wêjeya cîhanê de ci-
hê xwe yê hêja parastiye. Li qora
(çerx) pêşîn hebûn, niha jî heye,
herdem xweşî û geşiya xwe parasti-
ye. Bi sedî şair û wêjevanên mezin
û hêja, jê rabûne û radibin. Cihê
xwe yê wêjeyî (edebî) tu demî vala
nehiştiye û nahêle. Bi vê munase-
betê, emê di vê nivîsara xwe de, lîs-
teya 47 şairên Kurdî yêni bi nav û
deng pêşkêşî we xwendevanên hê-
ja û delal bikin. Hêvîdar im ku
hûn bi naskirina wan hozanên me-
zin û hêja pir dilxweş bibin.

- 1) Baba Tahirê Hemedanî (935-1010), bi zaravayê Lorî nivîsiye.
- 2) Mele Perîşan (1398-?) Bi zaravayê Hawramî nivîsiye.
- 3) Eliyê Herîrî (1425-1490) Bi zaravayê Kurmancî nivîsiye.
- 4) Mele Ehmedê Bateyî (1414-1495) Bi zaravayê Kurmancî nivîsiye.
- 5) Feqiyê Teyran (1590-1660) Bi

zaravayê Kurmancî nivîsiye.

6) Mistefayê Mele Ehmedê Bîsa-
ranî (1641-1702) Bi zaravayê Hawra-
mî nivîsiye.

7) Mele Ehmedê Cizîrî - Melayê
Cizîrî (1547-1640) Bi zaravayê Kur-
mancî nivîsiye.

8) Ehmedê Xanî (1651-1707) Bi
zaravayê Kurmancî nivîsiye.

9) İsmailê Bazîdê: Teqlîdkerê Xa-
nî bûye (1654-1709) Bi zaravayê Kur-
mancî nivîsiye.

10) Şerîfxanê Hêkarî (1689-1748) Bi zaravayê Kurmancî
nivîsiye.

11) Muradxanê Bazîdî (1737-1784) Bi zaravayê Kurmancî
nivîsiye.

12) Harisê Bidlîsî (1758 - ?) Bi
zaravayê Kurmancî nivîsiye.

13) Xanayê Qubadî (1700-1759)
Bi zaravayê Hawramî nivîsiye.

14) Seydayê Hawramî (1784-1852) Bi zaravayê Kurmancî
nivîsiye.

15) Mewlewî Ebdurehîmê Taweqûzî (1806-1882) Bi zaravayê Hawra-
mî nivîsiye.

16) Ahmed Begê Komasî (1793-1876) Bi zaravayê Hawramî nivîsiye.

17) Haci Qadirê Koyî (1815-1897) Bi zaravayê Soranî nivî-

siye.

18) Melayê Jabarî (1806-1876)
Bi zaravayê Hawramî nivîsiye.

19) M. Wesman Haci İsmail
(1796-1889) Bi zaravayê Hawramî nivîsiye.

20) Emin Axayê Koyî (1839-1887) Bi zaravayê Soranî nivîsiye.

21) Keyfi Hemçerkê Haci Qadirê
Koyî bûye (1814-1883) Bi zaravayê
Soranî nivîsiye.

22) Bêxud (1870 - 20.8.1955 Silê-
maniye) Bi zaravayê Soranî nivîsiye.

23) Piremerd (Tewfiqê Mehîmûd
Axayê Hemze Axayê Mesrefê,
1867-1950 Silêmaniye).

24) Tahir Begê Caffî (1857-1917 Si-
lêmaniye) Bi zaravayê Soranî nivîsiye.

25) Nali (Mela Xidrê Şarezûrî,
1797-1855 an jî 1870) Bi zaravayê
Soranî nivîsiye.

26) Salîm (1800-1860, Silêmaniye)
Bi zaravayê Soranî nivîsiye.

27) Kurdi: Suxtê Salim e
(1800-1866, Silêmaniye) Bi zaravayê
Soranî nivîsiye.

28) Xarik (1851-1907) Bi zarava-
yê Soranî nivîsiye.

29) Şêx Riza Talebanî (1836-1910) Bi zaravayê Soranî nivî-
siye.

30) Abdullah Abad (1859-1912)

Bi zaravayê Soranî nivisiye.

31) Abdurahîm Wefat (1875-1917) Bi zaravayê Soranî nivisiye.

32) Tahir Beg Caf (1875-1917) Bi zaravayê Soranî nivisiye.

33) Ziwer: Abdullah Mihemedê Mele Resul (1830-1948, Silêmaniye) Soranî

34) Mele Marûfê Kokai (1837-1906) Soranî

35) Mewlana Xalidê Kurdi (1719-1827z.) Li Silêmaniye bûye, li Şamê wefat kiriye.

36) Bêkes: Faîqê Ebdullah Begê Kak Hemme (1805-18. 12. 1948, Silêmaniye) Bi zaravayê Soranî nivisiye.

37) Goran: Şoreşker û gelperwer bûye (1904-1962)

38) Qanî: Şêx Mihemedê Şêx Abdulkadirê Dolaşê (1898 an ji 1900 - 7.5. 1965)

39) Mahwi: Mihemedê Şêx Osmanê Belxî ye, hozanekî felsefi tese-wufi bûye, di 1327'ê Koçî da li Silêmaniye wefat kiriye.

40) Şah Pertew (1802-?) Bi zaravayê Kurmancî nivisiye.

41) Salim Ebdurrehmanê kurê Mihemed Begê kurê Ehmed Beg e; ji malbata Sahibqiran e, sultê Kurdi Mistefa Beg bûye (1800-1868). Bi zaravayê Soranî nivisiye.

42) Wefat: Mîrza Ebdurrehîmê kurê Mele Xefûrê Mele Nesrullah e, li Erebîstanâ Suûdî miriye (1836-1892) Bi zaravayê Hawramî nivisiye.

43) Bêtûşî: Mele Ebdullahê Beytûşî (1160-1221 Koçî) Bi zaravayê Hawramî nivisiye.

44) Wisalî: Mihemedê kurê Şêx Mihemedê Qeredaxê ye. Ji şêxen Merdoxiyan e. Di 22.3. 1902 an de ji dayika xwe bûye.

45) Kemalî: Eli Bapîr Axa (1886-29.11.1974, Silêmaniye) Bi zaravayê Soranî nivisiye.

46) Xadîmî 47) Mîrza Qadir: Kurê Mihemedê Paweyî ye. (1266-1328 Koçî) Bi zaravayê Hawramî nivisiye.

48) Seydayê Cigerxwîn: Mele Şêx-musê Hisarî (1903-1984) Bi zaravayê

Kurmancî heş (8) dîwanên wî hatine çap kîrin.

Mihemed Emin Zekî (1880-1948) ji, yek ji edîb û dîrokzanê navdar ê Kurdistanê ye.

Pir Şair û wêjevanên mezin, ji jî-nê Kurdistan jî rabûne. Wek:

1) 10 Heyran Xanim, Keça Kermîxanê Dimbili: Li Herêma Nexçivanê (Bakurê rojhilatê Kurdistanê) bûye.

2) Sirriye Xanim (Sirê Xanim): Di sala 1814 an da li Amedê (Diyarbekrê) bûye û li İstenbolê wefat kiriye.

3) Mah Şeref Xanim (Mestûre): Keça Ebîl Hesen Begê kurê Mehmed Axayê Nazirê Kurdistanê, jîna Xusrew Xanê Fermandarê Erdelan bûye. Di nav salê 1219 û 1264'an de (Koçî) jiyaye. (1264 ê Koçî, beramberê 1847 ê Mîladî ye)

Şaireke pir mezin bûye. Nêzîkî bîst hezar helbestêñ wê hebûne. Lê mixabin, bi zimanê Farisi nivisiye. Helbestêñ hemû winda bûne. Serokê Çanda Kurdistanâ rojhilat Haci Şêx Yehya, nêzîkî hezar helbestêñ M. Şeref Xanimê, civandine û di sala 1304 ê Koçî de, bi navê "Dîwana Mah Şeref Xanima Kurdistanî" çap kiriye.

Têbinî

Di nivîsara Seyda A. Durre de ya ku di hejmara 8'an de hat weşandin, hin çewtiyên tîpîzî hene. Di rûpela 45'an de rastiya rista yekemîn a helbestê divê welê be:

Bawkem Ehmed bû, nawî

fikrem dê

Di rûpela 46'an de rastiya rista yekemîn ev e:

Selahê ïwe istagê silah e

Dîsa di eyñî rûpelê de rastiya rista 3'an:

Bi şîr û xame dewlet payîdar e
û ya yanzdan divê welê be:

Belê şêx qutb e, emma qutbê aş e
Rista 15'an ku bi "Lê" dest pê di-
ke, divê "Lê" bibe "Le".

Rista 18'an divê wiha bê nivîsin:

Be heyet têgeyîm Kurd e
be şîwe ehlê Kurdistan:

Bilûra Min

bilûr, bilûr, bilûra min
bilûr, bilûr, derdrêja min
bilûra ji dara gulan
xwes e dengê bilûra min
dengê xweştir ji şalûlan
bilûr difrîn derd û kulan

bilûr, bilûr, bilûra min
bilûr, bilûr, kulrêja min
bilûra ji dara qehwê
xwes e dengê bilûra min
xweştir e ji dengê kewê
xemêni mirov dike xewê

bilûr, bilûr, bilûra min
bilûr, bilûr, xemrêja min
bilûra ji dara kevot
xwes e dengê bilûra min
xweştir e ji dengê kevot
dilêñ evîndara disot
bilûr, bilûr, bilûra min
bilûr, bilûr, derdrêja min

Şûro Lêxe

ha lêxe, lêxe, şûro lêxe
tu serê neyar li erdê xe
destiyê şûr ji dar kinêre
tu serê neyar li erdê xe
kalan û şûrê min ji zêre
şewqa şûr ronî da sitêre

ha lêxe, lêxe, şûro lêxe
tu serê neyar li erdê xe
destiyê şûr ji dar hêjirê
tu serê neyar li erdê xe
kalan û şûrê'm ji sifirê
şewqa şûr ronî daye tîr merkurê

ha lêxe, lêxe, şûro lêxe
tu serê neyar li erdê xe
destiyê şûr ji dar bihîvê
tu serê neyar li erdê xe
kalan û şûrê min ji zîvê
şewqa şûr ronî daye hîvê

Girê Dêrsilê

Dört bin yıllık bir taribi geçmişten gelen efsane

MEM Ú ZİN ya da

MEMÊ ALAN

Besir ANT

Mitolojik ilahi bir aşk öyküsü olan ve yazılı edebiyat dünyasında en çok Ehmedê Xanî'nın yazdığı Mem Ú Zin adlı manzum eserle tanınan bu efsane, sanıldığına aksine çok eski bir tarihten beri bilinmektedir. Bazı kaynaklar (örneğin; Abdullah Yaşın, Büttün yönleriyle Cizre) bu efsaneyi M.S.1450 yıllarında Cizre'de geçmiş ve 1690 yılında da ölümsüz pirimiz E. Xanî tarafından edebi bir üslupla yazılmış bir olay olarak tanıtıyorlar. Evet, doğrudur. E. Xanî bu mitolojik aşk öyküsünü 1689 yılında, hem de Cizre'de yazmıştır ama, olay o günün veya ona yakın tarihlerin bir ürünü değildir. İslamiyetten ve hristiyanlıktan çok önceleri, daha Zerdeş öğretisi bütün Ortadoğu'dan Hindistan'a kadar yayılan bir alanda resmi din olarak kabul ediliyorken, bu efsaneının varlığına rastlanıyor. Pirimiz E. Xanî'nın yaptığı, öteden beri söyleneğelen bu efsaneyi edebi, estetik bir dille kaleme almak, ona, yaşadığı zamanın gelenek, görenek, tarihi, toplumsal, kültürel yapısını giydirerek, o güne uyarmak (adaptasyon) olmuştur. Kendi yorumunu katmış, onu belli bir yere, belli bir zamana oturtmuştur. Onun bu değerli yapınızı Latinice Kürt alfabesiyle ve Türkçe çevirisisi ile birlikte Türkiye'de ilk defa basan sayın M. Emin Bozarslan da, aynı görüşte olduğunu, kitabı yazdığı önsözde belirtiyor. Şunları yazıyor çevirmen: "Mem Ú Zin hikayesi, Memê Alan adıyla Kürt halkı arasında hayli

yayın ve eskidir. Bu hikaye, milattan önceden bu yana halk arasında söylenen ve mitolojik bir nitelik kazanan bir destandır. Büyük ozan Ehmedê Xanî'de... o hikayeyi kendi çağının yaşantısına göre somut bir kalıba dökmuş, çağdaş ve modern bir usulupa yazmıştır", diyor. (Adı geçen eser, Önsöz, sayfa: 11)

Zerdeşlik ve onun kutsal kitabı Zend-Avesta, dini terminoloji açısından ilk "tek tanrılı" dindir. Bu öğreti, Hz. İsa'nın hristiyanlığından 3000, Hz. Muhammed'in İslamiyetinden 3600 kusur yıl önce ortaya çıkmış, yayılmış, giderek Med İmparatorluğu döneminde Kızılırmak boylarından Hindistan içlerine kadar uzanan bir alanda resmi din olarak yüzlerce yıl egemen olmuştur. Bu konu, aslında başka bir alanı ilgilendirir. Biz sadece Mem ve Zin efsanesinin dayandığı temel felsefeyi aydınlatma açısından kısaca değinip, geçeceğiz bu öğretiye ve ilkelerine. Zerdeş, Zerdeşti veya Zerdeşlilik olarak adlandırdınları dini, felsefi inancın yayıcı önderlerine, Kürt halkı, peygamber -peyamberişmini veriyor. Başlıca örnek, Zerdeşti peygamberlerdir. Birinci, ikinci, üçüncü Zerdeş peygamber vd. gibi. Bunlar, yüzlercedir. Ama, en ünlülerini üç tanedir, Birinci Zerdeş, M.O. 4000 yılında Belh (Bugünkü Afganistan'da oluyor) şehrinde görülmüş, ikinci Zerdeş 3060'lı yıllarda yaşamış ve en ünlü olan üçüncü Zerdeş 600 yılında yaşamıştır.

Zend-Avesta kitabı da bu dönemin eseridir. (Bkz: Kürtler ve Kurdistan Tarihi, Cilt-1, Botan Amedi, Dicle-Firat Yayınları)

Zerdeş öğretisi en çok bu dönemde olgunlaşmış, felsefi boyutu dahi ileri bir düzeye çıkmıştır. Kanımcı, bu da Med İmparatorluğunun kuruluşu, gelişmesi ve Kürt kültürune verdiği taze kanla ilgili bir olaydır. Zerdeşlerin öğretisi ilk tek tanrılık inanışıdır dedik. Yezdan, (tek tanrı Allah) iyilik, güzellik, hak ve adaletin temsilcisi olan en büyük tanrı Hürmüz (Mazda, Ahura Mazda) da somutlaşır. Kötülük adaletsizlik ve ihanetin temsilcisi (tanrısı) de Ehremen'dir. Ehremen islam inancındaki (iblis, şeytan) kavramına denk düşüyor. Hz. Muhammed'in Allah ve iblis beatımları de buradan alınmadır.

Zerdeşlik, felsefi olarak da dünyayı diyalektik düşünme yöntemiyle yorumlar. Kainatın temeli iyilik ve doğrulukla sürekli savaş halindedirler. Yani doğal, sosyal yaşam her zaman bu iki karşıt gücün savaş alanıdır. Siyah beyaza, karanlık ışığa, kötüyile, fesat ve fitne barışa karşı kötü oyun ve entrikalar içindedir. İnsan yücelmek için iyiye inanmalı, haksızlığa karşı direnmeli, sonsuz adalet uğrunda savaşmalıdır. Marks ve Engels'in "Zıtların birliği ve karşılıklı mücadele" ilkesini bulmalarından binlerce yıl önce, Zerdeş'in diyalektik düşünme yöntemi ve gelişmelerin zıtların karşılıklı mücadeleşine dayandığı, her

şeyin temelinde bu ilkelerin bulunduğuunu açıklayan öğretisi. Ve şöyle emreder Zerdeş "iyi düşün, iyi konuş, iyi yap!"

İyilik ve doğruluğun cisimlerinde tezahür ettiği güneş, ay, ateş vb. kutsaldır. Güneş ışık saçtığı için aydınlığı temsil eder, kutsal olan ışktır. Ama, bu kalının zarfi olan güneş de bu yüzden kutsal oluyor. Newroz efsanesinde de durum aynen böyledir. Kawa, kötülük ve zulmun uygulayıcısı Dehak'ı öldürür ve bunu ateş yakarak yeryüzüne ilan eder. Kawa, direnişi temsil eder, ateşle kutsanır, Dehak karanlığın, zindanın çırkefin lajetli bataklığına, mahkum edilir. Newroz da dağ başlarında ateş yakma etkinliği bu felsefeden geliyor. Burda yeri gelmişken üç kibrıt çöpü yakarak ölüme giden çağdaş Kawaları ve kendi bedenlerini kutsal ateşle yıkayarak zulme başkaldıran kahramanlarımıza animsatalım.

Bu ışığın "Nur'un" kutsallığı İslam dinine de yansımıstır. Eski Yunanlılardaki Aya Tapıcılık, Hintilerin Zen Budizm'i ve Büyük Tanrı Buda, Japonların Tao'su Zerdeşlik inancının birer yansımıası ve koludurlar. (Dr. Ali Şeriatı, Medeniyet ve Modernizm, İstanbul, 1985)

Bu saptamlardan sonra tekrar konumuza, Mem ve Zin öyküsüne dönelim. Bu mitolojik öyküde de sürekli mücadele içinde olan iki karşıt güç var.

İyilik, güzellik ve fedakarlık Mem ile Zin'in kişiliğinde; kötülük, yalan, iftira, ihanet ve işbirlikçilik, yani kötü tanrı Ehremen'in bütün özellikleri Bekoye Ewan de dile getirilir. Kürtçede 'Ewan' sözcüğü zaten iblis, şeytan anlamına geliyor. Olaylar Mem, Zin, Tacdin, Çeko, Mîr ve Beko çevresinde gelişirken, bu felsefi yaklaşım her olayda temel eksene oturtulmuştur. Mitolojik bir eskiçağ öyküsü olan bu Kürt efsanesi, çok eskilerden beri Fars, Arap ve Afgan halkları arasında da bilinip söylenenegeliyor. Hatta, bu mitolojik aşk öyküsü, etkileşimde bulunduğu diğer halkların mitolojisinde benzer efsanelerin doğması-

na kaynaklık etmiştir. Yunanlıkların Romeo ile Juliet'i, Arapların Leyla ü -Mecnun'u bu mitolojinin o toplumlara adepte edilmiş bir versiyonundan başka birşey değildir. Beyrut'ta ilk baskısı yapılan "Memê Alan" kitabıının önsözünde Dr. Nureddin Zaza, bunu uzun uzun anlatır. Temalar üç aşağı, beş yukarı aynıdır, temel felsefi yaklaşım da yine öyle.

Mem ve Zin Efsanesinin Değişik Anlatımları:

Memê Alan adıyla basılan kitapta ve bazı 'dengbêj'lerin anlatımında Mem, E. Xanî dekinin tersine Maxribi-



yan (mağrip, Fas) emirinin tek oğlu ve tahtının tek varisi bir prens olarak rivayet edilir. İlahi aşkı uğruna Maxribiyan ülkesini, tahtını, tacını terkederek yaban ellerde sevgilisini aramaya çıkar. Mem'in doğumunu bile bir büyülü olur, düşler- gerçeklerle içiçe bir kombinezon içinde başlar olaylar. Mağrip'te bir kurt Mir'inin ne işi var? diye sormak geliyor insanın aklına. Kürt prensi Mem neden Mağrip'te doğmuş olsun ve buna rağmen de neden ünvanı ile birlikte Memê Alan diye adlandırılısın? Bu sorular nasıl yanıtlanacak? Oysa, Ehmedê Xanî'ye göre Mem, Botan Mir'inin Divan Katibinin oğludur ve Taçdin'in de kan-

kardeşidir. Başta da söylediğim, Xanî bir adaptasyon yapmıştır. Botan kültürünün öğelerini kullanarak mitolojiyi Botnlaştırmıştır. Mağribiyan ülkesine gelince; Dr. Nureddin Zaza'ya göre, Med imparatorluğu döneminde mağrip ülkesi de bu imparatorluğun sınırları içinde olduğu için olayda garipsenecek bir durum yoktur. Mağrip Emiri (Mîr'i) de bir Kürttür ve onun oğlu olan Mem, öykünün kahramanıdır. Hatta, mitolojik öykünün kahramanı, öykünün ilk çıktıgı zamanlarda Mem ismini de taşımıyabilir. Daha sonraları, Kürtlerin İslam dinini kabul edip Arap kültürünü etkisine girmeye başlamalarıyla öykünün kahramanı Hz. Muhammed'den esinlenerek onun adını almıştır. Bu, akla yatkın bir yorum da olabilir. Çünkü, Mağrip -Fasükelerinin Prensi/Mem'indayısa -Memê Alan'daki anlatımda Kureyş ailesinden gelen bir şeyhtir. Keramet sahibi olan bu Kureyş Şeyhi (Şêxê Qureysiyan) o güne kadar hiç çocukları olmayan Mem'in anne ve babasına bir keramet göstererek ermişliğinin gücüyle Mem'i armağan eder. Hz. Muhammed'in Kureyş kabilesinden geldiğini de bu duruma eklediğimiz zaman, Mem'i Muhammed'e bağlayan bağ da ortaya çıkıyor. Yine Dr. Nureddin Zaza'ya göre bu ilişki, Selahaddin Eyyubi vasıtası ile de kurulabilir. Şöyle ki; büyük Kurt komutanı Selahadin Eyyubi, Mîsrda Fatimi

Devleti'ne son vererek bir Kürt-İslam devleti olan Eyyubi devletini kurar. Bu devletin egemenliğinde Suriye, Lübnan, Fas ve Tunus da vardır. Belki de bu öykünün kahramanı Mem, Büyük komutana atfen Mağrip'te aranmıştır.

Bir de bu ilişkinin kurulmasında kültürel ve sosyal bir bağlantı bulunmaktadır. Bilindiği gibi, Selahaddin Eyyubi, Mîsr ve Filistin'de yıllarca İslam dinin bayraktarlığını yaparak, hristiyan Avrupa'nın birleşik Haçlı Ordularına karşı çok kanlı savaşlar vermiştir. Sonunda bu orduları bozguna uğratmıştır. Selahaddin'in bu savaşlardaki en seçme birlikleri Van,

Hakkari ve Cizre yöresinden getirttiği aşiret savaşçılarından oluşturulmuştur. Buralardan onbinlerce savaşçı güç getirdiği ve onların destsüyle zaferler kazandığı söyleniyor. Hakkari, Botan vb. yörülerden gidip Misir, Filistin ve mağribi tanıyan, oralarda sahip acı çeken, ölen Kürtler çektiğleri çileleri Mem'de özdeşleştiriyor ve onu o Mağrip ülkesinden alıp çile çekeceği, öleceği Botan'a getiriyorlar.

Her neyse, belki bir gün gelir ve bunların tümü açığa kavuşturulur. Böylece efsanelerimiz tarihimize daha bir açığa çıkmasına yardımcı olur. Zaten bilinen yazılı tarih; mitolojik, efsanevi söylemelerin ve masalların akılçıl, mantık, bilimsel temellerde yapılan tahmin, yorum ve çıkışmalarından büyük oranda ortaya çıkarıyor. Alın Yunanlıların tarihini. Bu gün birçok ayrıntısı bilinen Eski Yunan tarihi büyük bir bölümyle Homeros'un İlyada ve Odisseia adlı efsanelerinden Zeus'tan, Achilleus'tan almıyor mu?

Mem'in Büyüülü Doğumu ve Bozê Rewan'ın Öyküsü

Rivayet edilir ki, Mağribiyan ülkesinin yaşlı bir Mîri varmış. 50 yaşını geçtiği halde bir çocuğu olmamış. Bu duruma çok üzülüyor, böyle nesepsiz ölüp tahtının sahipsiz kalmasından büyük bir endişe duyuyormuş. Günler, yıllarca düşünüp durmuş ama, bir çare bulamamış bu haline. Nihayet bir gün karısının ağıbeyi olan Kureş şeyhine derdini açmaya karar vermiş. Şeyh de onun için çok üzülmüş ve bunun için Allah'a yalvarıp bir çare bulması için 40 gün, 40 gece Hilvete çekileceğini; namaz, niyaz ve dualarda bulunacağıni söylemiş ve öyle de yapmış. Kureş şeyhi keramet sahibi büyük bir evliya olmuş. 40 gün, 40 gece geçtikten sonra şeyh, Mîrin huzuruna çıkarak, "ey mîr! Allahtan sana müjdem olsun ki, yüce rabbim sana bir erkek çocuk nasip edecek. Adını Muhammed (Mem) koyacaksın. Aynı zamanda bu küçük yeğenime sırlar aleminden büyük bir armağan gelecek. Senin oğlun, benim yeğenim, benim seyahlik payemden birçok güzel huyl-

ra sahip olacak ve dün-yadurdukça ismi yeryüzünden silinmeyecek. Ben yeğenimi kutsal Kureş asaletiyle teçhiz edeceğim", diyemüjdelenmiş. Mîr, Kureş şeyhine büyük bir saygı göstermesine ve hep onun elini eteğini hürmeten öpmesine rağmen şaşırıp kalmış. Ama, bu müjde üzerinde de büyük bir umuda kapılmış.

Nihayet günler, haf-talar, aylar geçmiş. Ve o belirlenmiş an gelmiş. Ümulan olmuş, 9 ay, 19 günün sonra müjdeyi yerine gelmiş. Mîrin bir erkeke çocuğu olmuş. Bütün Mağribiyan ülkesi, komşu

memlekeler, beyler, şeyhler büyük şenlikler düzenlemişler. Ülkenin her tarafında 40 gün, 40 gece sürecek eğlenceler kurulmuş. Mem, bir ay parçasıymış sanki, kopup yeryüzüne inmiş. Ne mağrip, ne maşritte o güne kadar doğan çocukların böyle bir güzellikle raslanmamış. Dayısı Şexê Qureşyan gelip onu kutsamış, kulağına sırlarını fısıldamış, ezan-ı Muhammed'i okumuş ve adını koymuş: Mem (Muhammed).

Dağbaşlarına ateşlerin yakıldığı, davul zurnalarla şenliklerin başladığıının ilan edildiği, halayların kurulduğu, ziyafetlerin verildiği ilk gün akşamda doğru, Mağrip balıkçıları bir acaip haberle dönmüşler avdan. Her günde gibi torlarını (ağ) denip "Ras-gele ya Rab!" diye atıp nasiplerini salmışlarken, torlarına bir tuhaf yaratığın takıldığını farketmişler. Çekmeye güçleri yetmemiş, bağırmış, çağımış, imdat istemişler. Mağrib'in bütün balıkçıları imdatlarına koşmuş, yardım etmişler ki, ne görsünler; bir acaip yaratık takılı duruyor ağlar... Şaşkın şaşkın bakıp durmuşlar ama, hiçbiri ne olduğunu, neye benzediğini anlayamamış. Taşıyip şehrde getirmişler. Bütün Mağrip halkı gelip bakmış, kimse bunu çözmemiş.



Şexê Qureşyan'a haber gitmiş, o da gelip bakmış. Ve kalabalığa dönerken; "Ey nas! Şunu bilin ki, bu yaratık Hak Tealâ nezdinden benim yeğenim Mem'e bir armağandır. O sırlar aleminden bir kusruk yavrusudur. Rengini gökkuşağından, hızını şimşeklerin çakışından almıştır. Bunu alın saraya götürün ve adını Bozê Rewan koyun", diye seslenmiş. Bu büyülü at yavrusu herkesi büyümüş, Mağrip ülkesini kerametlere garketmiştir.

Günler günleri yıllar yılları kovalamış. Mem büyümüş, kocaman bir delikanlı olmuş. Bozê Rewan da öyle. Mem, sarayın en seçme alimlerinden ilim ve fen tahsil etmiş, kılıç kuşanmış, silah ve savaş ustalarından en yüksek düzeyde dersler almış, eğitimi yapmış, Bozê Rewan'ın sırında dağdan dağa, savaştan savaşa koşmuş, gözüpek bir savaşçı, yürek yakıcı bir yiğit olmuş. Bozê Rewan Tanrıının hikmetinden yaratıldığı için emsali görülmemiş bir at'mış. Koşmaya başladığı zaman gözü ufkun ucunda hangi noktaya kadar görüyorsa ilk adımını oraya atarmış. Bütün savaş ve dövüş talimlerinde Mem kadar kıvrak, usta ve becerikli bir mahlukat olmuş.

**Peri Kızı Üç Güvercin Öyüüsü
ve Zîna Zêdan
(Zîna Keça Mîr Zeydîn)**

Mem ile Bozê Rewan büyüye dursunlar, bırgün, bir gece yarısı üç tane kınalı güvercin gelip sarayın havuzundaki bir ağaç konarlar. Ve kendi aralarında konuşmaya başlarlar:

-Bu havuz kimin?

-Mem'in.

-Mem kim?

-Şu gördüğün Mağrip sarayının tek prensi.

Bu arada soyunup elbiselerini çıkarırlar. Dünya güzeli üç tane peri kızı çıkar ortaya. Peri kızı bu üç kızkardeşin en büyüğünün adı Tavbanû, ortancasının adı Hevbanû, en küçüğünün adı Avbanû'dur. Güle oynaya havuza girer, üzerler. Şakalaşır, birbirlerine su atarlar. Öyle soyunuk halde havuz kenarında ayaklarını suya uzatarak dinlenirler. Kızların en küçükü Avbanû ablalarına sorar:

-Peki söyleyin bu güzel prensin sevgilisi kim?

-Sevgilisi mi? Sevgilisi yok ki.

Avbanû biraz düşünür, tekrar sorar;

-Boyle bir prens sevgilisiz olur mu hiç...

Ve muzip muzip güldükten sonra gözleri parlıyarak ekler:

-Kızlar, var misiniz bir oyun oynamalı?

-Ne oyunu?

-Mem'e bir sevgili bulma oyunu.

-Tamam anlaştık. Sevgilisi kim olsun?

-Kim?

-Buldum!

-Kim?

-Zîn!

-Hangi Zîn?

-Zîna Zêdan!

-Botan sarayının prensesi Zîna Zêdan!

Hepsi birden neşeye bağırırlar:

-Tamam, Mem'e Alan ve Zîn Banû'ya Cizîra Botan, birbirlerine ne güzel yakışan iki insan.

Tekrar havuza dalar ve yoruluncaya kadar güle oynaya üzerler. Sonra havuzdan çıplık giyinirler. Üç kınalı güvercin olurlar. Havuz başındaki ağaç konarlar. Kafa kafaya verip bir

şeyler fisildaşmaya başlarlar.

O gece de Mem akranları olan kırk lewendiyile (yigit-koruyucu) geç vakitlere kadar eğlenceler yapmış, sonra da yorgun argın yatağına çekilmişdir. Ulykusunda ilginç bir rüya görmeye başlar. Farkına varır ki yatağında bir başkası uyumaktadır. Döner bakarki ne görsün dünya güzel bir peri prensesi vardır yanında. Hayretle bir daha bakar, ne yapacağını bilemez. Tam o anda bu düş ülkesinin güzel perisi de gözlerini açmasın mı? O da şaşırılmış, donup kalmıştır. Kendine gelir gelmez avazı çıktıgı kadar bağırmaya başlar:

-İmdat yatağında bir yabancı var!...İmdat!..

Mem'e döner;

-Kimsin sen, burada ne işin var? Hemen in yatağımдан, çıkış git odamdan. Yoksa başına neler geleceğini bilmiyor musun?

Mem eliyle kızın ağını kapatır;

-Sus, bağırmaya o kadar. Asıl sen söyle, kimsin sen? Ne işin var benim yatağında? Ve hemen çıkış git buradan. Yoksa bir gören olur!

Bir ondan, bir diğerinden, 'asıl benim odama giren sensin, sen çıkış', kavgası başlar. Bir türlü bu işin içinden çıkamazlar. Sonunda kendilerini biraz toparlayınca, Mem kiza döner ve:

-Bak, bu işin kolayı var. Hangimizin doğru söylediğini anlamak için söyle yapalım. Önce sen nedimeleinden birini çağır. Bakalım, eğer gelen olursa, doğrudur, o zaman ben senin odana girmiş olacağım, eğer kimse gelmezse o zaman da demek ki sen yalancısın, der.

-Tamam, bak nasıl senin yalanın ortaya çıkacak, diyen Zîn, sınırlı sınırlı kabul eder bu teklifi ve bağırmaya başlar:

-Heyzebûn, Heyveron, Çengzêrîn, Kewbanû... diye başlar ve 40 nedimesinin adını sıralar. Ama hiç cevap veren olmaz. Ne gelen olur, ne değişen bir şey. Bunun üzerine daha da sınırlenir ve suratını asar. Mem ise, bu işe kahkahalarla güler ve şşşkin kızcağıza:

-Dur bakalım, şimdi sıra bende. Ben de 40 lewendimden sadece bir iki tanesini çağıracağım, o zaman

gör bakalım, der ve seslenmeye başlar:

-Mîrza, Cimşîd, Soro!.. daha sözlerini tamamlamadan kapı vurulur ve isimlerini söylediği üç lewend içeri girerler:

-Emret Mem!..

Mem:

-Tamam, tamam gidin. Bir şey yok, diye onları gönderir. Kapıyı katpatıp giderler.

Güzeller güzel kız hayretler içinde donakalmıştır. Şaşkın ve perişandır. Çaresiz, ne yapacağını bilemez. Ağlamaya başlar:

-Ne oldu, bu ne iştir, nedir bu başıma gelenler ya Rabbi!.. diye sizləmaya başlar. Uzun süre hıckırıklarla ağlar. Mem, onun gönlünü almaya çalışır, yatsuşturma uğraşır. Çok geçmez samimi bir havaya girer, birbirleyle tanışırlar. Adı Zîn'dir ve Botan Beyi Mîr Zeydîn'in kızıdır. Mem de kendisini tanıştırır. Sonra karşılıklı birer hatura olarak parmaklarındaki yüzüklerini birbirleriyle takas ederler. Mem, adı kazlı altın sedef yüzüğünü Zîn'in parmağına, Zîn'de kendi adı nakişlanmış yüzüğünü Mem'e armağan eder. Tan ağarmaya başlamıştır. O anda ikisi de gönüllerinde bir firtinanın koptuğunu, tufanların taşlığıni, volkanların patladığını farkederler. Gözlerine uykusuzluğun mahmurluğu çöker. Hiç olmasa bu kadar yoğun olaylardan sonra kendilere gelmek için biraz uyumaya karar verirler. Mem, kalkar kılıçını alır ve kendisi ile Zîn'ın arasına koyar. Orası iyi uykular diler. İki kardeş gibi uyuma başlarlar. Mem, yarın ne olacağını düşünmektedir. Hemen uykuya dalarlar.

Tam o anda havuz başında dut ağacında bekleyen üç kınalı güvercin, kanatlanıp odaya dalar; Zîn'i bir tahtrevanla tekrar kendi sarayına geri götürürler. Ama, onları Allahın hiç bir kulu görmemiştir. Sabah olur, Mem uyanır. Görür ki yatakta kendisinden başka kimse yoktur. Evin içinde Zîn'i aramaya başlar, ama boşuna. Onu bulamaz. Aynı durumu Zîn de yaşar.

Mem yataklara düşüyor, Zîn günden güne bir mum gibi erimeye başlıyor.

NIŞTIMANA XWE BINASE

ERZINGAN

Bajarê Erzinganê, li bakurê rojâva yê Kurdistanê, di navbera bajarê Erzurum û Sîvasê de, li bakurê Dersimê, li deşta ku çemê Avares (şaxê Ferat ê herî mezin) tê de derbas di-be, hatiye ava kirin, Li başûrê Erzinganê çiyayê Munzir(3453), li baku-re wî jî, çiya-yên Kesiş(3547) cî di-girin. Ciye ku bajêr lê ava bû-ye, bilindahiya wî ya ji serpil-ka(sewiye) der-yayê 1205 met-ro ye.

Li gorî bel-geyên Hîtîtiyan, bineciyên pêşin ên Erzinganê hozên (ê-lêlén) Huri-Mitanî ne. Berî za-yînê di sala 1380'an de îm-peratorê Hat-tî(Hûtî) Suppîlûm, bi qralê Haya-şa-Azzî (Huri- Mitanî) re peymanek çêdike. Dersim, Erzingan, Sîvas, Er-zurum û Sîmxane (Gümüşhane) di nav sînorêن qraliyeta Hayaşa - Azzî de ye. Împeratorê Hattî Suppîlûm, her aliyê Anatoliyê bi hikmê zo-rê vedigire (îşgal dike), lê bi qralê Hayaşa-Azzî nikare, neçar dimîne, pê re peymanek (ehd) çêdike û bi qî-za wî re dizewice.

Di sedsala 9'an (berî zayînê) de li vê herêmê qraliyeta Urartu ava dibe. Sînorêن Urartuhiyan fireh dibe, ta di-

gihije Sîwasê. Di vê demê de, li Erzinganê keleha Girikê zêr tê ava ki-rin.

Dema ku Trako-Frig (Armenî-Ermenî) ji ber êrîşen Kmeriyan dire-vin, bi aliyê welatê Urartuhiyan ve tên û li wir bi cih-dibin. Piştî ku qrali-

Serweriya (hakimiyet) tirkan ji wê demê ve dest pê dike û heta iro tê.


Piştî ku komara (cumhuriyet) Tirkîkîyê dameziri (ava bû) birêveberiya (îdare) Tirk, dest bi pişavtina (asî-mile) Kurdan kir. Navên bajar, bajarok û gundan guhartin. Xwestin ku

dîrok û çanda kurdan hunda bikin. Berma-yêن li herêmê tev talan kirin.

Keleha Gi-rezêrê: Ev kele di dema Urartuhiyan, sedsa-la 8'an (bz) de hatiye ava ki-rin. Du sûrên (beden) kelehê hene ku firehi-ya wan 12 met-ro ye. Eywana (salona) herî mezin a wê demê, di vê ke-lehê de hatiye

çêkirin, ku mezinahiya wê 44 x 25 x 30 metro ye. Stûnên eywanê û dîwa-rên serayê, ji kerpiçan hatiye çêkirin. li ser dîwarên sarayê, ji rengên spî, sor, şîn û reş resmîn boxe û şêran hatiye neqîş kirin. Bilindahiya eywan-e 4. metro û nîv e. Di gencîneya (xe-zîne) kelehê de, serên riman, gurzên tûncîn û pişkokên zêrîn hatine dîtin. Ji bilî (xeynî) van li kelehê heykelên pezkûvi û yêñ ku ji diranêñ filê hati-ne çêkirin, hatine dîtin. Mîmariya vê kelehê û ya wanê weke hev in.

Şelaleya (şîp) Girlevkê (fayli te-



yeta Urartuhiyan hildiweşê û li ser axeke firehtir împeretoriya Medya dadimezire (ava dibe di sedsla 6'an de berî zayînê), Erzingan jî di nav sî-norêن Medya de dimîne.

Erzingan û hin bajarêñ din, bi kurtasî ev herêm, gelek caran êrîşen Parthân, Sasaniyan, Bîzansiyen Ere-ban, Mongoliyan û Tirkan dîtine. Ev herêm gelek caran hatiye talan kirin û xirab kirin. Ev hêzîn talankar û ve-girtkar gelek zirar dane vê herêmê.

Erzingan, li dawî, di sedsla 16'an de, dikeve destê Osmaniyan.

pe) mirov dibêje qey bedewiya xwezayê tev di xwe de ber hev kiriye. Bermayêñ kevnare yên ku hêjayêñ dîtinê ne, ev in: Şikevtêñ Cemedîn (li Kemahê), Xirbeyêñ Çaraxis (Refahiye), Dêra Kevirêñ Gewher (Eğin), Manastira Wanê (Kemah), Keleha Endîçi (Eğin), Dêra Geruçla (Eğin), Keleha Dotê (Eğin), Dêra Meryem (Kemah), Zinarê Piroz (Refahiye), Keleha Bagajarîstan (Tercan), Xirbeyêñ Samuka (Eğin), Xirbeyêñ Sîneryas (Refahiye), Keleha Şîrînî (Tercan), Xirbeyêñ Zinegar (Îlîç), Gola Bendava Kebanê.

Nêçîrvanî li Erzînganê pêşve çûye. Heywanêñ nêçîrê (gur, rûvi, beraz, kew û kêtvoşk) li vir gelek in. Dewleta Tirk a dagîrker, di van salên dawîn de, dest pê kiriye rîl û daristanêñ vê herêmê dişewitîne û nefi dike. Rindahiya daristanê tune dike. Daristan, bi heywanêñ di nav xwe de xweşik e. Dewleta Tirk, rindahiya xwezaya (tabîet) me dixwaze ji holê rake.

Li Erzînganê atolye û dezgehêñ sifirê (paxir) gelek in. Bazirganiya sifirê pir pêşve çûye. Lê aboriya gel, bi piranî li ser çandinî û xwedîkirina sewalan (heywan) e. Rûniştvanêñ (nifus) Ezîrganê, ji sedî 95 Kurd in. Yên din jî, Tirk û Ermêni ne. Di nav gelê vê herêmê de welatparêzî û li seksiyeta xwe ya netewyî xwedîderketin, heta van salên dawî gelek kêm û qels bû. Lê piştî hilpişkin û raperîna 15 ê Têbaxê, ya 1984'an rih û guyana welatperweriyê, li vir jî, veda û geş bû. Gerîlayêñ ARGK ê, li vê herêmê jî, bi cih bûn û bi gel re têkkiliyêñ xurt danîn. Otorîteya gerîla ya li vir, her diçe hurtir dice. Serîhildanêñ gel ên li herêma Botan, belkî niha li vir nayê dîtin, lê bi pêşketina libbaziyêñ gerîla, di demeke ne dirêj de, di rojêñ pêşya me de serîhildanêñ gel li vir jî, dê xuya bîbin. Ji lewre digel hovîtiya dewletê, gelê Ezîrganê, li gerîlayêñ xwe xwedî derdikevin, Cinazeyêñ gerîlayêñ xwe, bi girseyî û bi xwepêşdanan hildidin. Ji niha ve gelek deverên Erzînganê di bin qontrola gerîla de ye.

CERDEVAN

Adar JIYAN

Hey cerdevan cerdevan
Te çav berdaye peran
Ew pere kefenê te
Te mala xwe kir wêran

Cerdevanê xwîn erzan
Bûye rêberê dizan
Edwê mal û qewmê xwe
Ji xelkê re parêzvan

Cerdevanê bê mirêz
Dest bi xwîn dev bi girêz
Ne lêv maye ne diran
Li wî halê xwe bimêz

Cerdevanê bê welat
Mirna wî ber pê de hat
Bê dost, bê yar û bê kes
Bê heval û bê civat

Cerdevanê bê xîret
Paryê nanê wî bi minet
Wek sey devê derî
Pêr nemaye tu rûmet

Cerdevanê gundiye
Ji xwer hestiyek diye
Sibê, êvari dikojê
Çavê wî kes nedîye

Cerdevanê çavnebar
Keda gelî min dixwar
Di gorê de mişk û mar
Cerdevanê xwefiroş

Ziravê wî yê kîroş
Dike mala xwe barke
Ne dist heye ne beros
Cerdevanê dînbetal

Îman pêr nîne misqal
Daye dijmin welitek
Zarok tevd hiştin bê mal
Cerdevan diçe bajêr

Cizdana perê wî pêr
Ji xwer kefen dikire
Wê sibê bimre bi xêr
Cerdevan hate malê

Aniye qutê salê
Çû ber devê kewarê
Rihstîn daket balê
Dest avête stowê wî

Pere xistin devê wî
Got: "Qismetê te ev e"
Paşê stand rihe wî
Cerdevanê neletî

Brûska xwedê lê ketî
Kevir û kuç lê dibarin
Tu car nabe rihmetî
Cerdevan ma bêkiras

Temenê wî bû xelas
Heçî li me guhdar kir
Em jî wan gelek spas!

ŞANOYA Jiyana Nû

Mirin û Jiyana (Listik / Du Perde)

Hüseyin KAYTAN

Perdeya Yekemin
Sahneya Sêwemin

*Yuzbaşî di odaya xwe de, li ber
masê rûniştiye û rojnameyê dixwîne.
Topal dikeve hundir. Silav dîde û rûdi-*

ne.

Yuzbaşî Salih : Li bajêr çî heye
çî tune, Topal?

Topal Eli : Welle, heke pere
hebe, li bajêr her tişt heye, quman-
dan efendi...

Yuzbaşî Salih : Ma pere heye,
Topal? Ha?

Topal Eli : Di saya we de, pere
heye, qumandan efendi... Di
saya dewleta me de, pere heye.
Ez xulameki belengaz bûm, lê di
saya we de, ez bûm axa!

Yuzbaşî Salih : Erê, erê, To-
pal, erê Eli Axa... Qudreta me heye,
lewma...

Topal Eli : Destê dewletê gi-
hişte me. Ez niha efendi me. Her
kes ji ber min ve radibe ser pi-
yan. Çima? Ji bo ku qudreta me
heye, lewma...

Yuzbaşî Salih : Ha ha ha! Lo To-
pal, tu jî, ne hindik bê şeref i haa...

Topal Eli : Di saya we de, quman-

dan efendi.

Yuzbaşî Salih : Aferîn, aferîn,
Topal... Ez ji te pir hez dikim.

Topal Eli : Hûn sax bin, quman-
dan efendi.

Yuzbaşî Salih : Li gorî dîtina

kî nû heye?

Topal Eli : Qumandan efendi, di
nav gel de terorist pir in. Ev xortên
ha, hûn dizanin ew çî dikin? Ew, pro-
paganda teroristân dikin.

Yuzbaşî Salih : Yê ku zêdetir pro-



min, tu ji ticaretê baş qezenc dikî, ne
wisa ye? Ka ez lê binêrim? Baş e,
baş e...

Lê istixbarat çawa dimeşe? Tişte-

paganda dike, em ji wî dest pê bikin!
Berî her tiştî, divê tu wî tespit bikî.

Topal Eli : Ez texmîn dikim, qu-
mandan efendi!

Yuzbaşî Salih : Baş e, baş e!... Ticareta mezintirin ev e, Topal, ji bîr neke! Pere ev e! Hêz ev.e! Tu dê ji wî baştır qezenc bik!

Topal Eli : Hûn emir bidin, bes e, qumandan efendî!

Yuzbaşî Salih : De here, Topal, de here, serokê qoriciyan! Karênen mezin li benda te ne!

Topal Eli : Ser serê min quman dan efendi!

Topal derdikeve derve. Demeke kin şunde, Pala Omer bi lez dikeve hundir.

Pala Omer : Yuzbaşî, yuzbaşî!

Yuzbaşî Salih : Ci ye, ci ye?

Pala Omer : Kulek (Topal) xayîn e! Ji bo terorîstan dixe bîte! Qur'an!

Yuzbaşî Salih : Bêje, Pala.

Pala Omer : Min bi çavê xwe dît. Nîvê şevê, ji mala kulek derketin.

Pala Omer : Qusura min nenêrin! Mîza min hatibû. Tava hîvê hebû. Nêzîkê mala Topal ez sekinîbûm. Min dît ku deriyê wan vebû. Jîna Topal, kûrê wî û çar zilam derketin. Ber derî sekinîn. Pista pista wan bû. Di navbera xwe de hêdî hêdî şte-xilîn. Paşê, yek bi yek himbêz kirin. Li ber pozê min derbas bûn. Hindik mabû ku ziravê min biqete. Ji bo ku diranên min li hev nekevin û deng nekin, min destê xwe gez kir.

Yuzbaşî Salih : Bi kîjan alî ve çûn?

Pala Omer : Wele min ji tîrsa xwe serê xwe ranekir. Dema min se-re xwe rakir, tu kes nemabû.

Çawîş, Topal tîne hundir.

Yuzbaşî Salih : Topal, ezê te bîdim ber gulla û bikujim! Na, na, ezê te bi kéra kor şerjê bikim. Leşker!



Çar, na na, bîst mirov bûn! Ser û bînê wan hemû çek û rext bûn!

Yuzbaşî Salih : Leşker!

Çawîş : Ferman ya te ye!

Yuzbaşî Salih : Here Topal big-re! Jina wî, xwesiya wî û kûrê wî jî bînin.

Çawîş : Ferman ya te ye, quman dan!

Yuzbaşî Salih : Rûne Pala, ji serî ve careke dî ji min re bêje! Nîvê şevê, ci karê te li derve hebû?

bû. Ji mala te derketin. Çar mirov bûn. (*Li yuzbaşî vedigere*) Na na, bîst mirov bûn.

Yuzbaşî Salih : Tu ci dibêjî Topal?

Topal Eli : Welle xebera min jê tune, qumandan efendî!

Yuzbaşî Salih : Lo çawa xebera te ji mala te tune?

Topal Eli : Welle musade bike, ezê ji Xecê pirs bikim û bêm.

Yuzbaşî Salih : Tu xwe aciz neke, Topal. Xecê dê ji xwe bê!

Çawîş; Xecê, kurê wê û diya wê tîne hundir.

Yuzbaşî Salih : Milîtana mî, hele were, were...

Topal Eli : Xecê, kî hatine mala me?

Xecê : Ji te re ci ye?

Yuzbaşî Salih : Bes e, bes e! (*Li*

Zinêr vedigere) Ka tu bêje, yên ku hatine mala we kî bûn?

Xecê : Kurê min berde, tu su-cê wî tune ye. Hîn zarok e ew. Sucê Topal ji tune. Wî ji berdin.

Yuzbaşî Salih : Baş e, nexwe ji min re bêje. Suc yê kî ye, yê te ye?

Xecê : Erê! Suc yê min e. Ew ên ku hatin mala me, qaçaxçî bûn, tucarên sînorê bûn. Xebera mîrê min jî, ji vî karî tune.

Yuzbaşî Salih : Tu nikarî min bixapînî, keçê! Ez hemû qaçaxçîyan nas dikim. Tu derewan dîki. Hemû bi ïzna min têñ û diciñ.

Topal Eli : Bênamusê! Te şerafa min kir pênc pere! Te em rezîl kirin!

Dapîr : Şerefa ci? Ma te şeref heye, Topal? Tu seyekî belengaz û parsekirî yî... Xwedê rûyê te reş bîke, lawo!

Yuzbaşî Salih : Baş e, baş e. Min fêm kir. Tu derkeve derve, Topal. Emê karê xwe bi Xecê ve pêk bînin.

Topal derdikeve derve. Yuzbaşî li Xecê vedigere)

Yuzbaşî Salih : Eêê, Xecê xânim. Ji min re rastiyê bêje. Xwe amade ke, ezê ci bînim serê te, niha tu dê bibînî. Ezê ruhê te derxim. Ezê te

hêdî hêdî bikujim.

Zinar : Bela xwe ji diya min veke! Dûr bimîne ji diya min!

Yuzbaşî Salih : Binêrin vê bêjiyî! Kuro, ku ez bêm te bixwim, tu li ber diranên min jî navevi. Bisekine, nexwe ezê te bikujim.

(Xecê xwe davêje ser kurê xwe, dike ku ji destê yuzbaşî derxîne.)

Xecê : Lawo, kûrê min berde, hîn zarok e ew!

Yuzbaşî Salih : Hey lê! Tu ne jin i, tu şerî, şerî!

Dapîr dikeve navbera wan, bi çengê Xecê digire û dikişîne.

Dapîr : Kurê dêlê! Emê biçin keçê! Dema bêriyê ye! Dema bêriyê ye, em biçin pezên xwe bidoşin lê!

Yuzbaşî Salih : Leşker! Vê piştqûvê bavêjin derive!

Leşker bi mîlê Dapîrê digire û bi ber xwe ve dikişîne.

Dapîr : Here ji wê derê, kûcikê pîs! Ji min dûr bikevin lawo! Ezê kezeba we derxim ha! Çawîş dapîr tîne derive. Dapîr ber derf ji Topal re) Yuzbaşî dê jîna te bistîne, ha? Te jîna xwe teslim kir, tu hafî ber derî rûniştî!

Yuzbaşî Salih : Wê jînikê bibin! İfada wê baş bistînin!

(Leşker Xecê dibe hucreyê. Yuzbaşî li Zinêr dizivire. Pêş lê dixe bîte ku bi xwestî Zinêr bide axaftin. Gava bi ser navevi, dest davêje îşkenciyê. Zinar ji xwe diçe.

Piştî îşkencê, Topal dikeve hun-dir.)

Topal Eli : Ez qurbana te me, qumandan efendi! (Pala Omer : Ez jî...) Bihêle ez bipeyim! Ezê ifadeya wan bistînin...

Yuzbaşî bi ken lê dinêre.

Topal Eli : Ez bibim xulamê te,

qumandan efendi! Ez seyê ber deriye te me! (Pala Omer : Ez jî!) Bihêle ez hel bikim! (Yuzbaşî, bi dengekî bilind dikene) Saetekî, qumandan... Ma dê çi be? Saetekî...

(Yuzbaşî pariye dikire. Paşî...)

Yuzbaşî Salih : Leşker! Topal dê xîsusî biştexile. Ji wan re odekî bas hazir bikin!

Çawîş : Ferman ya te ye!

Yuzbaşî Salih : Lê, eger tu nikarî wê bidî peyivandin, emê wê bidin me-



metçik, te fêm kir?

Topal Eli : Xwedê ji te razî be, qumandan efendi... Min baş fêm kir.

Yuzbaşî Salih : Ez diçim kurê min. Vê jînikê bînin. Bila hersê ji li vê derê bimînin. Derî ji li ser wan bigrin. We fêm kir?

Yuzbaşî derdikeve. Çawîş, Xecê tîne.)

Çawîş : Ji we re cih û livînan jî bînim, he?

(Çawîş derdikeve derive. Derî ser wan digre.)

Topal Eli : Bipeyive Xecê. Ez bîne lingê te maçî dikim, bipeyîve! Te ez şewitandim, Xecê, te şerefa min anî pênc peran...

(Xecê bersiv nade.)

Topal Eli : Ez qurbana te bim, Xecê... Ger tu nepeyiî, dê Zinêr bikujin. Dê te jî bikujin. Tu namusa min i, Xecê.

(Topal li ber Xecê çok dide)

Xecê : Bênamus! Dest nede min! Here xwe bavêje ber lingê efendiyê xwe!

Topal Eli : (Li Xecê dixe) Biçeyîve, kurê xwe xilas ke, xwe jî xilas ke, min jî xilas ke! Ez ketime bextê te, Xecê! Bêje, gerîla li ku ne, dê cardin kengê bê?

(Topal lêdanê didomîne. Di dawî de Xecê bê liv (hereket) li erdê dimîne. Deng ji Xecê nayê.)

Topal Eli : (Bê çare) Qumandan dê pere bide me. Dê li bajêr ji me re xanî jî bikire. Emê dewlemend bin Xecê, pir dewlemend! Bila xulamên te jî hebin. Tu dê destê xwe ji ava germ nekî ya sar! Zinar jî dê bixwîne, wê bibe zilamekî mezin. Belkî jî bibe wezîr. Belkî ji quman dan jî mezintir be!

(Topal derdikeve derive. Yuzbaşî tê sahnê.)

Yuzbaşî Salih : Wê ji vê derê bîbin! Wan bînin ser hişê xwe! Na, na, ne li vê derê, rakin!

(Leşker û Pala, Xecê û kurê wê radikin dibin.)

Yuzbaşî Salih : Topal li ku ye?

Pala Omer : Ew weke dînan ber bi mala xwe ve diçû... Min tu car ew wiyo nedîtibû... Welle, ew bêşuc e... Ci kiriye, xwesiya wî ya piştqûv, jîna wî kurê wî kirine.

Yuzbaşî Salih : Wisa ye, ha, Pala?

Pala Omer : Neyrukên wan rakin! Çavêwan derxin! Bila bizanî!

Yuzbaşî Salih : Emê wiyo çêkin, ha, Pala?


Pala Omer : Du jîletan bavêjin rûyê wan, binêrin çawa weke bilbilan biseqin!

Yuzbaşî Salih: Tu dê karê min nîşanî min bikî? Kuçikê pîs! Ezê sinetê (karê) xwe ji Kurdê pîs ê weke te bî elimim? Dengê xwe bibire! Here ber derî weke seyê bisekine!

Çawîş : Bi ser hişê xwe ve hatin, qumandan!

Yuzbaşî Salih: Sorguyê dom bîkin! Lê dibe ku wextê me gelek ne-maye...

Xecê: Bênamusno! Xwînmêjno!



(*Topal disa tê sahnê. Di destê wî de pakêtek heye.*)

Topal Elî : Qumandan, vaye hemû tiştên me li vê derê ne, bila ji we re bin! Jina min berdin... Hûn ci bix-wazin, ezê bikim! (*Deng ji qumandan demakeve.*) Ez hêvî dikim, qumandan... Van tiştan bigrin. Hemû tiştên min li vê derê ne! Bazinê min, meşen min û zêrên min! Mala min ji, ji we re be! Pezên me, genîmê me, hemû di nêv leşkerên xwe de belav bikin!

Yuzbaşî Salih: Çekê xwe dane ser masê! Bênamusê Topal! Paşê, hîna min tu nekuşti, here ji vê derê!

(*Topal disekine. Naxwaze ku sile-hê xwe teslîm bike.*)

Yuzbaşî Salih : Ez ji te re dibê-jim, xulam! Çekê xwe teslîm bike! (*Topal çekê xwe datine ser masê.*)

Yuzbaşî Salih: Pala, ji vir pey de serokê qorıcıyan tu yi!

Yuzbaşî Salih: Ji ber çavê min here, kuçik!

(*Topal derdikeye derve. Pala jî, li du wî derdikeye. Pala wî birîndar dike, pere û xîşrên Topal jê distîne û tîne dide yuzbaşî. Yuzbaşî ji vê perê hezarek dide Pala.*

Topal, bê pere, bê namus, bê şeref û bê ruh maye. Her tiştê xwe hunda kîriye. Ji lewre, biryar dide ku qereqolê bişewtîne. Vî karî dike jî.

û ges dibe
û yet dibe hezar,
li axa Kurdistanê ya delal
wilo
ez wilo ges dibûm...
Ez niha li rojê dinêrim
û şikir dikim.

Di wî agirî de
min kurê xwe winda kir
Zinarê min ê çavbelek
Hîv li rûyê wî bû
gol û çem hebûn di xewa wî de
mîranî hebû di dilê kurê min de.
Ew, wek bavê xwe ne kole bû
Bêdeng, lê serhişk bû...
Di wî agirî de
min kurê xwe winda kir
Ez niha li rojê dinêrim û pirs dikim:
Tu li ku yi, kurê min?
Tu derketî ji nav pêta agirê bilind
Tu karî xwe xilas bikî
ji ber libêñ çekan?
Tu karî xwe bidî himbêza
çiyayêñ Kurdistanê yêñ dêlal?
Tu gihayî şervanêñ serbilind,
Zinar?

Tu li ku yi?
Ez li rojê dinêrim
û pirs dikim...

Ez niha li rojê dinêrim
û pirs dikim...
Tu kes dengê xwe nake
Zindan bêdeng e
Zindan naşteixe...

Zindan...
Zindan kokek e di nêv axê de
Zindan kokeke mezin e
Ku ew zinaran hûr dike
Ku ew hesinî xwehr dike...

Di zindanê de, minzanî ku
ez kokek im,
Ez, dayê Xecê
Min gelek êş kişand
Di beriya min de jî,
gelek qehr hat kişandin
Kurên min ên gelek
zana û mîrxas
Li van deran hatine kuştin
Şewitandin laşen wan
Ü paşê helandin libêñ çekan,

Çawîş : Agir girt qereqolê! Tero-rist, terorist!

Perdeya Diwemîn Sahneya Yekemîn

Xecê li girtîxanê, di hucreya xwe de ye.

Xecê:

Ez nepeyvîm. Ez nepeyvîm.
Niha ez li tavê dinêrim

û şikir dikim.

Ji ber ku min ji wan re negot,
cihê kurên xwe yêñ delal

û ciwan...

Berê, ez gelek tenê bûm,
Min çiqas ber xwe dida,

ez ewqasî ges dibûm,

Tovek çawa ku ber xwe dide,
di bin berfê de,

di bin bager û brûskan de
û paşê çawa vedibe, dema bihar bê

bi agirê laşen wan!...

Wisa, min ew dîtin

Dema min ew dîtin, şîr tiji bû
di çîçikên min ên ziwa de
Û stûyê min ê pîr,

bi ser xwe ve hat

Ew cavê min ê ewrgirtî,
dinyayê çêtir dît.

Niha ez li rojê dinêrim
û li benda wê me
Kengê, serkeftin kengê ye?

(Bêhndanek... Leşkerek diqîre:) Xecê Şîrvan, mîvanê te heye!
Leşker Dêpîr tîne ber deriyê hucre.

Dapîr: Hemî tişt ji hesinê ye. Li vê derê, ax tune ye. Xecê, Xecê, keça min. Ev der çiqas tarî ye? Ev zilam ziman nizanin. Ne welê ye?

Xecê! Tu çima naştexili?

Xecê: Yadê, tu bi xêr hatî.

Dapîr: Xêra zindanê ci ye, keçê?
Ev cihenema bin erdê, kî bi xêr tê vê derê?

Xecê: Tu bi xêr hatî, yadê, tu bi xêr hatî. Li gund ci heye, ci tune, ya-dê?

Dapîr: Qet nepirse! Kulek eqlê xwe winda kir. Tu kes nanêrî li rûyê wî. Bihar hat. Wê zêvî çawa bin, tu kes nizane. Ji maliştina gomê, pişta me quloz bû. Ez gelek pîr im, Xecê, gelek pîr im.

Xecê: Ezê derkevîm, yadê. Di nêzik de.

Dapîr: Gava ku tu zarokê xwe bî-nî ser dinyayê. Tu tenê yî. Kî li te mêze ke?

Xecê: Ez ne tenê me. Heval li vir hene. Ew li me mêze dikin û mane hêviya ku zarok bê ser dinyayê. Ew, ji hemu kesî pirtir hez dikin ji wî zarokê.

Bêrîvana Girtî: Pîrê, me navê wî jî danî.

Şevîna Girtî: Me paçen wî, ji cilê hevalên şehîd çêkir.

Dapîr: Tobe, tote!... Ji cilê miriyan paçen zarakan çenabin, qîza min. Guneh e, xisaret e...

Xecê: Ev ne ji wan miriyan in, yênu ku tu dizanî. Ev şehîd in. Yanê,

ev ji bo jiyanek nûh dimirin. Yek ji wan jî, li ser cihê xwe nemirine. Laşen wan ne li vê derê ne, lê ew sax in. Tu dê navê wan gelek bibihîsî. Li Kurdistanê, hemu kes navên wan li zarowên xwe danîne. Ev şehîdên ha, ji min û te pirtir sax in.

Heval ji min re behsa Mazlûm di-kin. Min ew tu car nedît. Lî min di xewna xwe de ew dît. Di nêv kefa destê wî de piling û pelê agirî hebû. Ji min re digot, "ha ji te re, ew tifika (ocak) te ya temirî cardin pêxe". Laşê wî bilind û delal bû. Ew bi rastî sax e, yadê.

Dapîr: Erê, erê sax e.

Şevîna Girtî: Emê navê zarokê Mazlûm deynin.

Dapîr: Sê caran navê wî di guhê wî de bêjin. Bila bielime navê xwe û jê hez bike.

Leylaya Girtî: Ew jî, dê bibe gerîla. Hîn ew naelime axaftinê, ewê bie-lime rext û çekan.

Xecê: Zinar? Te ci xeber jê si-tend, yadê?

Dapîr: Ne ew bi xwe, ne jî cendekê wî dîtin. Tu guhê xwe bide min, ew sax e, Xeca min. Miriyê we sax in, çima Zinarê min ê panzdeh salî ne sax be? Ez dizanim, cihê ew lê ye, gelek xweş e. Ew bi xwe jî, gelek baş e. Meraqa wî neke, keça min.

Bêrîvana Girtî: Ew di nêv gerîla-yê de ye.

Şevîna Girtî: Ew niha bûye gerîla-yekî baş. Ew eqwasî jîr e ku, ji wî qeqola mezin reviyaye...

Dapîr: Bo we hebe tunebe, hemu gerîla ye.

Xecê: Erê. Hemu tiştên me gerîla ye, yadê.

Dapîr: Erê, erê. Tu jî gerîla yî.

Xecê: Erê. Ez jî dê bibim gerîla. Ezê hemu tiştên xwe bidim gerîla.

Dapîr: (Dikene) Tişték te nemaye tu bidî gerîla. Te zarokê xwe yê ku nû bê ser dinyayê jî, ji bo gerîlayê kiriye qurban... (madê xwe tirş dike) Te zarokê xwe kiriye qurban.

Leylaya Girtî: Erê, qurbana Kur-distanê.

Berîvana Girtî: Qurbana çiyayên Kurdishanê.

Xecê: Zarokê min dê wek kole bê ser dinyayê. Lî, ez gelek baş dizanî, ez bawer im, dê azad bimire.

Dapîr: Qîzê, hê nehatiye ser dinyayê, behsa mirinê neke. Guneh e.

Leşker : Bes e, bes e! De derke-ve!

Xecê: De here yadê. Dereng ne-mîne. De here.

Dapîr: Temam, ez diçim. Hay ji xwe hebin. Li xwe baş binêrin. Bişev deriyê xwe bigrin. Nehêlin vekirî. Ka em lê binêrin, heta sibehê, xwedê li me ci deriyê videke.

(Dapîr diçe. Sahne nîvetarî dibe.)

Xecê xewn dibîne.)

Xecê: Zinar, were, Zinar.

Xecê: Zinar? Lawo Zinar... Min tu hîn neanî li ser dinyayê. Ez hîn gelek ciwan im. Hîn hevde salî me. Zinar, ev ci ye? Ji min re bêje. Çima wilo hat? Zinar, ez hê keç im. Min tu çawa anî ser dinyayê?

Zinar: Wilo neştexile dayê... Di-vê tu wilo neştexili. Te çawa ji bîr kir? Li biharê, dayê. Ez bi xencera xwe ve hatibûm ser dinyayê. Binêre, bi vê ve.

Xecê: Xencera serhildanê.

Zinar: Xencera min, Xecê.

Xecê: Te çima ew dizî, Zinar? Ev ya kalê te bû.

Zinar: Kalê min? Ew dabû min.

Xecê: Zinar, wilo neke. Daşoka te hebû. Tenê dasoka te hebû. Te dê genim biçanda. Te dê zeviyê me şin bikira, Zinar. Binêre, bihar hat. Tu kesê me tune.

Zinar: Pêşî şer, paşê ezê genim biçinim.

Xecê: Were vira, kurê min. Were vira.

Zinar: Pêşî ewd û heyf... Paşê ezê ji keviran xaniyên mezin çêkim.

Xecê: Xaniyên ji keviran, xaniyên honik, Zinar

Zinar: Pêşî şer... Pêşî şer...

Xecê: Zinar, neçe! Me nehêle te-nê, Zinar!

Zinar: Ewilî şer.

Xecê: Zinar!

Xecê: Zinar, xwîn ji rûyê te tê!

Sahne tarî dibe.

Dumahîk heye

SEYÎD YAQUBÎ MAHÎDEŞTÎ^(*)

1808-1881

Ehmed SERÎFÎ

Seyid Yaqub Kurî seyid Weys, le salî 1801, le gundi qemşeyî -Mahîdeştî Kırmaşan- le dayik bûwe.

Bine maleyî Seyid, le kurdekanî yarsan (ehlîheq) bûn. Le dewran û çaxî lawî û gencî da hatote kırmaşan û bote katib û nuserî Eymamqûli Mirzayî iymaduldewleyî Dewletşa hâkimî Kırmaşan û paşa. Çûtekin Mihemed Hesenanî Kelhurî serokî éli (hozî) Kurdî kelhur û heta diwa rojî jiyanî her le wé jiyawî. Serencam, le salî 1881 koçî diwayî kirdiwe û le awâi qemşê teslîm be xak kirawî.

Seyid Yaqub dengekî yekcar xoşî hebuwe û tenbûrjenekî karameş buwe. Seyid Yaqup be zarawey Goranî (hewramî) şûrî gotowî û dîwanekîy le salî 1982 le layen kak Mihemed Ali Sultanî li Kırmaşan, le 104 la pêreda çap û bilaw bûtewî.

Şûrî zahîd heramen yekek le cuwantirîn şûrekânî Seyid Yaqub e.

ZAHÎD HERAMEN

Zahîd heramen, zahîd heramen
Zahîd zindeftî, we tû heramen
Ne şoret we ser, ne pait we damen
Ne hergiz Meclîs, eyşet meqamen.
Merd moemem reda we duşî
Teqwâ û taetkar peşmine poşî
Mescîd nişînî dûr le basanî
Bé xewer ji nîş muje xasanî
Temaşayî ebroyî xem nekirdenî
Ji wexim û qamet çem nekirdenî
Temaşayî dîde bazet nekirden
Dîdeyî baz naz gazet nekirden
Seyr nekirdenî gonayî gulmarî
Aya, nît ji suzî derdî dildarî
Ji rayî derd eşq gumrahît niyen

*Surahî we dest niyen
Emînit niyen we taregewe
Nazar we aheng qetaregewe
Suleyman û soz kemançeqewe
Ziyreş mewerd dil we xeşewe
Penceyî (seymame) Tirkeyî Temur
Neximeş dil mekî we laneyî zemur
Naleyî Mutriban nekerdenî goş
Mirdeyî yek rojek bikey feramos
Perîzad bew sewt culbane we
Nergis wew balayî menalanewe
Fatime û Temer naleyî hey hela
Xalî dewrî naf nermevî penceyîpa
Xanim (mehîn) bew qetarewe
Eysmet bew aheng konarewe
Xesus çeqwaneyî dest rezayî
Ne reqs Farsî û çopî kezayî
Hergiz nenîş zahîd ne laşan
Nama ne goşit deng helaşan
Aminet ne dîn wew nazeqewe
Xunçe wew yeqey nîm bazişewe
Kizeyî kemançe ne şinefîti we goş
Nîkî û bedî bikey feramos
Weqten bewînî ahoberewe
Mexîzut we tû yek xeyat perewe
Eger binîşî û biginewî we goş
Heq perestî ûmît mekey feramos
Sedayî nazaran çû helqe ha goş
We naz muwaçan bisane wî binoş
Badeyî Cemşîdî nekerdenî noş
Xusirewsra mexizî gelet bedeî coş
Er tu wéneyî min î gişt esasan
Temaşa kirdî newît herasan
Le ew bezimgahe hercasan newît
Ser sucdeyî berdeyî xal xasan newît
Ewsa mezanîm heq percestenî
Le heq percestan bala destenî
Her çend tû surit le min bîşiteren
Sewdayî eşqî tû wéneyî neşiteren
To bîşiter xayal süm û selaten
We bî taqetî mescîd mawaten
Lew bûne mescîd meawa û maliten*

*Xeyal layî heq zûelcelaliten
Mescîd kerdenî we yataqxane
Zikirî kerdigar bîn behane
Sugendem we taq hucreyi diltengit
We péc destar xalî ji rengit
Raî rewa û encîr kerdenî we pés
Zahîd to gurgî hayî ne celdî més
Mer min wéneyî tû wîm penhan
kerden
Mescîdem mayeî aw û nan kerden
Dîdem we pékut û dîdeyî xasan
Niğasân bikem biwîm herasan
Her kewîm ji dîn dîdeyaranim
Minîş ji cumleyî taatkaranim
Heqperestî min ji to ew seren
Min û wer tu camî hewz kewseren
Eme û tû we yek mekîm melamet
Edeyî her dû man roj qiyamet
Her dû metaman megirim wedes
Nîkî û bedî mebo müşexes
Herkes le dil daşt taqetkar niyen
Taquet nedaris taetkar niyen
Yek zere taqetseburîs niyen
Taquet hîcirân mehcûris niyen
Tû we tesbih zikirî zucelalewe
Min wî tureyî zulf dane û xalewe
Tû we amame û burd barî
Min we dest cambadeyî gulnarî
To we qarnet zikir nemazan
Min we qed qarnet kemend endazan
To hayt we pileyî mîhrab û minber
Min we pileyî çûn zulfan enber
To taq mîhrab bêna perdxate
Min taq ebroyî heq ji mǖ saxte
Me girîm we des her dû metaman
Muşexes mebo fezî û guna man
Eymro rahe tû ders eymanen
Ferda mezanî heq we kî manen
Ewsa xelq û Ella nû dem şehûden
Heq we (seyid Yaqub) ya we zahûden*

* Be zarawayî hawramanî-Goranî

DANASINA PIRTÜKAN

Hotay Serra Usivê Qurzkizi

Cemil GÜNDÖĞAN

Hotay Serra Usivê Qurzkizi (Qurz'lu Usiv'in Yetmiş Yılı) Münzür Çem'in geçtiğimiz yıl İsveç'te Roja Nû Yaynevi tarafından yayınlanan kitabının adı.

Adından da anlaşılacağı üzere kitapta Qurz mezarı {Bingöl'ün Gexi (Kiğı) ilçesine bağlıdır} sakinlerinden Yusuf adlı bir Kürdün yaşam öyküsü anlatılmaktadır. Daha doğrusu, kitabıń kahramanı kendi hayatını kendi ana dilinde anlatmış, yazar da bunu kağıda dökmüştür. Bu anlamda kitap yarı belgesel niteliğe sahip bir çalısmadır. (*)

Kitabıń kahramanı, Dersim tarihinin canlı tanıklarındandır. Bu bağlamda çocukluk ve gençlik yıllarına dair anıtları, 1920'lerin ve 30'lardan Dersim'inin dikkat çekici tasvirleriyle doludur. Hiç kuşkusuz, bunların içinde okuru özellikle cezbedenler, 37-38 Dersim katliamının öyküleniği bölümlerdir.

Qurz'lu Usiv, vahşeti bizzat yaşılmıştır; ve kitabıń herseyden evvel, bu önemli tanıklığın belgesidir. Okuyanlar, Dersim'in direnen kahramanlarının yanısına, ulusal hainlerini, kitleler halinde kırılan yoksullarını, ırzına geçen kadınlarını, süngülünen bebelelerini, işleri bittikten sonra işkence ve zulümle öldürülen işbirlikçilerini tanıyalacak; yoksulluğu, açlığı, kılığlığını, aşiret kavgalarını... göreceklərdir. Ki-

sası kitabıń, son yıllarda sayıları haly azalmış olan 38 kuşağının anıtlarından hiç olmazsa bir bölümünü mezarlarım derin sessizliğine karşı güvenceye almaktır, o günün Dersim'ine ait toplumsal, siyasal, kültürel bir çok görüngüyü ham malzemeler şeklinde sunmaktadır. Ve bu özelliği kanımızca kitabıń en önemli yanlarından birini oluşturmaktadır.

Ama yine de bazıları bu kadarını çok önemli, değerli ya da nadir bulmayıpabilirler. Bu nedenle biz, kitabıń bir başka özelliğine de ğinmek istiyoruz. Ki, kanımızca bu, onun, üzerinden atlanmayacak bir özelliğini oluşturur. Bizce, bu kitabıń üzerinde en fazla durulması gereken özelliği, Zazacanın Dersim ağıyla kaleme alınmış bu çap ve içeriğeki ilk kitabıń olmasıdır.

Zazacanın Dersim ağıyla yazılı ürün vermek yeni bir olay değildir. Ancak ne yazık ki, şimdije kadar ortaya çıkmış olanların sayısı çok sınırlıdır. Ve bileybildiğimiz kadariyla kitabıń haline gelebileneń de bir-iKİ taneyi aşmaz. Dahası bu ağızla yazılmış olan eserler, ya şiir gibi kurgulu uzun nesre yer vermeyen, veya folklor derlemesi türünden aktarma karakteri ağır basan çalışmalardır. Ve hacim olarak da tanıtma oldugmuz çalışmadan küçüktürler. Dolayısiyla, belirli bir aktarma karakteri taşısa da, M. Çem'in çalışmasını Der-

sim ağızının sistemli nesir alanındaki ilk uzun metrajlı çalışması saymak yanlış olmayacağındır.

Ve belirtmeye gerek yok ki, ilkler daima önemlidir; üstünde durulmayı gerektirirler. Çünkü sürecin geneli açısından küçük bir adım gibi görünse de, aslında bir sıçrama anını temsil ederler. Kanımızca M. Çem'in kitabı da Dersim ağız açısından böyle bir anlama sahiptir. Bu nedenle Kürt aydınlarının ilgilenmeleri gereken bir metin durumundadır.

Tam bu noktada, Zazacanın okunup yazılması ve geliştirilmesiyle ilgili bilinen tartışmalar geliyor akla.

Bilindiği gibi, yurt dışındaki bazı Kürt mültecileri, bir süreden beridir, Zazacanın Kürtçeden ayrı bir dil ve Zazaların da Kürtlerden ayrı bir millet olduğu yolundaki bir düşünceyi yaygınlığıtmaya çalışıyorlar. Hiç kuşkusuz, bu türden düşüncelere yatkın duran insanların tamamı varolan ulusal hareketi hançerleme niyetiyle böyle hareket etmiyorlar. Bazları bilgi yetersizliğinden, diğerleri ise konuya yaklaşımındaki yöntem yanlışlarından, veya moda fikirlere karşı olana zaaflarından ötürü böylesi düşüncelere itibar edebiliyorlar. Bunu anlamak zor değil. Ancak bu tür fikirlerin, her zaman böyle "masum" nedenlerin ürünü olmadığı da bir başka gerçek. Bunu, herseyden evvel, sözkonusu tartışmanın tam da Kürtlerin

(*) Kitabıń iç kapaǵında "Roman" ibaresi bulunsa da, yazar Malmisanij'in da belirttiği gibi, kitabıń romanla bir alakaşı yoktur. Bkz. Malmisanij, "Övgüye değer bir kitabı: Hotay Serra Usivê Qurzkizi", Azadi, Sal: 1, Hejmar: 21, 10 Ekim 1992

kendi tarihlerinde ilk kez modern bir ulus tavıyla sömürgeciliğe karşı dikildiği bir dönemde başlatılmış olması gerçekleşinden anlıyoruz. Açık ki, bu tartışmada Kürt ulusu içinde alevi-sunni bölünmesine benzer yeni bir zaafiyet unsuru yaratmayı amaçlayan mihrakların da katkıları var.

İşte sorun tam da bu noktada ortaya çıkıyor. Bazı Kürt aydınları ve yurtseverleri, devletin bu oyunun içinde olması gerçeği karşısında duydukları öfkeyi, genel planda Zazacaya karşı bir tepkiye dönüştürüyorlar. Bu gibilerinin bazen açıkça bazen de imali biçimde söyledikleri şey, Zazacanın ölü bir dil, bu dili geliştirme çabasının da boş bir çaba olduğunu. Dahası tepkilerinde aşırıya varanların bir kısmı da, bu tür çabaların, istense de istenmese de, sonuçta, düşmanın suni Kürt-Zaza ayrılığı yaratta ugraşısına kan vereceğini düşünmekte.

Kanımızca bu tür düşünceler doğru değildir. Hatta tam tersine, sorun karşısında böyle tepkisel çıkışlarla hareket edilirse, asıl o zaman devletin tezgahlığı oyuna düşme tehlikesi belirecektir. Bu nedenle Kürt aydınlarına düşen, Zazacaya karşı ilgisizlik ve tepki değil, tersine ilgi ve sahiplendirme olmalıdır. Zazacayı bilmeyorsak öğrenmek, biliyorsak sorunları üzerinde kafa yormak, Kürtçenin diğer lehçeleriyle ortaklığını geliştirmek vb. gibi görevler herhalde başka ülkeerin akademisyenlerinin değil, bu ülkenin aydınlarının görevi olmak durumundadır.

Ne yazık ki, Kürt aydınlarının bu görevi yeterince bilince çıkardıklarını söyleyemiyoruz. Aydınlarımızın Kurmançı karşısındaki sık sık yakındığımız ilgisizliği ve yetersizliği, Zazaca için de geçerlidir. Şu farkla ki, ilgisizliğin boyutu, burada bir kaç kat daha artmaktadır. Dahası, Kurmançı'ye karşı az-buçuk duyarlı davranışabilen aydınlarımızın dahi, Zazacaya karşı her zaman aynı hassasiyeti gösterme-

dikleri ve hatta bazen de Zazacaya teden baktıkları görülmektedir.

Ulusal kurtuluş davasına zarar veren bu tür davranışların sebeplerini ortaya koymak başka yazıların konusudur. Ancak burada değinmeden geçilmeyecek bir nokta var ki, o da düşmanın, bu ilgisizliği ve kücümsemeyi ulusal harekete karşı siyasal tepkiler şeklinde örgütlemeye çalıştığıdır. Baskı altındaki bir dilin sahiplenilmesi ve savunulması gerektiği yolundaki ilkesel nedenler bir yana, salt bu siyasal tehdit bile Kürt aydınlarının Zazacaya karşı mevcut durumlarını gözden geçirmelerini zorunlu kılmaya yetter.

İşte M. Çem'in çalışması, tam da bu noktada önem kazanmaktadır. Çünkü Zazaların Kürtlerden ayrı bir ulus olduğu şeklindeki safsatalara itibar etmeksızın, Zazacayı sahiplenmeye ve elinden geldiğince geliştirmeye çalışmaktadır. Dahası, bu çalışma, yukarıda sözü edilen mülteci yazarların iddialarının tersine, Dersim ve yöresi Zazalarının geçmişten bugüne kadar kendilerini hiç bir şekilde Kürtlerden ayrı bir topluluk olarak tanımlamadıkları gerçeğini ortaya koyan bir çok veriyi de sergilemektedir ki, bunlar, aslında, yukarıdan beri işaret ettiğimiz tartışma ve tezlere olumlu yönden sunulmuş birer tarihsel kanittır. Çünkü okununca görülürcektir ki, Dersim'in adeta canlı bir tarihi olan Usivê Qurzkızı, sömürgecilerin teşvik ve tehditleri sonucu kendilerine "öz Türk" diyen milli hainler dışındaki Dersim'li geniş kitlelerin kendilerini her zaman için Kürt kabul ettiklerini ve bu uğurda kanlarını akitiklarını tarihin tanıklığında ortaya koymaktadır.

Bütün bunlar kitabın olumlu yanlardır ve sayıları daha da arttırılabilir.

Fakat "ilk olmak" kitaba sadece olumlulıklar katmıyor; doğal olarak, bazen de yanlışlara ve dezavantajlara kaynaklık ediyor. Örneğin dizgi ve

düzeltilti (tashih) hatalarındaki kabarıklık, ilk olmayla ilgili bir sonuç gibi görülmektedir. Fakat bazıları bilgisayar yetmezliklerinden kaynaklanır görünen bu tür hatalar, gene de hoş karşılanabilirler. Çünkü tecrübe biriktikçe aşımları imkan dahilinde dir.

Üzerinde asıl durulması gerekenler, dil ve imla alanındaki sorunlardır ki, bir örnek vermek gerekirse, Zazacada daha çok sıfatlarla tanımlanmış kelimelerdeki belgisizlik durumlarını analatmadada kullanılan de ekinin (**) yazılışının gösterebiliriz. Bu ek, kitabın başından sonuna kadar hiç bir kurala bağlı kalınmaksızın, ilgili kelimeyle kah bitişik, kah ayrı olarak yazılmıştır. Bu karışıklığın ve gevşekliğin sadece dikkatsizlikten kaynaklandığını söylemek, herhalde ikna edici olmayacağındır. Sanız bu sonuçta, konuya ilgili oturmuş bir kuralın olmayacağından da bir rolü vardır.

Zazacanın henüz ana hatları ortaya konulmuş bir gramere ve imlaya sahip olmadığı bilinir. Bu nedenle M. Çem'in gibi çalışmalar, bir yanıyla da bu tür eksikliklerin giderilmesi yönündeki ilk adımları oluşturuyorlar. Ve ilk olmak, bu gibi konular söz konusu olduğunda çok çok daha büyük bir önem taşımaktadır. Çünkü ortaya konulan kural, tercih ve eğilimler, doğru ve yanlış, uzun vadede etkide bulunacaklardır. Bu nedenle ilk adımların koşulların elverdiğince doğru ve az eksikli atılması gerekiyor. Bunu sağlayabilmenin yegane koşulu ise, konunun tek tek kişilerin çabalarına terk edilmemesi, sahiplenilmesi, eleştirilmesi, alternatifler sunulması, ortaya sorular atılması, kicasası, tartışarak katkıda bulunulmasıdır. Bu noktada, dili şu ya da bu düzeye bilen herkesin söyleyebileceği birşeyler mutlaka vardır ve bunlar söylemelidir. Yanlışlar, ancak böyle zengin katkılar olursa asgariye indirgenebilir ve görece daha kalıcı ve

(**) Örneğin, 'bonêde berz : yüksek bir ev', 'negayêde sur : kirmizi bir tarla' terkiplerindeki gibi.

kapsayıcı bir gramer ve imla ancak bu yolla oluşturulabilir. Bizce kitap bu konuda da önemli bir fırsat sunmaktadır.

Öte yandan bu kitap, Zazaca öğrenmek isteyip de malzeme yetersizliği nedeniyle bunu gerçekleştirmede zorlanan kişiler için de bir fırsat olabilir. Çünkü bütün yetersizlikleri bir yana, bu gibilerinin üzerinde çalışabilecekleri genişçe bir malzeme sunmaktadır.

Bu noktada, toplamı 340 sayfa tutan kitabın ilk on sayfasını oluşturan

önsözünde Zazacanın grameri ve alfabeti üzerine yazılanlarla, son 40 sayfayı oluşturan mini sözlüğü anmadan geçmek olmaz.

Sözlük, metinde çokça geçen kelimelerin Türkçe karşılığını veriyor ve hiç kuşkusuz, bu haliyle, dili az bilen, unutmuş olan veya yeni öğrenmek isteyen okura belli bir kolaylık sağlıyor. Önsözdeki alfabe ve kısmen de gramerle ilgili açıklamalar ise, kânumızca hem Zazaca üzerine düşünenler, hem de Kürtçenin bütün lehçeleri üzerine bütünlüklü bir çalışma

yürütme arzusunda olan kişiler için mini bir tartışma teksti işlevi görebilirler.

Basımı yurtdışında gerçekleştiği için edinilmesi zorluk yaratan kitaplara ilgili bu tanıtım yazısını bir dilekle bitirmek istiyoruz: Umarız kitap, Kurt aydınlarının Zazacayla ilgili eksikliklerini hatırlatmadır ve aşmada olduğu kadar, hala bir ölçüde etkili olan bazı önyargıları törpülemede de olumlu bir adım olur.

21.2.1993 / ANTEP

AÇIKLAMA

Rewşen dergisinin 7. ve 8. sayılarında yayınlanan "Beytüssebap İsyani ve Şeyh Sait Ayaklanmasına Etkileri" başlıklı makalede bazı yazım ve tashih hataları olmuştur. Düzeltmeler aşağıdaki gibidir.

Cemil GÜNDÖĞAN

7. SAYI

Sayfa:	Sütun:	Parag:	Satır:	Yanlış:	Doğru:
5	Başlık	-	-	1924 Beytüssebap Ayaklanması...	1924 Beytüssebap İsyani...
15	2	-	19	gerçekleştirdiği	gerçekleştiği
16	2	-	21.D.not	Atatürk-92	Atatürk-87
17	2	51.D.not	8	özelliklerinden	etkilerinden

8.SAYI

5	1	3	3	ilk sorun	ilk konu
9	-	-	88.D.not	Halli-89	Halli-72
9	3	son	5	sahasıyla olmuştur	sahasıyla ilgili olmuştur
10	1	1	2	somut	somut göstergesidir.
10	1	2	3	birliği vardır	birliği var gibidir.
10	1	2	14	mahiyetinde	maiyetinde
10	-	-	99.D.not	s.434	484
11	-	-	104.D.not	s.43-73	43,73
11	1	-	1	Bütün bu spekulatif	Bütün spekulatif
14	2	2	4	operasyonlarında da yer	operasyonlarında yer
14	3	3	4	değer konudur.	değer bir konudur.
15	3	son	1	Bilindiği gibi	Yukarda anlatıldığımız üzere
15	-	127.d.not	2	Silopi-92	Silopî-91
17	1	5	7	zorlamar	zorlamalar
18	2	-	6	Ama,	Ama
18	2	-	8	İsyana,	İsyana
18	2	1	14	şeyhlere kalmıştır.	şeyhlere ve diğer geleneksel güçlere kalmıştır
18	2	son	12	"Diyyunuyun"	"Diniyyun"
18	-	-	142 d.not	çetenin	cephenin
19	2	3	1	CEMALPAŞA	CEMİLPAŞA,
19	2	-	-	MALMIŞANIJ	MALMİSANIJ
19	2	-	-	(Malmisanij-91)	(Malmisanij-91)
19	3	CEMİL PAŞA giriş	-	(Silopi-91)	(Silopî-91)

PEKENİN

Çav Bi Berê Xwe Xist

Yekê Îndarî, ji Hezro deh kilo don dikire. Dikeve rê û diçe. Li cihekî ji berfê dişemite, li erdê dikeve. Donê wî dirije, hinek don di binê firaqa wî de dimîne. Bêçare diçe malê û dikeve nav livînê. Mirovekî dî li pey wî ji Hezro diçe Îndarê. Digihîje cihé ku don lé riiyaye. Bala xwe didê, berf heliyaye û li ser avê rûn heye. Tiliya xwe lê dixe, fam dike ku don e. Mêze dike ku ji binê berfê diherike. Bi kêt berê xwe dide malê; êvarê li civatê dibêje:

- Min li cihekî kaniya doné dîtiye. Xwediyê don li mala xwe ye. Haya wî jê tune ye.
- Roja din Îndarî, bêr û kulingên xwe digrin û diçin ciyê ku rûn lê riiyaye. Bala xwe didinê, erdê dikolin. Dibînin ku şopa don wenda dibe. Dibêjin:
- Devê kaniyê xitimî. Em hinek jî kûr kin. Li gund xwediyê don pê dihese.

Tê ba wan û dibêje:

- We çi kir?

Ew dibersivînin:

- Me don winda kir.

Xwediyê don dibêje:

- Hûn tev dîn in. Min li Hezro don kirîbû. Qey diya don li pey min hat, li vir gihîste min. Min li erdê xist û berê xwe bir ser kaniya xwe.

Pif Nakim Bilûrê

Yekê Îndarî li bajêr diçe sîrkê. Bala xwe didê, yek serê jina xwe jê dike. Paşê li bilûrê dixe, jinik radibe ser lingan. Yê Îndarî gelek diheyire. Ji bilûrvan re dibêje:

- Tu wî bilûra xwe nafiroşî min? Bilûrvan dibêje:

- Heyran, li bajêr tijî bilûr in. Ji xwe re yekê bistîne.

Îndarî dibêje:

- Ez bilûra te dixwazim...

Bilûrvan bê çare dimîne û bilûra xwe difroşe îndarî. Mêrikê Îndarî, bi kêt tê gundê xwe. Gazî cînarân dike û dibêje:

- Werin ezê tişteke xerîb nîşanî we bidim.

Cînarân wî lê dicivin. Mêrik jina xwe davêje erdê.

Serê wê jê dike. Dibe qîre-qîra zarokên wî. Dibêjin:

- Te diya me kuşt!

Mêrik dibêje:

- Bilûra min heye.

Cînarân wî jê re dibêjin:

- Te jina xwe kuşt. Tu çi behsa bilûrê dikî. Bilûra çi?

Mêrik dibêje:

- Ez bilûra xwe nîşanî we nadim. Jinikê dişûn. Mêrik dîsa bilûra xwe nîşanî wan nade. Jinikê vedîşîrin, mîrik dîsa dibêje:

- Ez bilûra xwe nîşanî we nadim. Gundî belav dîbin. Cînarân wî

dibêjin:

- Ji me re bêje, çi di bilûra te de heye?

Mêrik dibêje:

- Ez gava li bilûrê bixim, dê jina min bi can be.

Cînarân wî dibêjin:

- Madem ku welê ye, nexwe pif neke bilûrê, heta serê havînê. Wexta leqatê bo jina te jêhatî be.

Min Çar Çay Vexwar

Yekî Îndarî li Amedê li Deriyê Mêrdînê çayek vedixwe. Lê mafê çayê nade û diçe. Hinek digere, li deriyê Riha, li qehweke rûdine û du çay vedixwe. Dîsa heqê çay nade û diçe. Nêzikî êvarê li Rezan li qehweke dî rûdine, li wir jî çayekî vedixwe û radibe ku here. Çayger dibêje:

- Ka mafê çay?

Îndarî dibêje:

- Qey çay bi peran e?

Çayger dibêje:

- Belê. Çayek bi diravekê ye. Mêrik çar diravî dide çayger.

Çayger dibêje:

- Xalo, te çend çay vexwar?

Mêrik dibêje:

- Yek li deriyê Mêrdînê, didu li deriyê Riha, yek jî li vir. Tev li ser hev dîbin çar çay.

Ü ji qehwê derdikeye.

tuzik li ser ava ye

Cemîla CELÎL

Allegretto

Tû - zik li ser a - va - ye, Av li bîn - ya
ma - la - ye, Pîr ne - xwe - şe, be - la - ye, Tû -
zik der - ma - nê di - la - ye, Pîr ne - xwe - şe,
be - la - ye, Tû - zik der - ma - nê di - la - ye.

Tûzîk li ser ava ye,
Av li bînya mala ye,
Pîr nexweş e, bela ye
Tûzîk dermanê dila ye.
Pîr nexweş e bela ye,
Tûzîk dermanê dila ye.

Baranê rêşe-rêşe,
Pîr nexweş e, zef dêşe,
Tûzîk jê ra bipêje,
Tûzîk dermanê dilêş e.
Pîr nexweş e bela ye,
Tûzîk dermanê dila ye.

Pîr rabû ser piya,
Gazî kire gundiya,
Amanata tûzîkê,
Tûzîk heyatê hemiya.
Pîr nexweş e bela ye,
Tûzîk dermanê dila ye.

R'ya tûzîk ne dûr e,
Gola wî jî ne kûr e,
Tûzîk bendik hê hûr e,
Dermanê bêqisûr e.
Pîr nexweş e bela ye,
Tûzîk dermanê dila ye.

Keçik çûnê tûzîkê,
Xorta' çûne bendikê,
Dest avitîn bendikê,
Av avîte navikê.
Pîr nexweş e bela ye,
Tûzîk dermanê dila ye.

NAMEYÊN XWENDEVANAN NAMEYÊN XWENDEVANAN

Geli hevalên rewşenbîr ên heja û bi rûmet!

Ez li we hemûyan, ji dil û can silav dikim. Ev namaya min a yekemîn e ku ez ji we re rêdikim. Heta niha li Ewrûpa Rewşen dihat weşandin, lê vê gavê li welêt tê weşandin. Ji ber vê yekê ez we pîroz dikim û dixwazim ku bibim aboneyê Rewşenê.

Ji kerema xwe re ji her hejmarê ji min re bisînin, ezê gelek kêfxweş bim. Heta niha min neh hejmar girtin.

Ez ji we re kaxizê bankayê yê perê abonetiyê dişnim. Ji bo salekî (12 hejmaran) min pere razande bankayê.

Ez sersala we pîroz dikim û di şexsiyeta we de li gelê cîhanê yên pêşverû û rewşenbîran silav dikim, ji we re serkeftin dixwazim.

Yasin KAYA
Almanya

Di Rêziman û Alfabea Kurdî de

Guhertinêن Bingehîn

Guhertinên bingehîn ên ku di alfabe û rêzimanê Kurdî de pêwistiya me pê heye, roj bi roj girîngiya xwe zêdetir dikin. Eger em dixwazin pirsgirêka alfabe Kurdî ji binî ve çareser bikin, divê em hemî tipêن ku ne standart in, bi diftongê ku ji tipêن standart amade bûne re biguherînin. Tenê bi vî awayî em dikarin alfabe yeke standart ku ji tipêن standart ên navnetewî avabûne û bi makînên nûjen ên ku bi alfabe Latînî amade bûne bi kar bînin. Di rêzimanê me de, çewtiyêن bingehîn, ji bandor û hîkariya rêzimanê Tirkî tê; gava ku em li ser rêzimanê Kurdî bixebeitin, divê em rêzimanê Hind û Ewrupî mînak bigrin; bi taybetî ji, ji van zimanan yên ku bi alfabe Latînî tên nivîsandin, divê em li ser van rêzimanen lêkolîn û lêgerînên girîng bikin û bi vî awayî divê em rêzimanê Kurdî ava bikin. Dîtin û ramanen me yên li ser çareserkirina pirsgirê-

kên rêzimanî û alfabayî ev in?

Alfaba Kurdî:

Di alfaba Kurdî de sîh û pênc (35) dengê bin gehîn hene. Dengê ku di zimanekî de wateyê du peyvan bi hebûna xwe ji hev cûda dîkin dengê bin gehîn in. Di alfaba Kurdî de bîst û şeş (26) tip û neh (9) diftong (dengê ku bi du tipan pêk tê) he: Tipen mezin: A B C D E F G H I J K L M N O P Q R S T U V W X Y Z,

Tipen piçûk: a b c d e f g h i j k l m n o p q r s t u w x y z.

Diftongên Kurdî ev in: ch, dj, kh, sh, ou, ue, th, ph, xw. Pênc tipen alfaba Kurdî ne standart in. Ev tip, di bikarananîna makînên nûjen ên nivîsinê de ji me re pir dijwariyan dertînin. Tipen alfaba me yên 'ç, ş, û, ê, î' standart nînin. Divê em van tipana ji alfaba xwe bavêjin, van dengan bi diftongan bini vîsin.

Mînak: ç: ch- cahr, chend.

ş: sh- shêr, shîr.

û: ou- tour, ou, sour, boun.

ê: ue- buer, huevar û hd.

c: dj- djan, djo, djil, djêw. Dengê Ç, K, P, T yên hişk di Kurdî de, ji yên nerm zêdetir in. Ji ber vê yekê divê em van dengê hişk bi tipen Ç, K, P, T pêk bînin. Mînak: k: kulav, kadîn, kew.

p: Pêşî, piling, pênc.

t: tarî, tenî, tûj.

c: (ç ya hişk) cem co, cêlek. Dengê tipen Ç, K, P, T yên ededî an ji yên nerm di Kurdî de ji yên hişk kêmîtirin. Divê ev deng bi diftongen ch, kh, ph, th bê nivîsin.

ph- phar, phor.

th- thor, thêr.

Rêzimanê Kurdî:

Di lêkerên sazî de divê em pirtikên neyînî û pêslêker, ji peyvê cuda binîvisin. Mînak:

Ez na xwînim
Wî ne di xwest
Ew na kin
Tu bi xwîne

Rastnivîsa Kurdî:

Di rastnivîsa Kurdî de, ne bi awayekî xwezayî, lê bi awayekî keyfî, dengê tipa 'h' ya serê peyvê û nav peyvê li pirî ciyan hatiye xistin. Piraniya nivîskarêne me, devokên xwe bingeh girtine. Ji ber ku li hinek herêm an jî deveran, hinek deng ji axaftinê ketine, lê ev deng hîn iro jî, li hinek herêm û deveran di axaftinê de tê bikaranin. Mînak:

hêvar
herê
hode
çahv
mahr û hd.

Daçekên 'DA' û 'RA' ji hêla piraniya nivîskarêne me de çewt têne nivîsandin. Ji xeynî herêma Botan, li hemî herêmên Kurmancan û di hemî zara-vêne Kurdî de (Zazakî, Kurmancî, Soranî, Goranî, Lorî) ev daçek bi 'DA' û 'RA' têne bikaranîn.

Divê em ji guhertinêne bingehîn netirsin.

Rojhat AZADÎ

Hevalên giranbiha,

Hemû hevalên ko di damezarandina "Navenda Çanda Mezopotamya" û di weşandina kovara Rewşenê de beşdar bûne û keda wan tê de derbas dibe, ez wan ji dil û can ve pîroz dikim. Ev xizmeta we ya ji bo çand, huner û zaniyariya gelê Kurd, gelek hêja û bi qîmet e. Ji bo vê yekê, ez jî dil û can ve, domandin û serfiraziya xebata we dixwazim.

Ji bo ku di hefsê de imkanên min ên bûjenî nîne, ez kovara Rewşenê bistînim, ez wê ji hevalên xwe digrim û dixwînim. Ji bo ku min nexwest kulfetek bûjenî bikeve ser milên we, min ji we nexwest ku hûn ji min re Rewşenê bişînin. Lê digel vê, min hejmarêne Rewşenê tev xwendin. Di saya Rewşenê de ez hînê Kurdî bûm. Min du hevalên xwe yên Tirk jî hînê Kurdî kir.

Hûn jî dizanin ku hewcedariyeke me bi ferhen-geke mezin heye. Çavê me li we ye ku hûn rojek zû-tir ferhengêkê derînin, ku em jî, jê fêde bigrin. Adin jî, ev elfaba di destê me de têra dengê Kurdî

nake. Nabe ku him "îş" him jî, "oğlak" be. Di vê derheqê de jî, hûn karibin tiştekî bikin wê pir baş bibe.

Ev çendake ez him li ser zimanê Kurdî (Kurmancî) dixebeitim, him jî, ji zimanê din helbest û nîvisaran werdigerînim Kurdî. Ez bawer im ku wêje-ya cîhanê û hemû bîr û baweriyyê şoresgerî û civa-kî yênci cîhanê hîn bêtir nêzî hev bike. Bi hêviya ku hûn biweşînin, berhemâ vê xebata xwe ez ji we re helbesteke wergerandî dişînim. Ger di vê derheqê de daxwaz, pêşniyar û rexneyê we hebe, ez li hêvi-ya we me ku hûn ji min re pêşkêş bikin.

Gelek silavêne hogirî li we be. Bimînin di xweşî û dilşadiyê de!...

Hidir Yiğit

Welat

Welat erdê bav û kalan e. Her mirov divê ji welatê xwe hez bike, ava bike û biparêze. Mirovê ku ji welatê xwe hez neke û neparêze, heyînên xwe yênci netewî û civa-kî neparêze, nikare tu kesî biparêze. Her hevwelatiyek divê ku ji welatê xwe hez bike. Hevwelatî, biratî ye.

Kesê ku ji welatê xwe hez dike, ji hevwelatiyê xwe jî hez dike. Kesê ji hevwelatiyê xwe hez dike, ji gelên din jî hez dike.

Hezkirina welêt, ya gel û ya çîna serdest ne ji hev in. Çîna serdest mîna gurên devbixwîn welat û hevwelatiyê xwe talan dikin û dimijin. Çîna burjuvazî tu car biratiya gelan naxwaze.

Welatê me Kurdistan e, ciye bav û kalan e. Bav û kâlen me têde hatine dinê, jîna xwe domandine û têde mirine. Ji bo parastina welêt şer kirine, kuştine û hatine kuştin. Axa welêt bi xwîna wan hatiye vestirandin û ji me re hatiye pêşkêş kirin. Divê em jî, welatê xwe biparêzin, ava bikin, him têde rûnin û him jî weliteke ava ji nesla nû re pêşkêş bikin.

Welatê me welitekî fireh, mezin pir xweş e. Tevde çiya, deş, mîrg, zozan, rîl û kanî ne. Dewlemendiyêne welatê me yênci sererdê û binerdê gelek in. Lê gelê me li welitekî dewlemend, birçî, tazî, dîl û xizan e.

Hostayê mezin Cigerxwîn, dewlemendiya welêt, şerpe-zetî, birçî û belengaziya gelê Kurd dibîne û ji kovana di-lê xwe wiha diqîre:

Welatê me tev xêr û bêr e
Tev meden e, tev zîv û zêr e
Çibkim iro maye ji xelqê re

Suxteyên şoresger
en xwendegeha Melîk Ahmedê
Amed

F E R H E N G O K

asê	: aşılması ya da çıkışması güç, zor olan yer; kuvvetli, sağlam	navik	: göbek
bandêr	: etki, nüfuz	nêm	: iltihab
bergeh	: panorama, görünüş	nêrevan	: gözetleyici
bizdandin	: ürkütmek	nogar	: denizaltı
bizdîn	: ürkmek	noqil	: şekerleme
bîrawer	: bilinçli, zeki, aydın	nûber	: turfanda
cengeşti	: savaş gemisi	pê anîn	: oluşturmak, meydana getirmek
cîhderk	: kaynak	pis	: oğlan
çiftexas	: patiska	proxebat	: ön çalışma
danezanîn	: öğretmek	pûç	: çürük (ceviz vs.)
daketin	: inmek	pût	: çürük (ağaç vs.)
daxistin	: indirmek	qabqabik	: takonya
dekûdolab	: katakulli	rêz	: sıra, satır
dêdik	: dalak	rûreşî	: yüz kızartıcı suç
dot	: kız	senifandin	: tasnif etmek, düzenlemek
ewiqandin	: oyalamak	sewîl	: testi
ewiqîn	: oyalanmak	silq	: şeker pancarı
heyber	: nesne, obje, maddi varlık	tentêl	: durum, vaziyet
hêlm	: nefes	teşt	: tekne (büyük leğen)
hêman	: element, unsur	têhn	: ısı
hingê	: o zaman	têvel	: değişik
hundirvan	: dahiliyeci	veceniqîn	: irkilmek
kêlek	: yan	xapînok	: yaniltıcı, bubi tuzağı
kingê	: ne zaman	xêz	: hat, çizgi, satır
lewente	: parfüm	xovan	: ılık
		xweser	: özel, hususî

EM SOND DIXUN

DILBIXWÎN

*Em sond dixun
Bi bilindiya çiyan
Bi Agîrî, Nemrûd û Botan
Bi xuşexuşa hemû çemên Kurdistan
Bi pêlên Dicle, Xabûr û Firatan
 Bi reqereqa ewran
 Bi gurmegurma tavan
 Bi stêrkên geş û roja xweş
Bi erd û ezmanan em sond dixun!*

* * *

*Em sond dixun!
Bi laşê şehîdan
Ew laşen li ser destan
Ku me hîna venegartine
 Laşen bi xwîn
Laşen ciwan û qehremanan
 Laşen egîd û pehlewanan
 Laşen nemir û pakrewanan
Kesên di bin panzer û topan de
Kesên di bin hûjehûja fantoman de
 Nîşana zeferê hildan
 û dilop bi dilop xwîna xwe dan*

* * *

*Em sond dixun!
Bi nalenala dayikan
 Bi şîqeşîqa zarokan
Zarokên birçî, pêxas, perîşan
Zarokên sêwî yên li ber dîwaran
 Bi hêsrên çavên mindalan
 Bi hawar- hawara jinan
Jinên bi ser miriyân de didin lorîkan:
 "Hawar... hawar...!"
Bila hilwesin dîwarên vê dînyayê
Bila bişewite mala ne însanan..."*

* * *

*Em sond dixun!
Bi Zerdeş û Zendavista
 Bi laleş û serdangeh
 bi axê
 Bi rojê
 Bi av û bayê azadiyê
 Bi xwîna li ser rûyê zinaran
 Bi xwîna li ser dîwarê zindanan
 Bi wê xwînê
Xwîna ku li ser her dilopeke wê
 Sîn dibe,*

*Sorgul û nêrgiz
Çîcek û rîhan
Sosin û gulistana beybûnan*

* * *

*Em sond dixun!
Bi devê tifingan
Tifingên rêhevalan
Tifingên li ser milan
Milên ku tu caran newestiyan
Milên li 15'ê Tebaxê*

*Bûne destan
Bûne efsan
Bûne dimdim
Bûne volkan*

* * *

*Em sond dixun
Bi şem û yekşeman
Bi duşem û sêşeman
Bi çarşem, pêcüşem û ınan*

*Bi her 12 mehan
Bi her çar demsalan
Bi 27'ê mijdarê*

*Bi 21'ê Adarê
Adara 82'an
Em sond dixun!
Bi 15 Tebaxê
Tebaxa 84'an
Bi wê roja pîroz
Roja muqedes*

Roja bilindbûna devê tifingan

* * *

*Em sond dixun!
Bi das û çakûçan
Bi simbilên geniman
Bi pelgên daran
Bi partiya KARKERAN*

*Emê bimeşin
Ger mirin be*

*Ger jiyan
Ger hebûn be,*

*Ger neman
Em nebûnîn jî,*

*Wê bibûnîn neviyên me
Azadiya gelê xwe
Serxwebûna Kurdistan...*



Buha + KDV:12.000 TL.